



AHLAK  
BILGI  
ÜRETİM

16  
Hejmar  
Number  
Sayı

2024  
Sal / Year / Yıl

# The Journal of Mesopotamian Studies (JMS)

MAÜ  
PRESS

ISSN: 2147-6659 | e-ISSN: 2687-6388

The Journal of  
**Mesopotamian Studies**  
(JMS)

Periodical Journal for Kurdish Studies

16

March 2024

ISSN: 2147-6659  
e-ISSN: 2687-6388



**MARDİN ARTUKLU**  
**ÜNİVERSİTESİ**  
**TÜRYİYE'DE YAŞAYAN DİLLER**  
**ENSTİTÜSÜ**

# The Journal of Mesopotamian Studies (JMS)

Periodical Journal for Kurdish, Arabic and Syriac Studies

ISSN: 2147-6659

e-ISSN: 2687-6388

Mardin Artuklu Üniversitesi Adına Sahibi:

Owner on Behalf of Mardin Artuklu University, The Institute of Living Languages in Turkey:

**Prof. Dr. İbrahim ÖZCOŞAR**

MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ - Türkiye

<https://orcid.org/0000-0003-0776-4129>

[ibrahimozcosar@artuklu.edu.tr](mailto:ibrahimozcosar@artuklu.edu.tr)

Sorumlu Yazı İşleri Müdürü - Managing Editor

**Doç. Dr. Mustafa ASLAN**

MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ - Türkiye

<https://orcid.org/0000-0002-1543-3154>

[mustafaaslan@artuklu.edu.tr](mailto:mustafaaslan@artuklu.edu.tr)

Editör | Editor in Chief

**Doç. Dr. Ahmet KIRKAN**

MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ - Türkiye

<https://orcid.org/0000-0003-3885-5218>

[ahmetkirkkan@artuklu.edu.tr](mailto:ahmetkirkkan@artuklu.edu.tr)

Editör Yardımcısı | Assistant Editor

**Dr. Şehmus KURT**

MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ - Türkiye

<https://orcid.org/0000-0003-1083-8133>

[sehmskurt@artuklu.edu.tr](mailto:sehmskurt@artuklu.edu.tr)

Yönetim Yeri | Head Office

Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü

Mardin Artuklu Üniversitesi Merkez Kampüs Yerleşkesi

Artuklu/Mardin

Tlf: +90 482 212 98 84 20 Fax: +90 482 212 98 85

e-mail: [jms@artuklu.edu.tr](mailto:jms@artuklu.edu.tr) • web: <http://jms.artuklu.edu.tr>

Dizgi ve Tasarım: Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü

Mart 2024 • Adar 2024 • March 2024

Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü'nün bilimsel bir yayım organı olan The Mesopotamian Studies Dergisi, uluslararası hakemli bir dergi olup yılda iki sayı (Mart- Eylül) olarak yayımlanır. Dergide Kürt kültürü, dili ve edebiyatı alanlarında akademik nitelik taşıyan ve Türkçe, Kürtçe ve İngilizce dillerinde yazılan bilimsel çalışmalara yer verilir. JMS'de yayınlanan makalelerin içeriğinden yazarları sorumludur. The Journal of Mesopotamian Studies is publication of The Institute of Living Language of Mardin Artuklu University. The Journal of Mesopotamian Studies is an international peer-reviewed journal published semi-annually (March-September). The scientific research on Kurdish culture, language and literature written in Turkish, Kurdish, Arabic and Syriac languages are published in The Journal of Mesopotamian Studies (JMS). Authors are responsible for the content of articles published in JMS.

**İmtiyaz Sahibi - Owner**

**Prof. Dr. İbrahim ÖZCOŞAR**

MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ - Türkiye  
<https://orcid.org/0000-0003-0776-4129>  
ibrahimozcosar@artuklu.edu.tr

**Sorumlu Yazı İşleri Müdürü - Managing Editor**

**Doç. Dr. Mustafa ASLAN**

MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ - Türkiye  
<https://orcid.org/0000-0002-1543-3154>  
mustafaaslan@artuklu.edu.tr

**Editör – Editor-in-Chief**

**Doç. Dr. Ahmet KIRKAN**

MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ - Türkiye  
<https://orcid.org/0000-0003-3885-5218>  
ahmetkirkkan@artuklu.edu.tr

**Editör Yardımcısı – Assistand Editor**

**Dr. Şehmus KURT**

MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ - Türkiye  
<https://orcid.org/0000-0003-1083-8133>  
sehmuskurt@artuklu.edu.tr

**Editör Kurulu – Editorial Board**

**Prof. Dr. Abdurrahman ADAK**

MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ  
Türkiye  
<https://orcid.org/0000-0002-9124-1605>  
abdurrahmanadak@artuklu.edu.tr

**Doç. Dr. Salih AKIN**

UNİVERSİTE DE ROUEN  
Fransa  
<https://orcid.org/0009-0002-7631-1596>  
salih.akin@univ-rouen.fr

**Doç. Necat KESKİN**

MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ  
Türkiye  
<https://orcid.org/0000-0003-0884-1309>  
necatkeskin@artuklu.edu.tr

**Prof. Dr. M. Zahir ERTEKİN**

MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ  
Türkiye  
<https://orcid.org/0000-0003-3519-9892>  
zahirertekin@hotmail.com

**Doç. Dr. Bakhtiar SAJJADİ**

KURDİSTAN UNİVERSİTY  
İran  
<https://orcid.org/0000-0002-6483-5803>  
b.sajadi@uok.ac.ir

**Doç. Dr. Yakup AYKAÇ**

VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ  
Türkiye  
<https://orcid.org/0000-0002-2602-484X>  
yakup.aykac@yyu.edu.tr

**Prof. Dr. Mustafa ÖZTÜRK**

MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ  
Türkiye  
<https://orcid.org/0000-0003-0637-8760>  
mustafaozturk@artuklu.edu.tr

**Doç. Dr. Ahmet GEMİ**

DİCLE ÜNİVERSİTESİ  
Türkiye  
<https://orcid.org/0000-0003-4124-5525>  
ahmetgemi04@gmail.com

**Dr. Öğr. Üyesi Shahab VALİ**

MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ  
Türkiye  
<https://orcid.org/0000-0003-0580-1598>  
vali.shahab@gmail.com

Alan Editörü (Dil ve Gramer)

**Dr. Mehmet YONAT**

MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ - Türkiye  
<https://orcid.org/0000-0001-8576-7486>  
mehmetyonat@artuklu.edu.tr

Alan Editörü (Klasik Edebiyat)

**Doç. Dr. Yakup AYKAÇ**

VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ - Türkiye  
<https://orcid.org/0000-0002-2602-484X>  
yakup.aykac@yyu.edu.tr

Alan Editörü (Modern Edebiyat)

**Dr. Arş. Gör. Ümran ALTINKILIÇ**

MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ - Türkiye <https://orcid.org/0000-0003-1308-2271>  
umranaltinkilic@artuklu.edu.tr

Alan Editörü (Folklor)

**Doç. Necat KESKİN**

MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ - Türkiye  
<https://orcid.org/0000-0003-0884-13>  
necatkeskin@artuklu.edu.tr

Alan Editörü (Kültürel Çalışmalar)

**Dr. Öğr. Üyesi Şahab VALİ**

MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ - Türkiye  
<https://orcid.org/0000-0003-0580-1598>  
vali.shahab@gmail.com

Kürtçe Dil Editörleri (Kurmançî)

**Dr. Güneş KAN**

MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ - Türkiye  
<https://orcid.org/0000-0002-7097-6047>  
guneskan@artuklu.edu.tr

**Dr. Arş. Gör. Sevda ORAK REŞİTOĞLU**

MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ - Türkiye  
<https://orcid.org/0000-0001-7662-9962>  
sevdaorak@artuklu.edu.tr

**Dr. Resul GEYİK**

MARDİN ARTUKLU UNIVERSITY - Türkiye  
<https://orcid.org/0000-0003-3516-098X>  
resulgeyik@artuklu.edu.tr

Kürtçe Dil Editörü (Sorani)

**Doç. Dr. Zülküf ERGÜN**

MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ - Türkiye  
<https://orcid.org/0000-0001-8784-5636>  
zukkufergun@artuklu.edu.tr

Kürtçe Dil Editörü (Zazakî)

**Dr. Arş. Gör. Pınar YILDIZ**

MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ - Türkiye  
<https://orcid.org/0000-0002-8175-0879>  
pinaryildiz@artuklu.edu.tr

İngilizce Dil Editörü

**Dr. Arş. Gör. Ziyattin YILDIRIMÇAKAR**

MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ - Türkiye  
<https://orcid.org/0000-0003-4809-511X>  
ziyattinyildirimcakar@artuklu.edu.tr

Türkçe Dil Editörü

**Dr. Öğr. Üyesi Mehmet YALÇINKAYA**

MARDİN ARTUKLU UNIVERSITY - Türkiye  
<https://orcid.org/0000-0002-4473-0078>  
mehmetyalcinkaya@artuklu.edu.tr

Kitap Kriğiği Editörü

**Dr. Mesut ARSLAN**

MARDİN ARTUKLU UNIVERSITY - Türkiye  
<https://orcid.org/0000-0002-7929-0631>  
mesutarслан@artuklu.edu.tr

Etik Editörü

**Doç. Dr. Kenan SUBAŞI**

MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ - Türkiye  
<https://orcid.org/0000-0001-7744-1646>  
kenansubasi@artuklu.edu.tr

Mizanpaj Editörü

**Arş. Gör. Ferhat YILMAZ**

MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ - Türkiye  
<https://orcid.org/0009-0000-4737-4665>  
ferhatyilmaz@artuklu.edu.tr

İndeks Editörü

**Dr. Şehmus KURT**

MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ - Türkiye  
<https://orcid.org/0000-0003-1083-8133>  
sehmuskurt@artuklu.edu.tr

Web Sitesi Editörü

**Dr. Arş. Gör. Ziyattin YILDIRIMÇAKAR**

MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ - Türkiye  
<https://orcid.org/0000-0003-4809-511X>  
ziyattinyildirimcakar@artuklu.edu.tr

Sosyal Medya Editörü

**Arş. Gör. Ferhat YILMAZ**

MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ - Türkiye  
<https://orcid.org/0009-0000-4737-4665>  
ferhatyilmaz@artuklu.edu.tr

Danışma Kurulu | Advisory Board

**Prof. Dr. Abdulhalim AYDIN**

FIRAT ÜNİVERSİTESİ - Türkiye  
<https://orcid.org/0000-0002-9411-6869>  
halimaydin@firat.edu.tr

**Prof. Dr. Farouk ISMAIL**

FREIE UNIVERSITÄT - Almanya  
<https://orcid.org/0000-0002-0574-6050>  
farouk.ismail@fu-berlin.de

**Prof. Hayrullah ACAR**

MARDİN ARTUKLU UNIVERSITY - Türkiye  
<https://orcid.org/0000-0001-5263-7765>  
hayrullahacar@artuklu.edu.tr

**Prof. Dr. Mehmet Mesut ERGİN**

DICLE ÜNİVERSİTESİ - Türkiye  
<https://orcid.org/0000-0002-5923-5731>  
emesut@dicle.edu.tr

**Prof. Dr. Mehmet Nesim DORU**

ANKARA SOSYAL BİLİMLER ÜNİVERSİTESİ - Türkiye  
<https://orcid.org/0000-0002-3519-7654>  
mehmetnesim.doru@asbu.edu.tr

## CONTENT / NAVEROK / İÇİNDEKİLER

Editörden .....	1
Ji edîtorî .....	2
Editorial.....	3

### Research Articles / Gotarên Lêkolînî / Araştırma Makaleleri

<b>Mela Mihemmed Beşîrê Îlyozî</b> <b>Û Cihê Wî Di Edebîyata Kurmancî Da</b> Ayhan YILDIZ .....	4-25
<b>Mewlîdê Ehmedê Xasî De</b> <b>Nûrê Muhemmedî</b> İbrahim DAĞILMA.....	26-47
<b>Adaptasyona Asta Pêş A1ê ya CEFRê</b> <b>Bo Şîyana Xwendinê ya Kurdîya Kurmancî</b> Ali ONAY .....	48-66
<b>Ji Aliyê Wateyê ve Cureyên Risteyan:</b> <b>Bi Nimûneyên Ji Mem û Zînê</b> Halil AKGÜL .....	68-79
<b>Mersiyeyên Kurmancî Yên Ku Helbestvanan</b> <b>Li Ser Zarokên Xwe Hûnandine</b> Cihan TURAN.....	80-100
<b>Book Review / Danasîna Pirtûkan / Kitap Değerlendirme</b>	
<b>Perîşanname</b> <b>(Mela Perîşanê Dînewerî)</b> Cumhur ÖLMEZ.....	101-103

## Editörden

2016 yılından beri çok disiplinli ve çok dilli bir yayın çizgisi benimseyen *The Journal of Mesopotamian Studies (JMS)* dergisi, 2024 yılı itibari ile sadece Kürt dili, kültürü, edebiyatı, tarihi alanlarına odaklanan akademik çalışmaları yayımlama kararı almıştır. Bununla bağlantılı olarak editör kurulumuza alanın uzman isimleri dahil edilmiştir. Ayrıca hem alan editörlüğüne hem de dil editörlerine enstitümüz bünyesindeki doktora derecesine sahip alanın uzmanı arkadaşlarımız atanmıştır. Çok dilli akademik yayıncılığı ilke edinen dergimizde Kürt dili, kültürü, edebiyatı, tarihi alanlarındaki Türkçe, Kürtçe ve İngilizce dillerinde yazılan makaleler yayımlanacaktır.

Ayrıca ilk sayısından itibaren cilt ve sayı formatında yayın yapan dergimiz 2024 Mart sayısı olan 16. sayı itibariyle sadece sayı formatında yayın yapacaktır. Dergimizin yayın periyodunda herhangi bir değişiklik olmamıştır. Dergimiz eskiden olduğu gibi Mart ve Eylül aylarında yılda iki sayı olarak yayımlanacaktır. Ayrıca her yıl Aralık ayında Kürt dili, kültürü, edebiyatı ve tarihi alanlarına odaklanan bir özel sayı da yayımlanacaktır. 2020 yılında Zazalar Özel Sayısı, 2023 yılında da Klasik Kürt Edebiyatı özel sayısı yayımlayan dergimizde, 2024 Aralık ayında Kürt Çocuk Edebiyatı Özel Sayısı yayımlanacaktır. Bu sayımız için 2024 Haziran ayı itibariyle makale kabulüne başlanacaktır.

2024 Mart sayısı olan bu 16. sayımızda 5 adet araştırma makalesi, 1 adet de kitap tanıtımı olmak üzere 6 makale yer almaktadır. Bu sayımızın hazırlanmasında büyük emekleri olan Editör Yardımcıları, Alan Editörleri, Dil Editörleri ve Hakemlerimize içten teşekkürlerimizi sunarız.

Dergimizin 2024 Eylül ayında yayımlanacak 17. sayımız için Nisan ayı itibariyle makale kabulüne başlanacağını tekrar hatırlatmak isterim. Hem 17. sayımıza hem de Aralık ayında yayımlanacak Kürt Çocuk Edebiyatı özel sayımızı katkılarınızı bekleriz.

Saygılarımla,

JMS Editör Kurulu Adına

Doç. Dr. Ahmet KIRKAN

EDİTÖR

## Ji edîtorî

Kovara *The Journal of Mesopotamian Studies (JMS)* ya ku ji sala 2016an heya niha li ser xeteke weşangerîyê ya pirdisîplînî û pirzimanî dimeşe, biryar daye ku ji sala 2024an pê de tene di warên ziman, çand, edebiyat û dîroka kurdan weşana xwe berdewam bike. Girêdayî vê yeke, pisporên qadê li ser lijneya me ya editoran hatine zêdekirin. Herwisa hem ji bo edîtorîya qadê hem jî edîtorîya zimanî hevkarên me yên pirspor û xwedî doxtora yên ku li bin banê enstîtuya me xebatên xwe berdewam dikin hatine tayînkirin. Kovara me ya ku weşangerîya akademîk a pirzimanî daye ber xwe, dê cih bide gotarên li ser ziman, çand, edebiyat û dîroka kurdan yên ku bi zimanê tirkî, kurdî û inglîzî hatine nivîsandin.

Dîsa kovara me ya ku ji jimara yekem heya îro di formata cîld û jimar de derdikeve, bi jimara me ya Adar 2024ê ku jimara 26em e, dê di formata tene jimar de weşana xwe berdewam bike. Di periyoda weşanê ya kovara me de ti guhertin çênebûne. Kovara me dê wekî berî salê du caran, mehên Adar û Îlonê bê weşandin. Herwisa her sal di meha Berfanbarê de dê jimareke taybet a li ser ziman, çand, edebiyat û dîroka kurdan biweşîne. Sala 2020an Jimara Taybet a li ser Zazayan, sala 2023yan de jî Jimara Taybet a Edebiyata Kurdî ya Klasîk hatine weşandin. Meha Berfanbarê ya sala 2024an jî dê Jimara Taybet a Edebiyat Kurdî ya Zarokan bê weşandin. Ji bo wê jimarê dê ji meha Hezîrana 2024an pê ve serlêdana gotaran bê qebûlkin.

Di vê jimara me ya 16em de 5 jê gotarên vekolînê 1 jî jê nirxandina pirtûkan, bi temamî 6 gotar hene. Em spasîyê xwe pêşkêşî Alîkarên Edîtorî, Edîtorên Qadê, Edîtorên Zimanî û Hekamên xwe dikin ku di amadekirina vê jimarê de keda wan ya mezin e.

Dixwazin dîsa bi bîr bixim ku ji bo jimara 17em a ku dê di meha Îlana 2024an de bê weşandin ji meha Nîsanê pê ve gotar bêne qebûlkin. Em li benda tevkarîyên we ne ji bo wê jimarê hem jî ji bo jimara taybet a Edebiyata Kurdî ya Zarokan.

Digel rêz û silavan.

Li ser navê Lijneya Edîtoran a JMSê

Doç.Dr. Ahmet KIRKAN

Edîtor



## Editorial

*The Journal of Mesopotamian Studies (JMS)*, which has adopted a multidisciplinary and multilingual publication line since 2016, has decided to publish academic studies only focusing on Kurdish language, culture, literature and history as of 2024. In connection with this, experts of this field have been included in our editorial board. In addition, experts with PhD degrees have been appointed to the the journals as both field editors and language editors. Our journal, which adopts multilingual academic publishing as a principle, will publish articles on Kurdish language, culture, literature and history in Turkish, Kurdish and English.

In addition, our journal, which has been publishing in volume and issue format since its first issue, will only publish in issue format as of the 16th issue, which is the March 2024 issue. There has been no change in the publication period of our journal. As in the past, our journal will be published twice a year in March and September. It will also publish a special issue in December each year focusing on Kurdish language, culture, literature and history. In 2020, our journal published a special issue on Zazas, in 2023 a special issue on Classical Kurdish Literature, and in December 2024 a special issue on Kurdish Children's Literature will be published. We will start accepting articles for this issue in June 2024.

This 16th issue, which is the March 2024 issue, features 5 research articles and 1 book review, a total of 6 articles. We would like to express our sincere thanks to our Assistant Editors, Field Editors, Language Editors and Reviewers for their great efforts in the preparation of this issue.

We would like to remind you that we will start accepting articles in April for our 17th issue, which will be published in September 2024. We look forward to your contributions to both our 17th issue and our special issue on Kurdish Children's Literature to be published in December.

Best regards,

On behalf of the JMS Editorial Board

Assoc. Prof. Dr. Ahmet KIRKAN

EDITOR

## Mela Mihemed Beşîrê Îlyozî û Cihê Wî di Edebîyata Kurmancî da

### Molla Muhammed Beşîrê Îlyozî ve Kurmanci Edebiyatındaki Yeri

#### Molla Muhammed Beşîrê Îlyozî and His Place in Kurmanji Literature

Ayhan YILDIZ

Ayhan YILDIZ	Ayhan YILDIZ   <a href="https://orcid.org/0000-0002-8763-4182">https://orcid.org/0000-0002-8763-4182</a>   <a href="mailto:ayhanyildiz@artuklu.edu.tr">ayhanyildiz@artuklu.edu.tr</a> Dr., Mardin Artuklu University, Institute of Living Languages in Türkiye, Department of Kurdish Language and Culture, Mardin, Türkiye
Jêgir Citation Atıf	Yıldız, A. (2024). Mela Mihemedê Îlyozî û Cihê Wî di Edebiyata Kurmancî da. The Journal of Mesopotamian Studies (16), 4-25 DOI: <a href="https://doi.org/10.35859/jms.2024.1415624">https://doi.org/10.35859/jms.2024.1415624</a> .
Dîroka Şandinê Submission Date Geliş tarihi	06.01.2024
Dîroka Qebûlê Acceptance Date Kabul Tarihi	19.03.2024
Dîroka Weşandinê Publication Date Yayın tarihi	30.03.2024
Cureyê Gotarê Article Type Makale Türü	Gotara vekolinê Research article Araştırma makalesi
Hakemî Peer-Review Hakemlik	Cot Nenas – Du ji derve Double anonymized - Two External Çift Taraflı Kör Hakemlik – İki hakem
Beyana Etîk Ethical Statement Etik Beyanı	Hafîye beyankirin ku di pêkanîn û nivîsîna vê xebatê de hemû rêzîkên zanistî û etîk hatine şopandin û hemû çavkanî bi awayekî têkûz hatine referanskirin It is declared that scientific and ethical principles have been followed while carrying out and writing this study and that all the sources used have been properly cited. Bu çalışma yapılırken ve yazılırken bilimsel ve etik ilkelere uyulduğu ve kullanılan tüm kaynaklara uygun şekilde atıfta bulunduğu beyan edilir.
Kontrola Întihalê Plagiarism Checks Benzerlik Kontrolü	Belê – iThenticate Yes – iThenticate Evet – iThenticate
Nakokiyên Berjewendîyan Conflicts of Interest Çıkar Çatışması	Di gotarê de di navbera nivîskar û ti aliyên din nakokîya berjewendîyê tune ye. There is no conflict of interest between the author and any parties in the article. Yazar ile makalede yer alan taraflar arasında herhangi bir çıkar çatışması bulunmamaktadır.
Alîkarîya Darayî Grant Support Maddî Destek	Nivîskar beyan dîke ku wan wî ji bo vê vekolinê ti fonên derveyî wernegirtine. The author(s) acknowledge that they received no external funding in support of this research. Yazar(lar), bu araştırmayı desteklemek için herhangi bir dış fon almadıklarını kabul etmektedirler.
Mafê Telifê & Destûr Copyright & License Telif Hakkı & Lisanslama	Nivîskar li jê lîsansa CC BY-NC 4.0 mafê xwe yê li ser xebata xwe diparêzin. Authors publishing in the journal retain the copyright to their work licensed under the CC BY-NC 4.0. Dergide yayın yapan yazarlar, CC BY-NC 4.0 kapsamında lisanslanan çalışmalarının telif haklarını saklı tutarlar.

## KURTE

Mela Beşîrê Îlyozî, wekî alimekî edîb li herêma xwe dihat naskirin. Di nav gel da dihat gotin ku berhemên wî yê bi kurmancî hene; çî heye ku heta niha nehatibûn çapkirin û negihaştibûne ber destê xwendevanan. Li ser vê sedemê di vê lêkolînê hewl hat dayîn ku ev edîb digel berhemên wî bihê naskirin. Mela Beşîr, bi tevî ku alimekî edîb ê herêma Torê û Batmanê ye û berhemên wî yê edebî û dînî bi kurmancî hene, heta niha bi firehî bi rêbazeke akademîk xebat li serê nehatîye kirin. Binemala wî jî ku ye, jîyana wî li kê derê derbas bûye û berhemên wî çî ne, bi temamî nahên zanîn. Piştî ku hinek daneyên têkildarî vî mielîfî û berhemên wî jî qada lêkolînê hatin berhevkerin, cihê ku ew lê dimîne hat tesbîtîkirin, hevpeyvîn pê ra hat kirin û berhemên wî hatin mitalekirin. Li ser bingeha vê xebata sehayî, agadariyên pêwîst ên têkildarî binemal, bîyografi û berhemên vî edîbî hatin komkirin û li ser van daneyan jî analîza kesayetîya wî ya edebî û berhemên wî hat kirin. Digel xebatên îlmî û xizmetên dînî, wî berhemên edebî û dînî jî bi kurmancî nivîsîne. Mela Beşîr, digel ‘eqîdenameyek, mewlûdek, meqtelnameyek û tecwîdeke bi kurmancî, wî hin helbestên tesewufî û civakî jî bi zimanê erebî û kurmancî hûnane. Ji şewaza berhemên wî dîyar bû ku wî jî ekolên edebî yê dîroka edebiyata kurdî, daye ser şopa Ekola Aqtepiyan. Digel vê berhemdariya wî ya hêja ku nêzi nîvsedsalekê bi ser da bihûriye jî, hîn yek berhemeke wî nehatîye çapkirin. Heke xebatên akademîk li ser berhemên wî bihên kirin, dê cihê wî di raborîya ekolî ya qonaxên edebîyata klasîk a kurdî da hîn zelaltir bihê tesbîtîkirin.

**Peyvên Sereke:** Dîroka edebîyata kurdî, ekolên edebî yê kurmancî, mutesewufên kurd, berhemên Mela Beşîrê Îlyozî, kesayetîya Mela Beşîrê Îlyozî

## ÖZ

Mela Beşîrê Îlyozî, bîlgede edîp bir alim olarak tanınıyordu. Halk arasında onun Kurmancî eserlerinin olduğu söyleniyordu; ancak şimdiye dek eserleri yayımlanmamış ve okuyucuların eline yetişmemişti. Bu sebeple bu araştırmada, bu edibin eserleriyle beraber tanıtılmasına çalışıldı. Mela Beşîr, Tor ve Batman bölgesi bir alim edibi olduğu halde ve onun Kurmancî olarak edebi ve dini eserleri olmasına rağmen, şimdiye kadar geniş bir şekilde akademik bir yöntemle onun üzerinde bir çalışma yapılmamıştır. Ailesinin kim olduğu, yaşamının nerede geçtiği ve eserlerinin neler olduğu, tam olarak bilinmemektedir. Yazar ve onun eserleriyle ilgili veriler, araştırma alanından toplandıktan sonra, onun kaldığı yer tespit edildi, kendisiyle görüşme yapıldı ve eserleri mütlaa edildi. Bu saha çalışması esas alınarak edibin ailesi, yaşamöyküsü ve eserleriyle ilgili gerekli bilgiler toplandı ve bu veriler üzerinden onun edebi kişiliği ve eserlerinin analizi yapıldı. İlmî çalışmalar ve dini hizmetlerin yanı sıra o, edebi ve dini eserleri de Kurmancî olarak yazmıştır. Mela Beşîr, bir Akaidname, bir Mevlit, bir Maktelname ve manzum bir Tecvitnamenin yanında, tasavvufî ve sosyal konularla ilgili bazı şiirleri de Arapça yazmıştır. Eserlerindeki üsluptan anlaşıldığı kadarıyla, Kürt edebiyatı tarihinin edebi geleneklerinden Aktepe Ekolünü takip etmiştir. Bu edebi üretimine ve üzerinden yarım yüzyıla yakın zaman geçmesine rağmen, çalışmalarından hiçbir tanesi şimdiye kadar yayımlanmamıştır. Eserleri üzerinde akademik çalışmalar yapılsa, onun Kürt edebiyatı tarihi edebi geleneklerin içindeki yeri daha açık şekilde belirlenebilir.

**Anahtar Sözcükler:** Kürt edebiyatı tarihi, Kürmancî edebi gelenekleri, Kürt mutasavvurları, Mela Beşîrê Îlyozî'nin eserleri, Mela Beşîrê Îlyozî'nin edebi kişiliği

## ABSTRACT

Mela Beşîrê Îlyozî was known as a scholar in the region. It was popularly rumoured that he had written works in Kurmanji, but until now his works had not been published and had not reached the hands of readers. For this reason, this research has set out to introduce this scholar together with his works. Although Mela Bashir was a scholar of the Tor and Batman region, and although he wrote literary and religious works in Kurmanji, until now he has not been extensively studied in an academic way. It is not well known who his family was, where his life took place and what his works are. After collecting the data about the author and his works from the research area, the place where he stayed was identified, he was interviewed and his works were discussed. Based on this fieldwork, the necessary information about the author's family, biography and works were collected and his literary personality and works were analysed on the basis of these data. In addition to his scientific studies and religious services, he also wrote literary and religious works in Kurmanji. Mela Beşîr wrote an Aqedah of Faith, a Mevlit, a Maktelname and a Tajvitnam in verse, as well as some poems on mystical and social issues in Arabic. From the style of his works, it is clear that he followed the Aktepe School, one of the historical literary traditions of Kurdish literature. Despite this literary production and the passage of nearly half a century, none of his works have been published so far. If academic studies are carried out on his works, his place in the historical literary traditions of Kurdish literature can be determined more clearly.

**Keywords:** History of Kurdish literature, Kurmanji literary traditions, Kurdish Sufis, works of Mela Beşîrê Îlyozî, literary personality of Mela Beşîrê Îlyozî

## Destpêk

Herêma Torê bi xebatên ehlê medreseyê û aktîvîteyên tesewufê ve devereke dewlemend e. Li vê herêmê, ji serdema mîrektîyên kurdan ve hejmarek ji alimên edîb di hicreyên medreseyan da; pîrên mutesewuf ên navdar jî di dergehên tekyayan da gihastine. Mijara vê xebatê, ji alimên edîb ên vê deverê, Mela Mihemed Beşîrê Îlyozî û berhemên wî ne. M. M. Beşîrê Îlyozê bi tevî ku yek ji wan alimên giring e ku li vê deverê, di nav keşûhewayaya medreseyan da gihastîye; di tekyayan da mezin bûye, di pêvajoya jîyana xwe da di qada ilim û tesewufê da jî gelê xwe ra xizmet kirîye û pê ra jî berhemên giring ên edebî-dînî bi kurmancî nivîsîne jî, haya derdorên ku li ser dîroka edebîyata kurmancî dixebitin baş jê tune ye.

Digel ku Îlyozî di seredema xwe ya salên 1950yî da bi berhemên xwe yê edebî yê kurmancî û erebî di nav derdora xwe ya herêmî da tê naskirin, bi qasî ku ji lêkolîna qadê hat famkirin, heta niha navê wî û xebatên wî, bi awayê ku heq dîke di nav lîteratura nivîskî ya dîroka edebîyata kurmancî de cih negirtîye.<sup>1</sup> Lewra vê xebatê ev rewş wekî pîrsîgîrêkekê da ber xwe û bi mebesta ku bîyografîya wî, digel berhemên wî derxe pêş û cihê wî di nav raborîya dîrokî ya edebîyata kurmancî da tesbît bike, derket sehayê. Bi tevî ku li herêma Torê û Batmanê jî edîbên alim ên edebîyata kurmancî ya klasîk hene, bîyografî û berhemên wan hîn bi temamî negihaştine ber destê pisporên dîroka vê edebîyatê. Ji ber ku heta niha hin edîbên vê herêmê nehatine naskirin û danasîn, dibe ku berhemên wan wenda bûbin jî. Lewra cihê edebî yê wan edîban û berhemên wan ji hêla raborîya dîrokî ve baş nehatîye dahûrîn. Gava ev edîb digel bîyografî û berhemên xwe bigihîjin ber destê lêkolêrên dîroka edebîyatê, bivê nevê dê tesbîtên çêtir li ser qonaxên dîrokî yê edebîyatê jî derkevin pêşber. Bi ser van da, dibe ku bi kêrî tesbîtîkirina asta enetelektuelî ya alim û edîbên edebîyata îslamî ya kurmancî jî hinekî din ronahî bibe. Rengekî din ê alîyê edebî û dînî yê herêmê derkeve pêş çavan. Lewra ev xebat, ji vî alîyê xwe ve giring xuya dibe.

1 Tenê amadekarê vê lêkolînê A. Yıldız (2021), di meqaleya xwe ya bi navê "Perwerdeya Tecwîdên Kurdî di Medreseyan Kurdan de û Analîzek li ser Zubdetut' Tecwîd li't-Talîbî'l-Mustefîda Ebdurrehman el-Farûqî" da cih daye Mela Mihemed Beşîr û menzûmeyaya wî ya tecwîdê.

Ji bo ev lêkolîn bigihîje armanca xwe, bi rêya hevdîtîna û hevpeyvîna taybet ku bi şexsê M. M. Beşîr ra li mala wî pêk hatîye, pirsên mîna “Gelo Mela Mihemed Beşîr kî ye, ji ku ye, tehsîla wî di çi astê da ye û berhemên wî çi ne û ji qonaxên edebî yên dîroka edebîyatê, li ser kîjan dab û ekolê ye?” hatine kirin. Ji bo bersivên van pirsan jî, xebata qadî hat kirin. Ji kesên derdora wî jî agadarî hatin komkirin û ji bo tesbîtkirina kesayetîya wî ya edebî û taybetmendîyên berhemên wî zanyarîyên pêwîst hatin wergirtin. Di pey xebata qadî da bîyografiya muellif hat ronîkirin, berhemên wî hatine dîtîna, hatin mitalekirin û li ber ronahîya notên hevpeyvînan û berhemên wî yên mewcûd, ji bo vê xebatê, dane hatin amadekirin. Piştî ku daneyên têkildarî jîyan, tehsîl, berhem û kesayetîya wî ya edebî û ramiyarî hatin raporkirin, êdî li ser bingeha vedîtînen lêkolînê analîza daneyan hat kirin û encama wan hat derbirin. Li jêrê, di pey binemal, bîyografi û danasîna berhemên wî da analîza kesayetîya wî ya edebî û berhemên wî bi giştî hat kirin.

### 1. Binemal û Bîyografiya Mela Beşîr

Navê pêşîyê xêzana Mela Mihemed Beşîr, Derwêş e. Di zemanê wî da Mîrê Cizîrê tê ser Ava Spî, destmêj digire. Sewîlekî (cêr) wî heye, ka zêr e, zîv e, ji destê wî dikeve nav avê. Mîr zaf bi berê dikeve. Derwêş tê wir, pê dihise ku va ye Mîr zaf bi ber sebilê xwe dikeve. Lewra xwe davêje çem, sewîlê wî derdixe û dibêje “Kerem ke.” Kêfa Mîr zaf tê, dibêje: “Çiqas deynê min e?” Derwêş dibêje “Eyb e ‘eyb Mîrê min, ez ne ji wan însanan im ku bi heq tiştan bikim.” Mîr dibêje: “Na wele gerek e ez tiştêkî bidime te.” Dike û nake, Mîr nasekine, Derwêş dibêje: “Îlyoza te heye, bide min.” Dibêje: “Here, tev ji te ra.” Derwêş dibêje: “Wele ez vê jî qebûl nakim.” Mîr dibêje: “Çi dixwazî?” Dibêje: “Tu yê vêga bidî min, sibehê tu yê bibêjî min nedaye te.” Mîr dibêje: “Ê tu çi dibêjî?” Dibêje: “Kerê min ji te ra û bira ew der ji min ra be.” Navê bavê Mela Mihemed Beşîr, Mela Nezîr e, navê bavê wî jî Mela Hesen e, navê bavê wî jî Taha ye. Mela Nezîr di şerîetê da şareza bûye di wextê xwe da. Mîrê Botan di zemanê xwe da erd daye kalê wan.<sup>2</sup>

Mela Beşîr di sala 1938an de li gundê Îlyozê ku li ser Kercewsê (Gerçûş) ye hatîye dinyayê. Îlyoz bi qasî 40 deqîqeyan li rojhilatê Kercewsê dikeve. Piştî ku tehsîla xwe ya medreseyê diqedîne, wekî îmam diçe gundê Mîlika, ji wir jî diçe gundê Bilheyder û neh salan melatî dike. Li vir pîreka wî dimire û Şêx Qasim<sup>3</sup> ku ji kurê xwe zaftir ji Mela Beşîr hez dike, wî dizewicîne. Ew li Bilheyderê derdora 15 feqîyan digire. Ji ber ku qadroya wî ya fermî tune ye, nikare wezîfeya xwe berdewam bike.

Zemanê ku di salên 1958an da wextê eskerîya M. Mihemmed Beşîr tê, diçe Manîsayê eskerîyê. Digel ku wê hingê nimêj qedexe ye jî, ew li wir dike ku ji fermanarên eskerîyê, çawişekî kurd mizgefta nîzamiyeyê mezin bike. Ew jî firsend dibîne ku li wê derê tecwîdnameya xwe ya bi navê *Zanîna Îlmê Tecwîdê* binivîse.

Peyra ji ber sedemên sîyasî wî dev ji wezîfeya melatîyê berdaye, ji xwe ra dikanekê vekirîye û nêzî 7 salan pê debara xwe kirîye. Di vê maweyê da ji ber sedemên sîyasî yên serdemê, neçar dimîne ku derê dikana xwe bigire. Di pey van rûdanan da dikeve îmtîhanên dîni yên xwendîngêhên fermî. Ji derve dîplomeya orteokulê (dibistana navîn) distîne û dibe melayê fermî û li navenda Mêrdînê wekî îmamê mizgefta Mela Xelîl dest bi wezîfeya melatîya fermî dike. Piştî ku li gundekî bi qasî sê sala dimîne, tayîna xwe dibe Girbereşka Batmanê. Li vir jî piştî çend salan ji ber rûdanên sîyasî yên serdemê malnişîn dibe. Mela Beşîr di sala 2023yan de li Batmanê wefat kir.

---

2 Notên hevdîtîna taybet digel Mela Beşîr (1ê Adara 2021ê li mala wî ya Batmanê)

3 Şêx Qasim lawê Şêx Xalid e û li şûna bavê xwe 23 salan kar û barên terîqetê bi rê ve bir û sala 1977an di şêstsalîya imrê xwe de li Qubînê (Batman-Beşîr) wefat kir (1914-1977). Li goristana Kanîrewan medfûn e. (Hevdîtîna taybet digel Hecî Ebdirehmanê Kîfîfî: 10.02.2022). (Hevdîtîna taybet digel Hecî Mihemedê Holî: 21.02.2023).

## 2. Perwerdeya Wî

Mela Mihemmed Beşîr serê pêşî li cem bavê xwe Mela Nezîr xwendîye. Bavê wî ku çûye hecê, di vegeerê da ji hecê Qur'aneke ku tecwîd jî tê da heye anîye, ew jî pê hîmî ilmê tecwîdê bûye. Piştî çendakî ew çûye Kercewsê û du salan mekteba cumhûrîyetê xwendîye. Peyra ew çûye cem Mela Mihemmed Şerîf,<sup>4</sup> wî li Camîya Mezin a kevnare dest bi xwendina medreseyê kirîye. Ji wê derê, ji bo xwendinê çûye Hewrê ku nêzîkî wir e, li cem Mela Silêmanê Pirparî xwandîye. Piştî çendakî ji wir jî çûye Kevezoya Xwarî û du salan jî li wir xwendîye. M. Beşîr peyra çûye Ênê ba Seydayê Mela Seîd. Piştî çendakî îca çûye Aqûba ku li wir jî dîsa muderrîsê wan Mela Seîd bûye xwendîye. Ji ber ku di nav gundîyan da şer derdikeve û Seydayê Mela Seîd mudaxele dike, alîyek êrîşî Seyda dike, lêbelê wê hingê Mela Ubeydullah ku mirîdê Şêx Xalid e, li wir e û beytbêj e, Seyda ji wan diparêze. Li ser vê yekê ew alîyê din ê gundî gilîyê Mela Seîd dike û hukûmet wî digire. Mela Seîd jî digel ku çil sal imrê wî heye, ji ber ku hîn jî eskerî nekirîye, esker wî dişênin eskerîyê. Mela Beşîr wê hingê feqîyekî ciwan e, li pey seydayê xwe diçe qereqola Pira Zilek cihê ku wan Seydayê wî kirîye nezaretê, rê nadin hevdişînê, peyra cendirmeyên siwarî yên eskerîyê wî digel feqîyên din digirin. Di pey çendekî da wan berdidin. Mela Beşîr ji wir jî diçe Serdêfê ku nêzî Midyadê ye, sê çar mehan li wir li ba Mela Xelîlê Serdêfî<sup>5</sup> dixwîne. Kitêbên dersê yên ilmê medreseyê xelas dike; lêbelê nabe nesîb ku îcaze wergire. Jixwe bawerîya wî ew e ku gava alimek ne layîqê îcazê be û seydayek îcazê bide, çawa ku şêxek xelîfetîyê bide yekî nelayîq gunehkar dibe, seyda jî gunehkar dibe.

## 3. Têkilîya Wî Digel Îlmê Tesewufê

Mele Beşîr ku Şêx Xalidê Zîlî<sup>6</sup> dibîne, zîyaret dike û dikeve bin karîgerîya wî. Jixwe ji bav û kalan ve bi malbatî ew nêzî wî bûne. Ku Şêx Xalid wefat dike, digel seydayê xwe Mela Silêmanê Pirparî ku mirîdê Ş. Xalid e, diçe hewarîya wî û êdî hîn zêdetir bi wan ra dimîne. Di wan rojên perwerdeyê de dema diçe Ênê ba Seydayê Mela Seîd ku ew zavayê Şêx Mihemedê kurê Şêx Xalid e û di wextê xwe da digel Şêx Ebdulqudûs<sup>7</sup> çûye Sûrî, şêxên Mala Zîlî ji nêz ve nas dike. Bi vî awayî êdî bi tamamî di nav tekyaya û dergayên wan da cih digire.

---

4 Mele Mûhemmed Şerîf kurê Mele Şêxmûsê Batêrgiz/Kercews/Batman, mewlûdnameyêke bi navê *Rîsaletu'l-Usul fi Mewlûdî'r-Resûl* di sala 1976an da nivîsiye. Bnr. M. Zahir Ertekîn, "Di Edebîyata Me de Mewlûd û Rûberûkirina Mewlûdên Pêşîn ên Kurdî û Tirkî", *Uluslararası Kürdoloji Konferansı Bildirileri, Hakkari Üniversitesi*, Hakkari, 2011, r. 123-137.

5 Bi navê Şêx Xelîlê Serdêfî jî alimek li herêma Torê hebûye. Bnr. Taha Nas, "İdilli Bir Alim: Molla Ahmed Nas ve Eserleri (Mele Ahmedê Zinarexî)", *Geçmişten Günümüze İdil (Uluslararası Geçmişten Günümüze İdil Sempozyumu Bildirileri)*, Şırnak Üniversitesi, İstanbul, 2011, r. 364.

6 Şêx Xalidê Zîlî, kurê birayê Şêx Mihemedê Zîlî (wf. 1894) yê bi navê Evdîrehman (Bavo Kalo) e. Şêx Xalid îcaza xwe ji Şêx Xalidê Gulpewarê wergirtîye û ji ber ku di wextê Şêx Ahmedê Zîlî de xelkê gundê Zîla (Yeniçağlar) ew qebûl nekirîye, pêşî çûye li gundê Siloyê Hecî Emer, li Kifîfê bi cih bûye. Peyre çûye Kanîya Qîre, gundê Baherg zeqê, li ser daxwaza Hesoyê Bîrahîm ê Mala Nasir, li Kanîrewa, camî û tekîyaya xwe li Qubîne (Beşîri-Batman) ava kirîye. Nêzî 133 sal 'emir kirîye û di sala 1954an de wefat kirîye. Ji ber rûdana siyâsî ya Bekîran de (1938) li Dîyarbekîrê, digel birayê xwe yê Şêx Badîn bi îdamê hatîye darizandin, peyre ji ber xizmetên wî yên ji bo artêşa hikûmetê ya wê hingê, cezayê wî ji dardakirinê dadixînin sirgûnê. Nêzî deh salan li alîyê Giresunê maye, peyre ku efû derketîye, digel irz û eyalê xwe vegeerîyaye welatê xwe. Peyre ji ber rûdanêke nava mirîdên wî, hikûmet wî sirgûnî bajarên mîna Balikesîr û Sokayê kirîye. Niha di quba xwe ya Kanîrewanê (Örmegözü-Beşîri-Batman) de medfûn e. (Hevdîtina taybet digel Hecî Ebdîrehmanê Sîtîyê: 10.02.2022). Wekî din dikarî bnr. İbrahim Bağdu, <https://www.evliyalar.net/seyyid-seyh-mevlana-halid-i-zilani-k-s/> (Tarîxa xwegihandinê: 17.02.2023)

7 Şêx Ebdulqudûs, lawê Şêx Xalidê Zîlî ye. Hikûmeta Tirkîyeyê, ji ber rûdanêke nava mirîdên bavê wî, ew mehkûm kirîye, wî jî digel mirîdên xwe, piştî ku çend salakî li ber xwe daye, derbasî Sûrîyeyê bûye û di sala 1939an de li wir wefat kirîye. (Hevdîtina taybet digel Hecî Ebdîrehmanê Sîtîyê: 10.02.2022); (Hevdîtina taybet digel Hecî Mihemedê Holî: 21.02.2023).

#### 4. Berhemên Wî

Mela Beşîr hemû berhemên xwe bi terzê menzûm nivîsîne. Wî di biwarê îlmê ‘eqîde, îlmê tecwîd, sîyer (mewlûdname û meşhedname) û tesewufê de bi kurmancî û erebî berhem dane.

##### 4.1. Berhemên Wî yên bi Kurmancî

###### 4.1.1. Zanîna Îlmê Tecwîdê

Mela Beşîrê Îlyozê ev berhem di sala 1962yan de li Manîsayê, wextê ku esker bûye, li ber kitêbeke tecwîdê ya tirkî bi awayê nezmî, wekî wergereke menzûm bi kurmancî nivîsiye. Teşeyê nezmî yê menzûmeyê “qesîde” ye. Hejmara beytên wê 270 ye. Berhem, bi *Dîbace û Muqeddîmeyê* dest pê dîke û peyre mijarên tecwîdê berdewam dîke. Nivîskar ji bo her mijarekê bi awayê “Babu Meddê Tebîî” û “Babu Meddê Muttesil” nav danîne û 27 mijarên tecwîdê rave kirine. Ev tecwîdname bi awayê destnivîs li ber destê malbata Melayî mewcûd e û hîn nehatîye çapkirin. Sernavê wê yê ewil “Dîbace û Muqeddîme” ye û bi van beytan dest pê dîke:

“Hemd bo Xuda medh û sena  
Selat li Tahaê ekremî  
We reng e al û sehbê wî  
Kewn û mekan ta ku hebî  
Piştî selat û pur selam  
Guhdarî bin gelî bira  
Bêjim hinek sozê şîrîn  
Rica qebûlê ji we bî”

Sernavê wê yê îlmê tecwîdê bi “Babu Mexaricu’l-Hurûf” bi van beytan dest pê dîke:

“Ewwel bizane qaîdek  
Pur bûnê te faîde ye  
Beyan bikim ez a niha  
Tu jî ji dil hişyar bî  
Herfê heca mexrecê wan  
Ji devan çawa derdikevin”

Ev menzûmeyê tecwîdnameyê bi sernavê “Xatîme”yê diqede. Beyta wê ya meqteî wiha ye:

“Ey Rebbê qadir û pur xefûr  
Rehma te ji qehrê zêde ye  
Tu paqij î ji ‘eyb û lekan  
Em muhtac in camêr tu yî”

“Temam bû bi arkûna Xudaê teala tertîb û nivîsandina kitaba navdayî bi *Zanîna Îlmê Tecwîd*, li ser destê Muhemmed Beşîrê heqîr, feqîr, di sala hezar û sê sed heştê û diduyan di paşîya Rebû’l-axir da di şehrê Manîsa da li eskerîyê. Ya Reb tu neşîr û nef’a wê ‘am bikî. Amîn. We sellellahu ‘ela seyyîdîna Muhemmed we alihî ecme‘în.”

###### 4.1.2. Mewlûdname

M. Mihemmed Beşîr ev menzûme di sala 1397ê koçî da hûnaye. Herçendî beytên wê bi terzê “mesnewî”yê be jî, ji ber ku di pey her du beytan de “satir”eke ku bi temamê satirên din ên navberê da “hemsarwa” ye heye. Hejmara beytên wê 244 e. Bi temamî 6 beş e û di serê her beşekê da ayeta

“İnnellahe we melaiketehu yusellûne ‘elennebîy” heye. Beşa dawî behsa şeva weilîdîna Cenabê Pêxember dike. Metnê vê berhemê bi awayê destnivîs li ber destê me mewcûd e û hîn nehatîye çapkirin. Beytên ewil yên menzûmeyê:

“Hemd bo Xuda li ser hemî alaê wî  
Hemdekî go qenc kirîye hemdê wî  
Hemd dikim hemd kirine ji nuhmê wî  
Hemdê te bin go bi wî tabî‘ bi wî  
*Ya Ehmeda tu pir mezin me jî bi te tev perwer in*”  
Beytên dawî yên menzûmeyê ev in:  
“Hemdê Xudê bin mewlida me giha xitam  
Di çêbûn û behsa Nebî Fexra Enam  
Hezar û sê sed û not heşt tarîx tamam  
Di nav dehê Miherrem li ser xweyê bin selam  
*Bin dewr û daim tu carî jê qet nebin*  
Beyta ku navê şair tê de derbas dibe:  
Guhdarê pak navê min e Mihemmed Beşîr  
Bê taqet im xwey guneh im bi gunehê kesîr  
Dia bikin bo min bi guneha bûme pîr  
Ji bo qebûlkirina diaê were Xuda qedîr  
*Ji bo bav û kala rica dikim tevî bikin.*”

#### 4.1.3. Meşheda Huseynê Kurê Pêxemberê Axrê Zeman

M. Mihemmed Beşîrê Îlyozî ev menzûme di sala 1402yê koçî da li ber meşhednameyeke ‘erebî nivîsîye û di sala 1422yan da qedandîye. Çawa ku wî bi xetta xwe li serê nivîsîye, wî ev menzûmeya xwe li ser wezna *Rewdu’-n-Ne’îma* Axtepî, bi terzê “mesnewî”yê hûnaye. Berhema wî ya herî berfireh ev e. Hejmara beytên wê 1950 ye. Mielîfî bi destnivîsa xwe ew nivîsîye û ev mena wê li ber destê me heye û hîn nehatîye çapkirin. Hejmara rûpelên wê 124 e.

Wî di destpêka berhemê da wiha nivîsîye: “Meşheda kurê Pêxemberê axirê zeman (Muhemmed ‘eleyhisselatu wesselam). Wergerandina Muhemmed Beşîrê ‘Îlyozî ji meşheda ‘erebî di sala hezar û çar sed û duduyan de, bi zimanê kurmancî, dikim hedîye ji boy milletê kurd. Ya Reb rêya rahatê nesîbê me bike. Amîn”

#### 4.1.4. Medhîyeyên Tesewufî

Ji ber ku Mela Beşîr mensûbê terîqeta Mala Zilî ye, wî li ser malbata wan jî çend helbest hûnane ku teşeyê wan medhîye ye. Bi taybetî li ser Şêx Qasim in. Ev helbestên wî wekî destnivîs mewcûd e û hîn nehatine çapkirin.

#### 4.1.5. ‘Eqîdeya Îmanê<sup>8</sup>

M. M. Beşîrê kurê Mela Nezîr ev menzûmeya xwe di sala 1376an da bi terzê “mesnewî”yê hûnaye. Berhem gişt ji 15 beş, xatîmeya û beşa selatan pêk dihê. Hejmara malikên wê gişt 267 e. Berhem hîn nehatîye çapkirin.

---

8 Spas ji Ebdurrehman Aslan Xoce ra ku wî ev metin ji bo vê xebatê şand. Herwiha wî metna vê gotarê jî xwend û xeletiyên me sererast kirin. Mala wî ava.



Navê beşa yekem Îbtîda û peyra bi dorê ev sernavên beşan hatine: Sifetên Xweda yên Wacibê Selbî, Sifetên Xweda yên Me'anî, Sifetên Xweda yên Me'newî, Sifetên ku ji Xwedê ra ne Gengaz in, Sifetên ku ji Xwedê ra Caiz in, Delîlên Sifetên Xweda, Tiştên Wacib li ser Pêxemberan, Her Du Hevokên Şehadetê, Tiştên Di Derbarê Pêxemberan de Naskirina Wacib, Beşa Milyaketan, Ewladên Pêxemberan, Pîrekên Hz. Pêxember, Beşa Neseba Wî, Tiştên Belavbûyî ku Bawerîya bi Wan Wacib e, Beşa Nîqaşên Qiyametê, Beşa Dawîya Pirtûkê, Beşa Selat û Selaman li ser Hz. Pêxember.

Beşa Destpêka 'Eqîdeyê:

Bîsmillahi min kirî îbtîda  
 Wiha reng bi hemdê kerîmê Xweda  
 Di gel şukrê pir hem sena jî me kir  
 Selat û selam jî me pê re dikir  
 Li ser Ehmedê seyyîdê îns û can  
 Muhemmed ew e fexrê herdu cihan  
 Beşa Dawî ya 'Eqîdeyê:  
 Îşaret bi dil bû bi dil tê xeber  
 Beşîrê feqîrê ku nezan e her  
 Selat û selamê bê hed û jimar  
 Bibarin li ser Ehmedê mu'teber  
 Di piştî selat û selam ya qelam  
 Rehet be li Ehmed tu jî dem bi dem

## 5.2. Berhemên Wî yên bi Erebi

Şairî, helbestên xwe yên bi zimanê erebî, li ser mijarên tesewufî hûnane. Teşeyê nezmî yê van helbestan xezel e. Wekî destnivîs mawcûd in û nehatine çapkirin. Helbestên wî yên bi zimanê erebî yên bi navê *Nezmu'l-Wud*, *Şuhûdu'l-Hesen* û *Kenzukunne* bi terzê xezelê ne.

Ji bilî van xebatan, bi navê *Haşiyetu'l-Furqaniyye 'ela's-Se'dîniyye* ku li ser pirtûkeke gramera erebî şerheke bi erebî ye û xebateke din bi navê *el-Feaidu'l-Xalidiyye* ku şerha *Terkîbê* bi zimanê erebî dike wekî destnivîs di nav defterên Îlyozî da hatin dîtin.<sup>9</sup> Çi heye ku li ser wan ne tarîxa nivîsînê heye, ne jî navê muellif û mustensix. Tenê li ser destnivîsa bi navê *Haşiyetu'l-Furqaniyye 'ela's-Se'dîniyye* îfadeyeke ku ne bi qelama metna destnivîsê ye, bi vî awayî heye: “Sahib we malikehu Ehmed el-Comanî.”

Ji ber ku teşeyê xetên nivîsê ne di dirûvê xetên Îlyozî da ne, me nekarî wan wekî berhemên wî li vir bi cih bikin.

## 5.3. Helbestên Wî yên Curbicur ên Kurmancî

Îlyozî helbestek li ser “tutûn”ê, yek li ser hîdayetê, yek li ser îda Remezanê û yek jî li ser îda Qurbanê nivîsiye. Ligel van wî hin helbestên li ser mijarên din jî hûnane. Xezela wî ya bi navê *Keşfu'z-Zunûn* 20 beyt e. Dîyar e ku wekî din jî helbestên wî yên li ser mijarên cuda cuda hebûne; bes di pêvajoya amadekirina vê lêkolînê da hemû bi destê me neketin. Xezela wî ya bi navê *Keşfu'z-Zunûn* bi vî awayî dest pê dike:

Ey alimê keşfê zunûn wey xweyê emrê kaf û nûn  
 Ey rahimê ku lê nebûn îhsan ji dergahê te tê

<sup>9</sup> Mala akademîsyen Ebdurrehman Aslan ava ku wî ev metin ji bo vê xebatê bi destê xwe teslîm kir. (Tarîxa hevdi-tinê: 05.01.2024).

Îhsan ji te bê mîsal sahib etaê bêfîsal  
 Dewa bîne dengê delal xweyê eta û minetê  
 Derê mineta te ebd û kole naşakiran cemle melûl  
 Ya Reb reca min ke qebûl guhdêrê surra wehdetê  
 Helbesteke wî ya bi navê *Ey Tutinê* bi vî terzî dest pê dike:  
 Ey tutinê ey tutunê û şîrîna dilê minê  
 Ez te nadim bi malê dinê tutin bi min çîqa xweş e  
 Zewq û lezzet pir tê heye jê xweştir qe çî heye  
 Ev ji dilê rast jî wê yekê li min neke reş e  
 Ji tutinê nakim fedî tu car zerer min jê nedî  
 Ev çil sal e bûm xwedî nedirî ye gelek geş e  
 Ez ê vexwim duwê şîrîn nakî li min derd û birîn  
 Mela Beşîr kire qîrîn deng tê nema ew nexweş e  
 Dibê li min qet deng nema ez nexweş im ve çî xema  
 Ez jî yekî wekî we me ez ne wek bavê Bilalê Hebeş e  
 Ez ji tutinê gelek dêşim di nav çendakî de pur têşim  
 Bihn û duxanê ez dikêşim bi min tutin wekî leş e  
 Rast e kî ku nekêşê serê wî jî pur diêşî  
 Divê bidinê hingivê mêşê a jî hinek ji zebeş e  
 Dilkêş bese e ji henek e vîna bi Seyda qet meke  
 Weqta wî derî veke Seyda nabî çî pir geş e  
 Ew Seydayê Mela Beşîr ti car nakim wî najîm  
 Exlaqnerm e wekî hevîr dilgeş gelek itir xweş e  
 Ey Seydayê Mela Beşîr tutinê jî wek pîvaz û sîr  
 Vana daîm tu bîne bîr her du çî ne ser bi çêş e  
 Pîrsê bike navê çî ye ax dal dafî'î ye  
 Ev helbesteke kudî ye Seyda gelek çîqa xweş e

### 5. Helbestên ji Şairên Curbicur

Îlyozî hin helbestên Sîyahpoş, Sîraceddînê Xelîlî û Gurdilî<sup>10</sup> jî di nav defterên xwe da bi cih kirine:

Hewar ji destê neyara  
 Ya nîn serê me kurda  
 Werin ey dost û yara  
 Yekî bikin di pê da  
 Bibin teşbîhê mara  
 Nedin dijmin nevida  
 Wekî şêrenizara  
 Girê din kom û bend e  
 Bi hev ra wek biran  
 Bikin tefaq û kom e

10 “Gurdilî” nexlesa Mele Îmadeddînê kurê mele Hesenê kurê Feqe ‘Elî ye. Ew ji gundê Kirîvaya Misircê (Kurtalan) ye. Mele Îmadeddîn di sala 1937an da li Elebobacîyanê hatîye dinyayê. Wî li gundê Mezrê ji Seydayê Şêx Beşîr, li Tilmizê Seydayê Mele Faîq, li Korikê ji Mele Silêman, li Yuwacixê (Îwacixê) ji Mele Emer, li Ehmedîyê ji Şêx Arîf û Şêx Efîf, li Batmanê ji Seydayê Şêx Fexredîn, li Sergewra ji Seydayê Mele Ebdula ders wergirtîye. Gurdilî di sala 1960î da ji Mele Ebdullahê Sergewra îcazeya xwe girtiye. Mele Îmadeddîn di sala 2020î da li Batmanê wefat kir. *Dîwaneke wî û otobîyografiya wî bi navê Kurtejiyana Min* heye. (Seîd Veroj, “Helbestvanê Kurd Seydayê Gurdilî (Mele Îmadeddîn)”, <https://kovarabir.com/10168/seid-veroj-helbestvane-kurd-seydaye-gurdili-mele-imadeddin/> (Tarîxa xwepêgahîdînê: 18.03.2024; 16:57)

Devbixwîn bin wek gura bin  
Herin qirên rom e  
Bi tedbîr û biratî  
Li ser vebikin dom e

Mersîyeya Gurdilanî ye ku li ser wefata Şêx Qasimê Zilî hûnaye, tê da “bindestîya miletê xwe” û “rewşa welatê xwe” jî derbirîye:

Çi atomek li dil da bû wefata Şêxê Zilanî  
Bi ah û hesret û derd im ji hicrana Şêxê Zilanî  
Felek mala te ne ava be kesî re ne wefadar î  
Li min winda bû Şêx Qasim gula nav baxê Zilanî  
Evê dinya xweş û şîrîn di çavê min de çîqa reş bû  
Çi kum bi zêr û zîv û mal di piştî Şêx Zilanî  
Ji Yezdanê mezin her dem fikir min hêvî û zarî  
Bi min carek nedî dîtî wefata Şahê Zilanî  
Çi go barek giran e ev, nekarî kesî go ew hildî  
Nexasim ew kesê wek min nêzik û dostê Zilanî  
Ji hova ez dinalim û bi nalîn û bi giryan im  
Şev û roja nîne rahet ji firaqa Şêxê Zilanî  
Çawa negirîm heq e bigirîm heta ku hêstriê'm xûn bê  
Ji boy vî miletê bindest gelek perwaz bû Zilanî  
Li Kurdistan dinêrim ez bi bajar û bi gundê xu  
Çi şînek wan girê dabûn ji bona Şêxê Zilanî  
Çi go mîrek cenab'alî wana zû wî winda kir  
Çi reş bû şîlaê dida bûn ser ku wan widan kir Zilanî  
Bi camêrî hezar Hatem bi nanê xu li paş hiştin  
Cihê jar û feqîra tim di Tekyaya Şêxê Zilanî<sup>11</sup>

Helbesteke ku mirov ji destnivîsa Îlyozî pê dernaxe bê aydê kîjan şairî ye wiha ye:  
Cewr qehr û xedeba Xway felek qetek e tu bes  
Dil heland û dil şewitandibûn bi şubhê xanî xes  
Ah û nalîn ji wê daîm diçin ta neh tebeq  
Mislê bilbil em bi efxan in me nîne qet hewes  
Çar ke dil pare pare ey hebîba seddê dîn  
Qapîyê rehmê veke tu bil'ekis bigire tu bes  
Padişahê dewrê axir qabil û ba huner î  
Weqta bêtî hiddetê yaxet em di ber ser es  
Alemê wêran dîkin zulfê te ey çîn çîn heman  
Meyildar in dilşîyar in zarîne me wek çeres  
Asarê îlim û terîqet her ji te peyda dibin  
Hen û hen tu wê 'alemê qam vetures  
Qesîdea wehdet digirt nûra cemala zulcelal  
Nazika dêma xumarî di bi ser ve bules  
Şahidê husna ezel remzek ji ber taa te bit  
Alema kewn û mekan ji quyûdatan qebes  
Ev esîrê xurbetê dil ma li ser qirna şepal  
Bê mecal û bê delîl e îlla qafa muqtebes

---

11 Berdewamîya vê helbestê dirêj e.

Tu hekîmê haziq î cerhê dilê min bê hîsab  
Ke rahê heq bi min ra nîşan de rê li ber min multebes

## 6. Vedîtînen Lêkolînê û Analîza Wan

### 6.1. Kesayetîya Edebî û Ramyarî ya Mela Mihemmed Beşîrê Îlyozî

M. M. Beşîr di serdema rûdanên civakî û sîyasî yê mezîna da hatîye dinyayê. Ew di nav keşûhewayeke sar û dijwar a civakî da li welatê xwe mezîna bûye. Wê hingê di navbera rejîma nû ya cîmhurîyetê û xanedan, şêx û alimên herêmê da geremolek hebûye. Lewra bivê nevwê çawa ku haya wî ji hêla wî ya neteweyî çêbûye, alîyê wî yê îlmî, dînî û tesewufî jî bi pêş ketîye. Di wextê wî da, pîrên terîqeta Mala Zîlî jî tê da, gelek xuyanîyên tesewufê tûşî girtin û sirgûnê bûne. Bi tevî vê, di wextê wî da li alîyêkî rûdanên azadîxwaz ên kurdan; li alîyêkî din jî tevgerên dînî-îslamî yê kurdan di nav liv û tevgeran da bûne. Mela Beşîr, wekî serkirdeyekî nav giregir û xuyanîyên ehlê medrese û tekyayan, bi awayekî rasterast ketîye bin bandora van cure rûdanan. Lewra mîna seyda û mutesewufên serdema xwe ku wan di qada edebîyata dînî da dabû ser şopa edîben alim ên Mala Aqtepiyan, wî jî berhemên xwe yê dînî bi zimanê kurdî nivîsîne.

Navê berhemê	Cureyê wê edebî	Zimanê Wê	Hejmara beytên wê
'Eqîdeya Îmanê	Mesnewî	Kurmancî	267
Mewlûd	Mesnewî	Kurmancî	244
Meqtelname	Mesnewî	Kurmancî	1950
Tecwîdname	Mesnewî	Kurmancî	270
Keşfu'z-Zunûn	Xezel	Kurmancî	20

Çawa ku ji tabloya jorîn jî xuya dibe, ji bilî xebatên wî yê dînî, çar berhemên serekî yê Mela Beşîr bi kurmancî hene. Mijara her çaran jî dînî ye û hemû jî bi teşeyê menzûm in. Ji van menzûmeyan berhema ku qewareya wê ji temamê yê dînî mezintir e, *Meşhednameya Hz. Huseyn* e, peyra *Tecwîdname*, peyra *'Eqîdeya Îmanê*, *Mewlûdname* û herî dawî jî xezela bi navê *Keşfu'z-Zunûn* tê.

### 6.2. Cihê Wî di Ekolên Edebî yê Dîroka Edebîyata Kurmancî da

Mela Beşîr, bi xetta destê xwe li ser menzûmeya xwe ya Meşhedê nivîsiye, wî ev menzûmeya xwe li ser wezna mesnewîya *Rewdu'n-Ne'îma* Axtepi hûnaye. Ji vê jî dîyar dibe ku haya wî ji Ekola Aqtepiyan heye û wî li ber vê berhema Şêx Ebdurrehmanê Aqtepi meşhednameya xwe nivîsiye. Çawa ku wî bi xwe jî di serê menzûmeya xwe ya *Meşhednameyê* da dîyar kirîye, wî di weznê da *Rewdu'n-Ne'îm* esas girtîye. Gava em li wezna wê dinîherin, dibînin ku ji qalibên wezna erûzê, li ser “fe‘ûlun fe‘ûlun fe‘ûlun” e. Çawa ku ji zimanê mesnewîya Îlyozî jî dîyar dibe, wî wekî zimanê standard ê edebîyata nivîskî ya klasîk, terz û teherê Axtepiyan ji zimanê xwe ra mînak girtîye; bes di wezna metna wî da kêmahî hene:

Dikim îbtida bi hemdê kerîm  
Digel pir selewata li hebîbê ‘ezîm  
Tevî al û sehaba welî nêzî wî  
Ku ehlê ‘eba ne ji nêv malê wî

Wekî din di hevdeştin û hevpeyvînê da jî wî bi xwe ev helwesta xwe dîyar kir. Tiştê ku heye wî di biwarê tesewufê da daye ser şopa Şêx Xalidê Zilî.

### Encam

Mela Beşîr, endamê malbateke alim a herêma Batmanê ye. Mîrê Cizîrê gundek daye kalê wî yê bi navê Derwêş û ew bi malbatî li wir bi cih bûye. Bavê Mela Beşîr jî mela ye, lewra vî edîbî tehsîla xwe ya ewil, di salên zarokatiya xwe da li ber destê bavê xwe dîtîye. Ev ku heye, jê ra bûye avantajê mezîna ku di warê xwênariyê da zû bi pêş bikeve. Di serdema wî da herçendî derfetên ilm û îrfanê kêmbin jî, dîsa wî rê û dirb bi dest xistine ku di medreseyên giring ên herêmê da, li ber destê alimên muteber ên wê serdemê, ilmê îslamî tehsîl bike û di vî qadê da heta pile û payeya îcazê bilind bibe. Wî li cem mela û miderisên navdar ên mîna Mela Mihemed Şerîf (Kercews), Mela Silêmanê Pirparî (Hewrê), Mela Seîd (Ênê û Aqûba), Mela Xelîlê Serdêfî (Serdêf-Midyad) xwendîye. Ji ber ku Mela Beşîr di medreseya Mela Mihemed Beşîrê Kercewsê da xwendîye û seydayê wî Mela Şerîf jî mewlûdnameyek nivîsîye, dibe ku ew bi xwe jî ketibe bin karîgeriya seydayê xwe û wî jî li ser vî êkolê mewlûdnameya xwe nivîsibe.

Îlyozî çawa ku di tehsîla xwe ya ilmê medreseyê da gihastîye pile û payeya bilind, derketîye xizmeta mîletî jî. Wî hem li mizgeftên herêmê wezîfeya îmamtiyê kirîye, hem jî pê ra li gor derfetên xwe û derfetên gundîyan medrese vekirîye û mideristî kirîye. Bi tevî vî, ji ber ku bi malbatî nêzî şêxên Mala Zilî yê devera Kanîrewan bûne, derfet jê ra çê bûye ku di biwara tesewufê da jî xwe bigihîne. Bi alîkariya dam û dezgayên vî terîqetê, wî kariye li gundên cîya cîya yê vî herêmê melatî bike, kar û barên birêvebirina medreseyan pêk biêne û di ber îrşada civaka xwe da kedeke baş bide.

Ji bîyografî, berhemên wî û ji hevdiştin û hevpeyvînên digel wî dîyar dibe ku çawa meyla dilê wî li ser ehîlê beyta Cenabê Pêxember (wekî menzûmeya wî ya *Meqtelnameya Hz. Huseyn*), alimên medreseyan, pîrên terîqetê û realîteya dînê wî ye, pê ra jî dilxwazê maf û azadiya gelê xwe bûye. Ji helbestên wî yê Ehlê Beytê xuya dibe ku wî jî daye ser çexer û ekola edebî ya Şêx Ebdirehmanê Axtepî. Çinku edîbên Ekola Axtepî, dildar û dilsozên mezîna Ehlê Beytê ne û wan zêde giranî û giringî daye wesifandina Ehlê Beytê Cenabê Muhemmed. Ev terzê wî yê edebî, di zimanê helbestên wî da jî xuya dibe. Çunkî wî jî berhemên xwe bi kurmancîyeke xwerû ku xelkê awam jî bi hêsanî dikare tê bigihîje nivîsîne. Lewra wekî êkol, ew jî bi rêbaza berhemên xwe, dikeve bin banê tradîsyona edebî ya ekola Aqtepîyan.

Berhemên wî hema hema bi temamî dînî ne û wî li dor ekola edebîyata klasîk a îslamî teşe daye wan. Mîna piraniya edîbên edebîyata medreseyên herêmê, wî jî digel hin helbestên tesewufî û civakî, mesnewîyeke mewlûdê, 'eqîdeyeke îmanê, tecwîdnameyek û meqtelnameyek li kulliyata edebîyata îslamî ya kurdî zêde kirîye.

Heke hemû helbestên wî yê bi zimanê erebî û kurmancî li hev bihên komkirin, ihtîmal heye ku diwaneke wî derkeve meydanê. Lewra pêdivî bi xebatên hîn berfirehtir ên li ser wî û berhemên wî heye.

### EXTENDED ABSTRACT

On various occasions in the Batman region, it was rumored that an elderly madrasa scholar named Mela Beşîr had written masnavi and poems in Kurdish, but there was no concrete and written information about the biography and works of this author. So this bothered us because it was a problem and it had to be solved sooner rather than later. Without a scientific study of his biography and works while he was still alive, there was a risk that his biography would not be well known and his works would be lost. Therefore, the place of him and his works in the history of Kurdish literature could not be determined. Naturally, this research identified this situation as a research problem and sought answers to questions such as “Who is Mela Beşîr, what kind of works did he produce in Kurdish and other languages, and in which literary tradition do his works belong in the history of Kurmanji literature?”.

In order to solve this problem, we embarked on a field study in order to see the scholar, learn about his biography, and get to know and promote his works. We met with him at his home and received answers to the questions we had prepared in advance. During the course of the study, it was determined that Mela Beşîr was a scholar and intellectual who was educated in the important madrasas of Tor and Batman region, took lessons from the notable muderris of the period, and wrote literary and religious works in Kurmanji and Arabic.

On the basis of this fieldwork, after collecting the necessary information about the author’s family, biography and works, and after analyzing his literary personality and works based on the data, it was determined that Mela Beşîr was born in 1938 in the village of Îlyoz in the Kercewsê (Gerçüş) district of Batman, that he also received Sufi education in the important tekkes of the region, and that he rose to a high degree in two fields, especially in madrasah. After completing his madrasa education, he obtained his Imam Hatip High School diploma, which is an official institution of the Republic of Turkey, by studying outside, and then officially worked as an imam in state mosques and taught classical madrasa style students for a certain period of time.

In addition to his scholarly works and religious services, Mela Beşîr also wrote literary and religious works in Arabic and Kurmanji under the title *‘Eqîdeya Îmanê*, especially a verse al-’aqidaname (267 couplets), a mawlid masnavi (244 couplets) under the title *Mewlûdname*, and a maqtelname (1950 couplets) in verse under the title *Meşheda Huseynê Kurê Pêxemberê Axrê Zeman*. In addition to writing a tajwîdnama in verse under the title *Zanîna Îlmê Tecwîdê* (270 couplets) from a Turkish tajwîd text, he also wrote some poems on mystical and social issues in Arabic. A Kurmanji ghazal of 20 couplets titled *Keşfu’z-Zunûn*, a Kurmanji ghazal titled *Ey Tutinê* and another Kurmanji ghazal titled *Cewr Qehr û Xedeba Xway*, the exact authorship of which has not been determined, were also found in the manuscripts. The poet wrote all these works in Arabic script.

The manuscript notebooks also include a mersiyah written by Molla Imad al-Din (Gurdilî) on Sheikh Qasim, the Sufi order priest of the Zilan tekke in Besiri, and a poem each by Siyahpoş and Mela Siraceddinê Xelîfî. From the theme and style of his Maktelname, it is clear that he follows the Aktepe School, one of the literary traditions in the history of Kurdish literature. The influence of Melayê Bateyî can be seen in his Mawlid masnavi. The influence of Ehmedê Xanî is also seen in his masnavi *‘Eqîdeya Îmanê*. Mela Beşîr died in Batman in 2022.

Despite this literary output and the passage of nearly half a century, none of his works have ever been published. We have translated some of his manuscripts into Kurdish Latin script, but so far they have not been published. If academic studies were conducted on his works, his place in the historical literary traditions of Kurdish literature could be more clearly defined.

### **Çavkanî**

- Ertekîn, M. Zahir, “Di Edebîyata Me de Mewlûd û Rûberûkirina Mewlûdên Pêşîn ên Kurdî û Tirkî”, *Uluslararası Kürdoloji Konferansı Bildirileri, Hakkari Üniversitesi, Hkkari*, 2011
- Nas, Taha, “İdilli Bir Alim: Molla Ahmed Nas ve Eserleri (Mele Ahmedê Zinarexî)”, *Geçmişten Günümüze İdil (Uluslararası Geçmişten Günümüze İdil Sempozyumu Bildirileri, Şırnak Üniversitesi, İstanbul*, 2011, r. 364.

### **Çavkanîyên Dijîtal**

<https://www.evliyalar.net/seyh-muhammed-kasim-zilani-k-s/>


<https://www.evliyalar.net/seyyid-seyh-mevlana-halid-i-zilani-k-s/>

Seîd Veroj, “Helbestvanê Kurd Seydayê Gurdilî (Mele Îmadeddîn), <https://kovarabir.com/10168/seid-veroj-helbestvane-kurd-seydaye-gurdili-mele-imadeddin/>

### **Çavkanîyên Zindî**


- Notên hevdîtî û hevpeyvîna taybet ên digel Mela Mihemed Beşîrê kurê Mela Nezîrê Îlyozî, 1ê Adara 2021ê li mala wî ya Batmanê.
- Hecî Ebdirehmanê Kiffî, 83 salî, ji gundê Kiffê, mirîd û wekilê dergayê Mala Şêx Qasim e.
- Hecî Mihemedê Holî 91 salî, ji gundê Holê.

Pêvek




Metna destxet a mersiyeya Gurdilî ku li ser Şêx Qasim hûnaye.







Metna destxet a Tecwîdnameya Îlyozî ji rûpelê dawî




Metna destxet a Tecwîdnameya Îlyozî rûpelê ewil




Destnivîsa wî ya helbestên bi zimanê Erebi




Helbesteke Siyahpo yek ya Sîracedîne Xelîlî



Destpêka Meşhednameyê



Dawîya Meşhednameyê



Destpêka Mewlûdê

## Mewlîdê Ehmedê Xasî De Nûrê Muhammedî<sup>1</sup>

Ahmed Hasi'nin Mevlidinde Nûr-u Muhammedî

Muhammadian Light in the Mevlid of Ahmed Khasi

İbrahim DAĞILMA

İbrahim DAĞILMA	İbrahim DAĞILMA   <a href="https://orcid.org/0000-0001-6521-119X">https://orcid.org/0000-0001-6521-119X</a>   idagilma@bingol.edu.tr Dr. Bingö University, Institute of Living Languages in Türkiye, Department of Zazaki Language and Literature, Bingöl, Türkiye
<b>Jêgir</b> Citation Atf	Dağılma, İ. (2024). Mewlîdê Ehmedê Xasî De Nûrê Muhammedî, <i>The Journal of Mesopotamian Studies</i> (16), 26-47 DOI: <a href="https://doi.org/10.35859/jms.2024.1387888">https://doi.org/10.35859/jms.2024.1387888</a> .
<b>Dîroka Şandinê</b> Submission Date Geliş tarihi	08.01.2023
<b>Dîroka Qebûlê</b> Acceptance Date Kabul Tarihi	11.03.2024
<b>Dîroka Weşandinê</b> Publication Date Yayın tarihi	30.03.2024
<b>Cureyê Gotarê</b> Article Type Makale Türü	<b>Gotara vekolînê</b> Research article Araştırma makalesi
<b>Hakemî</b> Peer-Review Hakemlik	<b>Cot Nenas – Du ji derve</b> Double anonymized - Two External Çift Taraflı Kör Hakemlik – İki hakem
<b>Beyana Etîk</b> Ethical Statement Etik Beyanı	<b>Hatîye beyankirin ku di pêkanîn û nivîsîna vê xebatê de hemû rêzikên zanistî û etîk hatine şopandin û hemû çavkanî bi awayekî têkûz hatine referanskirin</b> <i>It is declared that scientific and ethical principles have been followed while carrying out and writing this study and that all the sources used have been properly cited.</i> Bu çalışma yapılırken ve yazılırken bilimsel ve etik ilkelere uyulduğu ve kullanılan tüm kaynaklara uygun şekilde atıfta bulunulduğu beyan edilir.
<b>Kontrola İntihalê</b> Plagiarism Checks Benzerlik Kontrolü	<b>Belê – iTenticate</b> <i>Yes – iTenticate</i> Evet – iTenticate
<b>Nakokiyên Berjewendiyan</b> Conflicts of Interest Çıkar Çatışması	<b>Di gotarê de di navbera nivîskar û ti alîyên din nakokîya berjewendîyê tune ye.</b> <i>There is no conflict of interest between the author and any parties in the article.</i> Yazar ile makalede yer alan taraflar arasında herhangi bir çıkar çatışması bulunmamaktadır.
<b>Alîkarîya Darayî</b> Grant Support Maddi Destek	<b>Nivîskar beyan dike ku wan wî ji bo vê vekolînê ti fonên derveyî wernegirtine.</b> <i>The author(s) acknowledge that they received no external funding in support of this research.</i> Yazar(lar), bu araştırmayı desteklemek için herhangi bir dış fon almadıklarını kabul etmektedirler.
Mafê Telifê & Destûr Copyright & License Telif Hakkı & Lisanslama	<b>Nivîskar li jer lîsansa CC BY-NC 4.0 mafê xwe yê li ser xebata xwe diparêzin.</b> <i>Authors publishing in the journal retain the copyright to their work licensed under the CC BY-NC 4.0.</i> Dergide yayın yapan yazarlar, CC BY-NC 4.0 kapsamında lisanslanan çalışmalarının telif haklarını saklı tutarlar.

1 **Editöryal not:** Bu yazıda kullanılan alfabe Editör Kurulunun kararı ile değiştirilmiş ve dergimizin standard kabul ettiği alfabe kullanılmıştır. Fakat yazarın Arap alfabesinden Latin alfabesine yaptığı transkribe metinler değiştirilmemiştir.

**Editorial note:** The alphabet used in this article has been changed with the decision of the Editorial Board and the standard alphabet accepted by our journal has been used. However, the author's transcription from Arabic to Latin alphabet has not been changed.



## KILMVATE

Binê sernuşteyê edebîyatê klasîkî de ê eserê ke behsê Hz. Pêxemberî kenî, heyatê ey anî zıwan û ey wesifnenî mîyanê eseranê manzum û mensuran de tewr zaf î. Ma eşkenî verê cû mewlîdan û dima zey naat, siyer, hîlye, çewres hedîs, mîracname û Muhammedîyye zaf tewiran mîyanê inî eseran de bihesibnê. Zey musulmananê bînan şairanê zazayan zî seba ramotîşê heskerdîşê xoyê Hz. Muhammedî û qîmet dayîşê ey eserî nuştî. Heyatê Hz. Muhammedî de zaf hedîseyî ecayîbî û mucîzeyî qewimîyayî. İnan ra yew zî a mucîzeyî nûrîya ke bi nûrê Muhammedî yena zanayîş. Goreyê rîwayetan, ino nûr verê cû çareyê Hz. Âdemî de asayo. Dima pêxemberî ra pêxemberî vîyarto û peynî de ameyo resayo Hz. Muhammedî. Ino nûr, elamet û salîqdarê pêxembertîya Muhammedî yo. Derheqê estîya nûrî de yew mineqeşa çin a; labelê senînîya nûrî ser a rîwayetî yewbînan ra cîya yî. Metaforê nûrî, zey edebîyatane klasîkanê şaranê bînan edebîyatê klasîkê Zazakî de zî ca girewto. Edebîyato klasîk ê Zazakî de esero verên mewlîdê Ehmedê Xasî yo. Zey mewlîdanê bînan nê mewlîdî de zî mewzuyê nûrê Muhammedî ca geno. Ina xebate, mewlîdê Ehmedê Xasî sera virazîyaya ke ino mewlîd mîyanê edebîyato klasîk ê zazakî de ca geno. Xebate, xebatêka sînorin a. Ay ra semedê tesbîtkerdîşê metaforê nûrî û nûrê Muhammedî yo ke mewlîdê Ehmedê Xasî de ca gênî virazîyaya.

**Kilîçekuyî:** Pêxember, Nûr, Nûrê Pêxemberî, Mewlîd, Hz. Muhammed

## ÖZ

Klasik edebiyat başlığında kaleme alınan manzum ve mensur eserler içerisinde Hz. Peygamber'i anlatan, onun hayatını işleyen ve onu methetmek için yazılan eserler oldukça fazladır. Mevlitler başta olmak üzere naat, siyer, hilye, kırk hadis, miracname ve Muhammedîyye gibi pek çok tür bu eserler arasında zikredilebilir. Diğer Müslümanlar gibi Zaza şairler de Hz. Peygamber'e olan sevgisini ve ona verdikleri değeri göstermek için eserler kaleme almışlar. Hz. Peygamber'in hayatında birçok olağanüstü olay ve mucize gerçekleşmiştir. Bunlardan biri Nûr-u Muhammed-i nûr olarak bilinen nûr mucizesidir. Rivayetlere göre bu nûr, ilk önce Hz. Âdem'in alnında görülmüştür. Sonra peygamberden peygambere intikal etmiş ve en sonunda Hz. Muhammed'e (sas) ulaşmıştır. Bu nûr, Muhammed'in peygamberliğinin alameti ve habercisidir. Varlığı hususunda bir tartışma olmayan bu nûrun niteliği hakkında gelen rivayetler birbirinden farklıdır. Nûr metaforu, diğer klasik edebiyatlarda olduğu gibi Zazaca klasik edebiyatta da konu olarak ele alınmıştır. Zazaca klasik edebiyatta yazılan ilk eser, Molla Ehmedê Xasî tarafından yazılan mevlittir. Diğer mevlitler gibi bu mevlitte de nûr-u Muhammedî konusu yer alır. Bu çalışma, Zazaca klasik edebiyatı içinde yer alan Ahmed Hasi'nin mevlidi üzerine yapılmıştır. Çalışma, nûr kavramı ile sınırlı bir çalışma olduğu için Ahmed Hasi'nin mevlidindeki nûr metaforu ve nûr-u Muhammedî'yi tespit etmek amaçlı yapılmıştır.

**Anahtar Kelimeler:** Nûr, Peygamber, Peygamberlik Nûru, Mevlid, Hz. Muhammed.

## ABSTRACT

Among the poetic and prose works written under the title of classical literature, there are many works that describe the Prophet Muhammad, deal with his life, and are written to praise him. Many genres such as Mevlids, naat, siyer (biography), hilye, forty hadiths, miracname and Muhammedîyye can be listed among these works. Like other Muslims, Zaza poets wrote works to show their love for Prophet Muhammad and the value they gave him. Many extraordinary events/miracles took place in the life of Prophet Muhammad. One of these is the light miracle known as Muhammadian Light. According to narrations, this light was first seen on the forehead of Prophet Adam. Then it passed from one prophet to another and finally reached the Prophet Muhammad (pbuh). This light is the sign and message of Muhammad's prophethood. The narrations about the nature of this light, whose existence is not in dispute, differ from each other. The metaphor of light has been discussed as a subject in

classical literature in the Zaza language, as in other classical literature. The first work in Zaza classical literature is the mevlid written by Molla Ahmed Khasi. Like other mevlids, this also includes the subject of Muhammadian light. This study was conducted on the Mevlid of Ahmed Khasi, which is among the classical literature of Zaza Language. Since the study is limited to the concept of light, it was conducted to identify the light metaphor and Muhammadian Light in Ahmed Khasi's mevlid.

**Keywords:** Light, Prophet, Light of Prophethood, Mewlid, Prophet Muhammad.

### Destpêk

Mufesîran û mutasawifan dewrê verênî ra roşnîya ayetan û hedîsan de nûrê Muhemmedî ra behs kerdo û derheqê ino xisusî de sey eseranê xo yê sîyer, tebaqat, tarîx, mewlîd û eqaidnameyan de melumatî dayî. Goreyê sofîyan nûrê Muhemmedî hetê xulqkedişî/viraştişî ra mîyanê mexluqatan (esteyan) de çîyo verên o. Seba inay dînan, mezheban, îlman û kulturane çîyayan de derheqê esteyo (mexluq) verênî de fikirî erzîyayî werte û çîyî ameyê vatiş. Zey Muhyeddînê 'Erebî, İmâm-î Rabbânî (Demîrcî, 1997: 179) û Ehmedê Xasî zaf alimî vanî, çîyo/esteyo ke tewr verê xelq bîyo nûrê Muhemmedî yo. Mexluqatî bînî hema newe ino nûr ra xelq bîyî û virazîyayî. Qelem, 'erş, feza, aqil, ruh, vaş û heywan çî est o û çin o her çî bi wesîleya ino nûrî payîdar bîyo.

Qey ino mexluqo (esteyo) verên nûrê Muhemmedî bi yewna vate ruhê Muhemmedî û heqîqetê Muhemmedî name bîyo (Kiliç, 2009: 144-147). Zaf alimî derheqê mexluqan (esteyan) û derenceya xulqbîyîşê înan melumatan danî. Hina zaf alimî tesawufî, mewzuyê Wucud (çîyo ke est o) de menaya heqîqê de Homayî qebul kenî. Goreyê înan, inî esteyî (mexluqî) bînî tezahurî yî. Tezahurê (asayîşî) Esteyî (El-Wucud) de derenca ra derenca wehdet (yewî) ra hetê kesret herikîyeno. "We îlallahî turce'ul umûr / her çî gure (çî) est o ageyreno Homayî." (Çolîg, 2014: 'Al-î İmran 3/109). Goreyê ina ayete este (mexluq) peynî de kesret (zaf) ra hetê wehdet (yewî) herikîyeno. Derenceya viraştişê esteyan a verên de tezahurê estîya Heqqî (Homayî) ra vanî "te'ayyuno (asayîşo) verên. Nûro verên heqîqeto verên o û ino heqîqet bi halê wehdet de tecelîyê nameyê zatê Ellahî yo. Ino nûr zî, nûrê Pêxemberî yo. Famkerdişê mewzuyê nûrê Muhemmedî bi zanayîşê mefhumê nûrî beno. Gereka kelîmeyê nûrî Qur'an û hedîs de senî vîyerîyayo û kamcîn manayan de şuxulîyayo, kamcîn esteyî bi 'nûr' name bîyî, tekîliya nûrî û pêxemberî senî yew çarçewa de ca gêno bêro zanayîş (Çelîk, 2004: 144-146). Eger fikrê nûrê Muhemmedî menaya xo ra Nûrê Muhemmedî biqerifiyo, bîyero durfinayîş û sey yew mewzuyo newe biercînîyo heqîqet nêkuweno werte.

Mefhumê nûr Qur'ano Kerîm de bi manayanê çîyayan hem qey Homayî hem zî qey tikê mexluqatan (esteyan) şuxulîyayo (Çelîk, 1999: 149-155). Qur'ano Kerîm de nameyê sureya 24. 'en-Nûr' o û ina sure de ayeta 35. nameyê zatê Homayî rê îzafê bîyo. Ina çarçewa de gereka inî di çîyan ma xo vîra mekerê: Tecelîya nameyanê Homayî ê mexluqatanê bînan de bi çend nameyan beno; la însanî de ino tecelî (asayîş) bi heme nameyan beno. Ino xisus, sureya Beqara ayeta 31. de vîyareno. Xisuso dîyin O Homayo ke nûrê ezmanan û erdî yo nûrê ey heme mexluqatan de tecelî keno/ aseno (Çelîk, 1999: 149-155). Inî wîrdî xisusan ra ina netîce vecîyena. Bi heme nameyanê İlahîyan tecelîya kamil Pêxemberî ma Hz. Muhemmedî de bena; çunkî hedîsan gore "Meqamê ey meqamê heme însanan ra berz o.", "Qata Homayî de mîyanê însananê verênan de û peyênan de zî tewr qîmetdar o." (İyâz, 2012: 196-198) û inay ra wet tewr xeyrinê heme mexluqatan o.

Eger ma hokê nûr ra krîfîkê mewzu bikerê, hetê tecelîya nûrê İlahî ra Pêxember wayirê nûrê tewr girdî yo. Muhemmed aleyhî selam, qey heme aleman wesîleyê rehmetî yo (Çolîg, 2014: Enbiya 21/107). Inî sebebî ra bînatîyê nûrê Muhemmedî û heme mexluqatan de yew tîkîlî est a. Goreyê alimanê İslâmî yê verênan ra Muqâtil lacê Silemanî (w. 150/767) 'mîsalê nûrê Homayî' ra meqsed 'nûrê Muhemmedî' yo (Akkaya, 2012: 180-202). Reyna zey Taberî (w. 310/923) û Râzî (w. 606/1210)

tikê mufesîrî tefsîrê ayetî cêrîn de vanî: “Nûr ra meqsed Muhemmed aleyhî selam o.” (et-Taberî, 2003: 264; er-Râzî, 1988: 548).

“Ya ehlê kitabî! Raşt a Resulê ma şîma rî ameyo kî ê çîyî kî şîma kitab ra vetî, înan şîma rî keno eşkera (vano) û zaf çîyanê şîma zî efu keno (nîvano). Bîşek şîma rî Homayî ra yo nûr û yo kitabo zelal ameyo.” (Çolîg, 2014: Maîde 5/15).

Hedîsan de zî derheqê mewzuyê nûrê Muhemmedî de sey hedîsanê cêrênan melumatî est î: “Âdem hema benateyê ruh û cesed de bi ez (o wext) pêxember bîya.” (Yildirim, 2001: 193-207). “Ez xulqkerdîş de verênê nebîyan (pêxemberan) o û hetê şîrawitîşî ra peyin (ê înan) o.” (Akkaya, 2012: 180-202).

“Ez, viraştîşê Hz. Âdemî ra di çarês hezar serre verê cû huzurê Homayî de yew nûr bîya. Ino nûr, Cenabê Heqqî tesbîh kerdêne, meleketan zî bi tesbîhê ey Homayî teşbîh kerdêne. Homayî, wext Hz. Âdem viraşt ino nûr eşt sulbê (neslê) ey... Homayî ez sulbê (neslê) lacanê Âdemî ra şîrawit rîyê erdî. Dima ez eşta sulbê Nuhî, ey ra dima ez eşta sulbê İbrahîmî. Hina hina Homayî her tim ez sulbanê esîlan û hemleyanê pakan ra ez çarnawa...” (Ay, 2010: 77-120)

Mewzuyê nûrê Muhemmedî û heqîqetê Muhemmedî de îzahetî tewr verênî Câfer es-Sâdiqî (w. 148/765), Zunnûn el-Misrî (w. 245/859 [?]) û “Ebdullah et- Tusterîyî (w. 283/896) viraştî (Çift, 2004: 144-146). Goreyê Câfer es-Sâdiqî kelîmeya herfê muqata ‘nûn’ ê ayeta verên ê Sureya Qelem nîşanê nûrê Muhemmedî ya û ey ayeta 4. de kelîmeya ‘xuluq’ menaya ‘nûr’ de tefsîr kerda (Akkaya, 2012: 180-202). Sehl lacê Abdullah et-Tusterî tefsîrê ayeta 31. ê sureya ‘Al-î İmran vano: “Nûrê pêxemberan, alemanê bînan, dinya û axîretî nûrê ey ra yo. Kam heskerdîşo heqîqî wazeno wa ey dima şîyero.” (et-Tüsterî, 2002:27). Goreyê Hallacê Mansurî ‘Nûrî pêxembertî, nûrê Hz. Muhemmedî ra vecîyaya werte û inî nûrî pê nûrê ey benî eşkera. Mîyanê nûran de nûrê ey ra berîqîyaye (yew nûr) çin o û nûrê ey ra ver zî yew nûr çin o.’ (Akkaya, 2012: 180-202). Homayî verê cû nûrê Muhemmedî viraşt; dima her çî ino nûr ra û qey xatîrê inê nûrî viraşt. Ino nûr, çareyê heme pêxemberan de est bî û berîqîyayêne. Dima ino nûr ê çareyanê pakan ra ameyo resayo paştê Hz. Muhemmedî û uca de vinderto (Apuhan, 2022: 124). Hz. Muhemmed, hem bîyayîşê xo ra ver hem wextê bîyayîşê xo de wesifîyayo û heta rocê qiyamet zî wesifîyeno. Wareyê ino wesifkerdîşan de şîiro tewr verên bawkalê Hz. Muhemmedî, Ebdulmitalîbî nuştö:

“Hemd ê Homayî rê bo; ey ino ewlado rind û şîrin dayo mi.

Wi hema gongila de tutanê bînan rê bîyo Seyîd

Ez ey wayîrê rukunanê Ka’be rê emanet kena.” (Bakirci, 2003: 129).

Ameyîşê İslamî ra dima qey wesifîyayîşê Hz. Muhemmedî tewr zaf şaîrî, vecîyayî ver. Mîyanê eshaban de zî inî şaîran ra şaîrî est î. Bîyayîşê Pêxemberî mîyanê inî wesifnayîşan de mureyêka gird a. Labelê heyatê pêxemberî teyna *bîyayîş/welîdyayîş* ra îbaret nîyo; inay ra kitabê *şemalî* zî hetê mewzu ra mîyanê tewîrê mewlîdî de hesibîyenî (Bakirci, 2003: 63, 67). Mewlîdî exleb bi inî destpêkan (gîrîzgahan) dest pêkenî:

“Estareyî senî birçanê xo de geyrenî nûrê Muhemmedî zî heta resayo hemleyê dadîya xo mîyanê sulbê şexisanê pak, berz û wayîrê şerefan de geşraybî.” (Bakirci, 2003: 163).

“Hema levhî mehfuz û qelem çin bî û hema ezman berz nêbîbî, wi est bî.” (Bakirci, 2003: 163).

Nûrê Muhemmedî yew temsîl o û ino temsîl ‘*tîj, aşm yan zî estarî*’ ser bîyo yew temsîl û teşbîh. Ino nûr, tarîtî û cahîltî dano wera, kaînatî seraser keno roşnayî.

Nûrê Muhemmedî mîyanê aliman, sofîyan û şairanê musulmanan de teyna hetê ilmî ra nêameyo vînayîş. Hetê heskerdiş û wesifnayîşî zî nûrê Muhemmedî ra behs bîyo. Nê nûrî sera şîrî û qesîdeyî ameyê nuştene. Mewzuyê ‘Nûrê Muhemmedî’ edebîyatê tirkan, ereban, farisan, kurmancan û zazayan de mîyanê edebîyatê klasîkî de ca girewto. Ino mewzu, exleb kitabânê sîyeran, tarîxan û mewlîdan de vîyareno. Edebîyatê zazakî de zî eseranê klasîkan ê muxtelîfan de nûrê Muhemmedî ra behs bîyo. Inî eseran ra yew eser mewlîdê Ehmedê Xasî *Mewlîdu'n-Nebîyyu'l-Qureyşîyyî* yo. Mewzuyê nûrê Muhemmedî nê mewlîdî de weşa-weş ca girewto. Zanayîşê mefhumê nûrê Muhemmedî û ino mefhum ser şuxulîyayîş seba edebîyatî muhîm o. Ino mefhum, edebîyatê dînî yê îslamî de eseranê klasîkan de vîyareno. Nê sebebî ra zanayîşê çarçewaya nê mefhumî ihtîyacî ya û tesbîtkerdişê nê mefhumî yew problem o. Na xebate zî nê sebebî ra mewlîdê Ehmedê Xasî de mefhum û mewzuyê nûrê Muhemmedî ra behs kena. Ina xebate de metodê tehlîlo descratîf ameyo şuxulnayîş. Datayî xebata Mewlîdê Xasî ra ameyî girewtîş. Dima ê çimeyî ke tede nûrê Muhemmedî ra behs beno. Inî çimeyan ra zî qasê ihtîyacîya xebate verî ameyî girewtîş. Xebate de mewlîdê Ehmedê Xasî de kelîmeya nûrî çend ca de vîyarena, çî mena de vîyarena înan ra goreyê rezkerdişê mewlîdî behs bîyo. Û cayî ke mefhumê nûrê Muhemmedî vîyareno ê cayî bi usulê şerhî îzah bîyî.

## 1. Ehmedê Xasî û Mewlîdê ey

Ehmedê Xasî, alim, zanaye û şairanê dewrê peyên ê Usmanîyan o. Wi serra 1867î de dadiya xo ra bîyo û serra 1951î de 18ê Sibate de wefat kerdo. Xasîyî, hetê ilim û sîyasetî ra xo zaf hol resnayo. Xasî; zazakî, kurmanckî, tirkî, ‘erebkî û fariskî zanayêne û bi inî ziwanan nuştayî û şîrî nuştî (Dağilma, 2015: 124-146). Edebîyatê zazakî de hem esero verên hem mewlîdo verên *Mewlîdu'n-Nebîyyu'l-Qureyşîyyî* nuştî. Xasî, Camîya Gird ya Dîyarbekirî de melatî, qezaya Licê de miftîti kerda, fetwaya Enqera de înzayê ey zî est a û hîrê serrî zî Rodos de nefîy (surgun) mendo (Korkusuz, 2004: 62-69).

Ehmedê Xasî zaf eserî nuştî. Eserê eyo tewr namdar mewlîdê ey *Mewlîdu'n-Nebîyyu'l-Qureyşîyyî* yo. Xasî, mewlîdê xo yew menşur û namdar serra 1889î de, hema 23 serre bî, nuştîbî. Mewlîdê ey hetê ziwani, uslûb û mewzu ra umîşê nuştîşê usulê mewlîdî beno, terzê tewiranê edebîyatê dînî û tesefuwî de yew nimûneyo rind û xurt o. Xasîyî, mewlîdê xo serra 1900î de 400 nusha dayî çapkerdiş. Mewlîd pîyor pîya 26 rîpelî yo û hetê edebî û senet ra zixm o. Seba inay, mewlîd yew vatişo tîtikin ra durî mendo. Xasî, mewlîdê xo meqsedêko edebî ra wet bi meqsedê xizmetkerdişê Zazakî û seba îsbatkerdişê tezê ‘zazakî zî zey ziwananê bînan ziwane edebîyatî yo’ ameyo nuştîş (Anter, 2013: 184-185).

Xasî, bi tedsîsê medrese ders girewto û literatürê dînî zaf weş zano. Inî semedî ra mewlîdê ey de kelîme û îzafeyî erebkî zaf î. Bê inî kelîmeyan îzafeyanê dînîyan mewlîdê ey seraser zazakî nusîyayo. Mewlîd de seba motîşê hunermendîya Xasî hunerî edebîyî est î; labelê mewlîd seba famberî zî bi yew ziwane şenikî, zelal û tesîrinî nusîyayo. Mewlîdê Xasî şeklê nazim ê Qesîde de bi weznê ‘fâilâtün / fâilâtün / fâilün’ nusîyayo. Mewlîd hetêk ra xisûsiyetê ê 11in de aseno. Mewlîdê Xasî 366 beytî yo û mewlîdî de 14 qisimî esilî û di qisimî zîyadeyî est î. Inî wîrdî qisiman ra yew qisim de nuştîx bi hesabê ebcedî tarîxê nuştîşê mewlîdî xo nişan dayo, o qisimo bîn zî teqrîzê Umer Fethullahê Hesbî yo û mewlîd 366 beytî yo. Eserî de her qisim bi yew sernuşteyê neweyî dest pêkeno û bi beyta taslîye ‘Wâzenî ger mâ xelaşîyâ temâm / Vâtişî mâ eş-şelâtu wes-selâm’ qedîyeno.

## 2. Mewlîdê Ehmedê Xasî de Nûrê Muhemmedî

### 2.1. Mewlîd de Kelîmeya Nûrî

Ehmedî Xasî zî sey aliman û şairanê bînan mewlîdê xo de qîmet dayo behsê nûrê Muhemmedî. Mewlîdî de kelîmeya nûrî ha raştta raşt Hz. Muhemmedî sera ha zî menayanê bînan de 26 beytan de 31 dorî şuxulîyaya. 14 qisimanê mewlîdê Xasî de heşt qisiman de ha zaf ha tay behsê nûrê Muhemmedî

est o. Inî qisiman ra sernuşteyê qisimê şeşin û newinî de kelîmeya nûrî zî ca gena:

“Enû mebhêsî xelqî Âdemîyû *nûrî* Peyğemberîyû kewtî pâştey yî”

“Enû mebhêsî întîqâlî *nûrî* peygamberî yû û hewnânî Âmînâ wu”

Kelîmeya nûrî verê cû qisimê dîyinî de di beyîtan de şuxulîyaya. Dima qisimê çarinî de şeş dorî, qisimê şeşinî de pa sernuşteyî 12 dorî, qisimê hewtinî de hîrê dorî, qisimê heştinî de di dorî, qisimê newinî de pawa sernuşteyî çar dorî, qisimê desin û diwêsinî de dorêk vîyarena. Kelîmeya nûrî, inî 31 cayan de inî menayanê cêrênan sera şuxulîyaya:

Nûr, beyîtanê 40, 99 û 246. de manaya xo ya esil de vîyareno. Nûr, beyîta 84. de manayê nûrê Ellahî de vîyareno. Nûr, sernuşteyê qisimê şeşinî de, beyîtanê 152, 154, 157, 161, 180 û 189. de manayanê nûrê pêxemberî û o nûro ke çareyê pêxemberan de sulb bi sulb geyreno de şuxulîyayo.

Nûr des beyîtanê cêrênan de ya bi îzafeyê nameyan yan zî wesifanê pêxemberî ma sera vîyareno. Beyîtanê 41, 88 û 99. de ‘Nûrê Ehmedî’, beyta 97. de ‘nûrê serwerî’, beyîta 145. de ‘Nûrê Muhammedî’, beyîta 149. de ‘Nûrî şâhî cînn û îns’, beyîta 164. de ‘Nûrê Mustafayî’, beyîta 169. de ‘Nûrê Fexrî ‘alem’, sernuşteyê qisimê newinî de ‘nûrê pêxemberî’, beyîta 286. de ‘Nûr’ul enâm’ vîyareno. Kelîmeya Nûrî, beyîtanê 105, 166, 191, 219, 220 û 222. de hewt dorî nûrê Muhammedî îşaret kena. Nûr, beyîtanê 161, 162 û 163. de çar xelîfeyan sera îzafê bîyo.

## 2.2. Qisimê Dîyin û Çarinî de Mefhumê Nûrî

Mewlîdê Ehmedê Xasî de ê beyîti ke kelîmeya nûrî tede vîyerena ma ê beyîti bi humarê xuyî ê metnê Mewlîdî cêr de usulê tehlîl û îzahkerdiş sera ardî verê çiman.

41- مَجْلِسًا مَوْلُودًا بَيْنُو وَنَدِش تَدَه / كُو بَبُو عَزَقِي أَي دِ نُورِ أَحْمَدَه

Meclîsâ mewlud bîyu wendiş tede / Ku bibu **ğerq** ay di nûrî Eħmede

Kelîmeya nûrî, kokê ‘newr’ ra virazîyaya. Ina kelîme, ferhengan de manaya ‘roşn û çilayine’ de vîyareno. O çîyo ke eşkera yo û mahîyê erminan û meseleyan ano werte û keno roşn ey ra zî vanî ‘nûr’... Qur’ano Kerîmî de nameyê sureya 24in ‘Nûr’ a; çunkî ina sure pê ayetê “Allah, nûrê ezmanan û erdî yo.” Dest pêkena. Nameyê ‘nûr’ rîwayetê esmau’l-husnâ de ca gureto (Topaloğlu, 2007: 243). ‘Homayî rî, pêxemberî rî, o nûro kî ma şîrawito ey rî bawerî bîyarên!’ (Çolig, 2014: Teğabun 64/8, Nîsâ 4/174). Ina beyîte de nûrê Ehmedî, pêxemberê ma Hz. Muhammedî sera yew wesif o. Ino behis, zaf mewlîdan de vîyareno.

84 - بَعْدَ جُو بِي پَادِشَاهِ سَرْمَدِي / هَنُكِي نُورِ خُو كِرَوْتِ قِي أَحْمَدِي -

Be‘dî cu yî Padîşahî Sermedî / Henkî nûrî xu girewt qey Eħmedî

85- فَا بَبَه أَحْمَدُ هَمَّا شَاهِ وَدُوذُ / شَكْلِ طَيْرِ أ طَاوْسَه أَمَه وَجُوذُ

Va: “Bibe Eħmed!” hema Şahî Wedûd / Şeklî teyra tawuse ame wucud

Goreyê rîwayetan Homayî, viraştîşê dara yeqînî ra dima, nûrê xo ra yew parçe girewto û o nûr ra şeklê teyra tawusî ra ruhê pêxemberî ma viraşto. Teyra tawus, rindî ser yew mocnak û temsîl a (Özmen, 2020: 181). Raşt a, derheqê ‘ruhê pêxemberî ma Muhammedî senî yew şekil sera virazîyayo’ di destê ma de yew melumat çin o. Labelê mewzuyê nûrî ser ayetan, hedîsan û rîwayetan de melumatî est î.

Tikê sofîyî vanî: Homayî verê cû nûrê Muhammedî (sas) viraşto û dima nûrê ey ra heme mexluqatî viraştê. Inî cîhetî ra nûrê Muhammedî (sas), ‘nameyê esteyan ra çi est o, eslê xulqkerdişê her çî yo’ û

‘yêmê (bingeh) paynika esteyan o.’ (İbrahîm Hakki, 2003:15). Ina paynike, paynika ‘lâ taayyun / werte de çîyêk zî çin o’ dima wext taayyun vecîyayo a paynike bi nameyê ‘taayyun-î ewwel’ name kerdo. İnan wayîrê ina derenca bi wesifê ‘însano kâmil’, ‘heqîqetê însanîyyê û heqîqetê âdemîyye’ wesifnabî (Demîrcî, 1983: 239-258). Qur’ano Kerîm û Sunneto Senîyye de fikrê ‘nûr-i Muhemmedî’ ser yew paştgîrîya zixm est a. Zafê sofîyan bi ina ayeta cêrîne fikrê nûrê Muhemmedî (sas) rê yew yêm virašta:

“Homayî, wextêk pêxemberan ra ino xisus dî soz guretbi: “Sond bo, mi kîtab u hîkmet dabi şîma, dima şîma rî pêxemberêk bîyo o çîyo kî ho cayê şîma do wi ey tesdîq keno: Muheqeq şîma ey rî bawerî bîyarên u muheqeq şîma ey rî ardim bikerên. (Homayî) va: ‘Şîma ina îqrar kerdo, inay dima şîma ehdê mi qeub kerdo?’ İnan zî vatbi ‘Ma îqrar kerdo! (Homayî zî) va: ‘Hînî şahadî bikerên u ez zî pîya şîma şahîdan ra wo.” (Çolîg, 2014: ‘Al-î İmran 3/81).

İna dehkera de, sofîyan vato, soz guretişê Homayî ê pêxemberan ramocneno ke nûrê Hz. Muhemmedî (sas) hemîn ra ver teqdîr bîyo. İnî fikirî ra sofîyan ina mana veta ke, nûrê nubuweta Muhemmedî, dorê nûrê pêxemberanê bînan gureta (Güler, 2006: 63-72). Reyna sofî vanî ina ayetê “Bîşek şîma rî Homayî ra yo nûr u kîtabêko zaf zelal ameyo.” (Çolîg, 2014: Maîde 5/15) de nûr ra meqsed, Hz. Muhemmed (sas) o û îslam pê ey eşkera û vila bîyo (İdîz, 2014: 179-200).

“Allah, paştê benîademî ra sulbê înan guret. Êyî qey (nefsê) înan şahad depişto u vato ‘Ez, Rebbê şîma nîya?’ İnan zî hina cewab dabi: ‘Erê ma şahad î.’” (Çolîg, 2014: ‘Eraf 7/172).

Tusterî ina ayet, fikrê ‘Nûr-i Muhemmedî’ ser yew deyanax û delîl hesabeno û vano:

“Zurîyet hîrê yo. Zurîyeto yewin Hz. Muhemmed o. Çunkî Homayî, wexto ke waşto Muhemmedî xelq bikero nûrê xo ra yew nûr eşkera kerdo. O nûr wexto ke reseno perdeyê ‘ezametî Homayî rê hewêk secde keno û Homa, secdeyê ey ra yew estuna girde virazeno. Zereyê û teberê ina estune zey camî bî, aye de ‘eslê Muhemmed est bî...’” (İdîz, 2014: 179-200).

88- وَفَتْ نُورَ أَحْمَدَىٰ أَنِيًّا تَرَا / بِي حِسَابِ بِي كَرْدُ حَيَا رَبِّ خُورَا

Weqtu nûrî Ehmedî anya tera / Bî hîsâb yî kerd heya Rebbî xu ra

89- أَرَقَّكَ دَا هَمَّا شَشْنَ چَلْكَ بِي / كَوْتِي وَأَزْ چَارْ بِي تَرَا چَارْ يَارِ بِي

Areqîke da hema şeş çilki yî / Kewtî war çar bî tera çar yarî yî

90- يُو تَرَا زِي بِي كُلِّ بُوئِ تَمَّ بِيئِي / بِيئِرَا يُو زِي بَرْنَجْ مَا وَئِي

Yew tera zî bî gulî buy tim yenî / Yîne ra yew zî birincü ma wenî

Muhemmed lacê Selâme el-Misrî (el-Kudâî) kitabê xoyî *Dekâik-ül-ahbâr u Hadâik-ül-î'îbar* de nûrê û areqê Pêxemberî ma ser inî çîyan vano: “İta de ‘eyne û cam sembolî yî. Wexto ke Homayî ‘eyne ard û ewnîya nûrê Ehmedî ra; nûrê Ehmed Muhemmed aleyhî selam zî ewnîyeno Rabbê xo ra; labelê çî wext ino nûr temaşeyê Rabbê xo keno duştê piltîya, rindîya û qudretê Rabbê xo de kemasiya xo û ‘ecizîya xo vînenê û şermayeno, heya keno. Ino heyakerdiş ra nûr şeş çilki areqî dano û areqê ey kuweno war. Dima ino areqî ra nûrê çar yarî (sînayeyî) ê Hz. Ebubekîr, ‘Umer, ‘Usman û ‘Elî virazîyenî.” (Yardim, 2002: 309-310). Yew çilkê areqî zî bena gul... Tesawuf de gul, temsilkarê Pêxemberê ma ya, hem zî qey heskerdişê aşiqan yew sembol a; inay ra gul, tim a boya weşe dana ke, a boya xo Muhemmed aleyhî selamî ra gêna (Yardim, 2002: 309-310). Yew çilka areqî zî bena birincî û ma ê birincî wenî... Yew hedîsî de ameyo vatiş: “Ez yew cewhero latîf bîya. Dormaleyê ‘erşî de geyrayêne. Ellahu Te’ala nazar kerd mi. Ez şermayeya û ariqîyaya. Mî ra hewt çilki areqî kewtî. Ellahu Te’ala çilka yewine ra Ebubekîr, çilka diyine ra ‘Umer, çilka hîrêyine ra ‘Usman, çilka çarine ra ‘Elî viraştî. Çilka pancine ra gul, çilka şeşine ra birincî, çilka hewtine ra koyî viraştî.” (Sari: 2016: 55).

Tikê sofîyî her çî ra ver viraştişê nûrê Muhammedî ser inî hedîsanê cêrênan delîl anî:

“Homayî, verê cû nûrê mi virašto. Âdem, hema bêteyê awe û herrî de bi ez bîyo pêxember.”, “Eke ti çin bî mi, felekî (alemî) nêviraştene!”, “Ez xulqkerdiş de verênê nebîyan a û hetê şirawitişê pêxemberî ra peynîya nebîyan o.” (Îdîz, 2014: 179-200), “Ya Cabîr! Ellaho Berz, erminan ra ver nûrê xo ra nûrê pêxemberê tu virašto.” (Îdîz, 2014: 179-200; Akman, 2011: 107-131).

Tikê merdimi zî, ê rîwayetî ke tesawurê nûrê Muhammedî sera ameyî rîwayetkerdiş înan qebul nêkenî û vanî inî rîwayetî hinayinî exleb hedîsî qilompane yî.

**90-** بَعْدَ جُو نُورِ حَبِيبِ أَحْمَدِي / سَجْدَه بَرْدُ پَانَجِ رَأْيِ بَقِيْبِي سَرْمَدِي

Be‘dî cu nûrî hebîbî Ehmedî / Secde berd panc ray bi qeybî Sermedî

**91-** يُو سَبَبِ رَأْيِ مَا رَى پَانَجِ فَرْطِي تَمَامٍ / وَاجِبِ تِمَّ مَا نِمَاجِ كَرْهَزِ مُودَامٍ

Yu sebeb ra ma rî panc ferzî tamam / Wâcîb tim ma nimac ker her mudam

Çilkdayîşê areqê Muhammedî ra û viraştişê ê çîyî ke beyîtanê verênan de vîyartibî înan dima nûrê Muhammedî aleyhî selam panc dorî qey Homayo ke Sermed o, şino secde.

**93-** بَعْدَ جُو دُوَيْسِنِ حَجَابِ نَادِرِي / أَرْدِي نَائِي رُوِي خُدَائِي قَادِرِي

Be‘dî cu duyves hîcâbî nâdirî / Ardî nay ruyî Xudayî Qâdirî

**94-** نَامِي پَرْدَانِ بَخُو يُو مَرَحَمَتٍ / يُو كَرَامَتِ يُو زِي مَنَّتِ مَنَزِلَتِ

Nameyî perdan bi xu yew merhamet / Yew keramet yew zî mînnet menzîlet

**95-** يُو نُبُوْتِ يُو زِي طَاعَتِ نَامِه بِي / يُو سَعَادَتِ يُو زِي رَفْعَتِ يَا أَبِي

Yew nubuwwet yew zî tâ‘et name bî / Yew se‘âdet yew zî rîf‘et ya ebî

**96-** يُو هِدَايَتِ يُو زِي تَعْظِيمِ دَسِ تَمَامٍ / يُو شَفَاعَتِ يُو زِي قُدْرَتِ وَالسَّلَامِ

Yew hîdayet yew zî te‘zîm des temâm / Yew şefa‘et yew zî qudret wes-selâm

Nûrê Muhammedî rê secdeberdiş ra dima Homayo Qadîr diwês hîcaban (perde) ano roneno. Inî hîcâbî endêk rind, rumet û ercaye yê ke sey înan hîcâbî zaf nînî zanayîş. Îta de, kelîmeya hîcâb (perde) manaya mecaz de şuxulîyaya. Her perde, yew mertebeyê yo. Inî mertebeyî sirat’ul musteqîm (rayiro raşt) de pêxemberan rê paynikî yî. Her perdeyî dima yew sîrr, yew mana est a; yew perde, beno reseno perdeyêkê bînî. Behsê inî mertebeyan, mewlîdê ‘*Cedîd-i Şâh-i Risâlet*’î de zî vîyareno. Nuştoxê inê mewlîdî Paşalîzâde Abdulkadîr Hilmî yo. Wî beyîtanê 28. û 56. ê mewlîdê xo de hedîsê “Lewlâke lemâ xeletu’l-eflâke” rê telmîh keno û viraştişê nûrê Muhammedî ra behs keno. Vano ‘Ino nûr diwês perdeyan zey “kudret, azamet, mînnet, rehmet, sa‘âdet, kerâmet, menzîlet, hîdâyet, nubuwvet, rîfk, nûr, şefa‘at” de pê hezar serran Homayî rê tesbîh kerdo (Özkat, 2014: 135-176). Ronayîşê inî perdeyan dima, nûrê hebîbê û rayberê Muhammedî her yew perde de hezar serrî maneno. Perde de monayîş, yew manaya mecaz ser ra ya.

Nûrê pêxemberê ma qasê vatişan inî diwês perdeyan de hezar ser mendo û her yew perde de zîkrê Homayî kerdo. Bi zerrîweşî û pakîya qelbî hina yew zîkir kerdo ke ma bi inî humaran û hesibnayîşanê xo nêşkênî biwesifn û bihesibno; labelê Rebbul ‘Ezîz humar û hesabê inî zîkiran zano. Ameyo vatiş, nûrê Muhammedî (sas) wexto ke inî perdeyan de mendêne hina zîkir kerdêne:

“O (Homa) ke ‘alim o, cahîltî nîzeliqîyena ey, ez ey tesbîh keno. O (Homa) ke Comerd o (dest akerde yo), çimtingî nêzeliqîyena ey, ez ey tesbîh keno.” (Kaya: 2009).

- بَعْدُ ذِكْرُ خَالِقِ عَزْدُ و سَمَا / أَشْتُ يُو نُورُ بَحْرِ عِرْفَانِ هَمَا 99 -

Be‘dî zîkrî Xâliqî ‘erd u semâ / Eştu yu nûr behrî ‘îrfanî hemâ

- بَعْدُ بِي زِي أَشْتِ بَحْرِ نَضْرَةِ / بَعْدُ نَضْرِي أَشْتِ بَحْرِ قُدْرَةِ 100 -

Be‘dî yî zî eştu behrî nezretî / Be‘dî nezrî eştu behrî qudretî

- بَعْدُ جُو أَشْتِ مَرْحَمَتِ بَحْرِ عُمَانِ / وَفْتُ بِي رَازِي تَبْرَ آمَه هَمَانُ 101 -

Be‘dî cu eştu merhemet behrî ‘umân / Weqtu yî ra zî teber ame hemân

- بَاسَنَكِي شَايِي تِ هَنْكِي چَلَكِي كَوْتِ وَاژ / سَه حَزَارُ وِفْسَنَتِ حَزَارُ و زِي دَه چَارُ 102 -

Baskî şayî tî henkî çilkî kewtî war / Se hezar u vist hezaru zîde çar

- وَفْتُ بِي چَلَكِي كُو بِي رَا بِي بَرِي / هَزْ كُو يُو بِي رُو حِ يُو بِيغَمَبَرِي 103 -

Weqtu yî çilkî ku yî ra bî berî / Hergu yew bî ruhî yew peygemberî

“Bi heqîqet, biyê Homayî tu mexluqat û esteyî çin o. Her çî, bi îrade û waştîşê Ey estîya Ey ra bi nûrê Muhemmedî biyo peya û peynî de reyna her çî pê derbê mergî beno vînd û estîya Homayî de heliyeno.” Raşt a, ma biewnî tera ina dehkera de tikê xurafeyî û vateyî bêbinî est î. Eger ma înan zaf meyarê verê çiman ma vînenî ino fikir ayetanê Qur‘anî û hedîsanê Pêxemberî ma ra paşt geno. Homa (c.c), ayetan de vano:

“Her çî helak beno; labelê teyna wechê (zatê Homayî) Ey (maneno).” (Çolîg, 2014: Qesas 28/88).

“Raşt a, ma Homayî ra ameyî u raşt a, ma (peyîna peyîn) resenî Ey.” (Çolîg, 2014: Beqera 2/156).

Hezret-î ‘Elî (r.a) ra rîwayet biya û ey vato:

“Allah, viraştîşê mehluqatî ra şeş sey û vîst û çar hezar serrî verê cû, nûrê Hebibê xo viraştî. Dima diwêş perdeyî viraştî û nûrê Hebibê xo rê emir kerdo ke, wa nûr her yew perde de wextêko derg bimano. O nûr, her yew perde de Homayî rê tesbîh kerdêne. Çi wext nûrê Seyîdê ma vindertîşê inî paynîkan de wezîfeyê xo qedîna, Homayî ey rê emîr kerd ke wa nûr diwêş behran de asnaw bikero. Pê îznê Homayê Xaffarî, nûr inî behran de kewt mîyanê cewheranê me‘rifet û tera zaf îstîfade kerdo. Nûr, her behr (dengiz) de qasê waştîşê Homayî (yew wext) tesbîh kerdêne. Çi wext nûrê seyîdê ma Muhemmedî inî heme mertebeyan de kesb kerd dima Homayî emir kerd ey wa inî dengizan ra se û vîst û çar hezar çilkan bigîro. Ey zî guret. Ha resulan ra ha nebîyan ra çendêk pêxember est o, inî çilkan ra virazîyayê.” (el-Cezûlî, 2018: 119).

Reyna ina mana ser şaîr vano:

“Seyîdê mi, ti dengizê nûrê bahâ yê / Enbîya nesilyayîşê feyzê tu yê

Ti yêmê her holî û îhsanî yê / Wayirê teqwa bi wesîlayê tu resayî meramê xo” (el-Cezûlî, 2018: 119).

- بَاسَنَكِي شَايِي تِي اَنْجِي چَلَكِي بِي قِيَّاسِ / كَوْتِي وَاژ بِي اُمَّتِي بِي عَامِ و خَاصِ 104 -

Baskî şayî tî ancî çilkî bî qîyas / Kewtî war bî ummetey yî ‘am u xas



خَالِقِي يَوْمَ جَوْهَرَه بِي نُورِي رَا / كَرْدَه بِنْدَا بَعْدَ جُو أَنبَا تَرَا 105-

Xalîkî yew cewhere yî nûrî ra / Kerde peyda be‘dî cu anya tera

بِي دَفَلَقِي تَاقِلِي أَيُّ يَوْمِ هَوِي / بِي بَهَيْبَتَا دَا نَظَرُ نَيْمِي يَوْمِي 106-

Bî di felqey tavilî ay yew hewî / Yî bi heybet da nezer nîmey yewî

تَاقِلِي خَلْبَا بِي بَحْرُ كُو عَمَانُ / هَيْبَتَا نَرَا دُو وَ كَفُ دَا بِي هَمَانُ 107-

Tavilî helaya bî behrîkew ‘uman / Heybeta tera du u kef dayî heman

كَفُ بِي عَزْدُو عَوْلِي بِي مَكَّه رَا / يُوسَبُّ رَا مَكَّه بِي أُمِّ الْقُرَى 108-

Kef bî ‘erdu ‘ewwulî yî Mekke ra / Yu sebab ra Mekke bî ummul qura

دُو زِي عَزْمَانُ تَرَا أَمِي وَجُودُ / لَا حَقِيقَتَا أَنجِي زَانُ يُوسَدُودُ 109-

Du zî ‘ezmanî tera amey wucûd / La heqîqet ancî zanu yu Wedûd

نِصْفُ بَيْنَرَا زِي فِرَاشَتِي دَا جَدِيدُ / لَوْحُ وَ كُرْسِيُّ وَ قَلَمُ عَرْشُنُ مَجِيدُ 110-

Nişfu bîn ra zî viraştîş da cedîd / Lewh u kursîyy u qelem ‘erşu mecîd

Dima Rebb’ul ‘alemîn reyna ê çilkê ke Muhemmed aleyhî selamî ra ameybî war, ha merdimo xas ha merdimo ‘amm ra çendêk ummetê Muhemmedî est ê, nûrê ê çilkan ra xelq bîyî. Reyna Homayî, nûrê Hebîbê xo ra yew cewhero beriqîyaye viraşt. Dima ino cewher qelişnayo û kerdo di felqeyî. Yew dor bi nezarê heybet yew dor zî bi nezarê şifqet ewnîyayo tera. O felqeyo ke bi nezarê heybet ewnîya tera ey ra awî, royî û dengizî viraştî. Reyna ewnayîşo heybetê Homayî ra awe û dengizan hema du û kef da. Seba ino ewnayîşê heybetî ra, dengizan û behran de yew îstîqrar est o.

### 2.3. Qisimê Şeşînî de Mefhumê Nûrî

Qisimê şeşînî de, 40 beyîtî est î. Xasî, îta de ‘viraştîşê Hz. Âdemî ra, kewtîşê nûrê Muhemmedî (sas) paştê ey ra behs keno. O nûro ke ho paştê Hz. Âdemî de yo o nûrê Pêxemberê ma yo. Ino nûr yew sîlsîleya pak ra vîyarto ameyo resayo Hz. Âmîna û çareyê aye de beriqîyayo.

بَعْدَ جُو هُرَّ جِي مَلَكُ بِيْرُو تَمَامُ / سَجْدَه بَرْدِي أَدَمِ رِي خَاصُ وَ عَامُ 143-

Be‘dî cu her çî melek pîru tamam / Secde berdî Âdemî rî xaş u ‘am

تَاقِلِي نُورِ مُحَمَّدُ خَاتَمِي / بِي مُجَلِّي يُوسَدُ پَاشَتِي أَدَمِي 144-

Tavilî nûrî Muhemmed Xatemî / Bî mucella yu di paştêy Âdemî

Hiz. Cabîr, vano: “Ey Resulellah! Wa dadiya mi û babîyê mi to rê feda bibê, çîyo ke Homayî her çî ra verê cû viraşt o çita yo ti mi ra vanî?” Pêxemberê Homayî hina cewab da:

“Ey Cabîr! Çîyo ke Ellahî her çî ra verê cû viraşt, (o) nûrê ino pêxemberê tu yo. O nûr, bi qudretê Ellahî, yi ça biwaştêne uca de geyrayêne. O wext hema çîyêk çin bî. Ne lewh, ne qelem, ne cenet, ne adir est bî. Ne melek, ne ezman, ne erd, ne tîje, ne aşme, ne cînî û ne zî însan est bî. Wexto ke Ellahî, waşt mehluqat bivirazo, ino nûr kerd çar felqeyî. Felqeyo yewinî ra qelem, felqeyê diyinî ra Lewh-î Mehfuş, felqeyê hîrêyinî ra erş viraşt. Felqeyo çarin zî (mîyanê xo de) kerd çar felqeyî:

Felqeyo yewinî ra Hameleyê Erşî, felqeyê diyinî ra Kursî, felqeyê hîrêyinî ra melekê bînî viraştî.

Felqeyo çarin reyna (mîyanê xo de) kerd çar felqeyî:

Felqeyo yewinî ra ezmanî, felqeyê dîyinî ra erdî, felqeyê hîrêyinî ra cenet û cehenem viraşt. Dima felqeyo çarin hewna (mîyanê xo de) kerd çar felqeyî:

Felqeyê yewinî ra nûrê bawerîya heme bawermendan, felqeyê dîyinî ra nûrê qelban, felqeyê hîrêyinî ra nûrê ‘La îlahe îllAllah Muhammedu’r-resulullah’ viraşt.” (el-Cezûlî, 2018: 119).

Resulullah (sas) hedîsêka Qudsî de hina vano:

“Ellah vatbi: Mi ti nûrê xo ra, zobîna her çî zî nûrê to ra viraşt.” (el-Cezûlî, 2018: 119).

Zey ina rîwayet û zobîna çimeyan ra yena famkerdiş, heqîqetê Muhemmedîyye ya zî Nûrê Muhemmedî yew esteyo manewî, yew heqîqet ya zî yew cewher o. Inî çîyî, seba şexsiyetê Muhemmedî ya manewî benî mîsalî. Goreyê inî melumatan Muhemmed aleyhî selam, Hz. Âdemî ra verê cû xelq bîyo û wi qatê Homayî de şexsêko tewr qîmetin û erjaye yo. Zobîna mexluqatî, nûrî û pêxemberî seba îzahkerdiş û daşinasnayîşê ina heqîqete virazîyayî. Goreyê zafê aliman inî rîwayetî hinayinî sahil nîyê. Çunkî seserra hîcrî yewin û dîyinî de fikrê nûrê Muhemmedî çin bî. Ino fikir, seserra hîrêyine de vecîyayo werte. Inî alimî, vanî vateyo sehîh oyo ke her çî ra ver qelem virazîyaya (Yazir, 1995: 8/255).

وَقَدْ بَرَسَا خَالِقَ رَا كُونُ وَا حَالُ / فَا اَنُو جَعَمْتُ جِيُو يَا دَا الْجَلَالُ -148

Weqtu persa Xâliqî ra kewn u hal / Va enu hîkmet çîyû ya zel-Celâl

خَالِقِ فَا نُورِ شَاهِ چِنُ وَا اِنْسُ / هَاوُ دِ پَانَشَتِي نُورِ دَهْ يُو اَيِرُو جَلِيلِسْ -149

Xâliqî va nûrî **şahî** cînn u îns / Haw di paştêy ta de ya eyra celîs

Yeno vatiş, viraştîşê şeklê Hz. Âdemî û pifkerdişê cesedê ey ruhê Homayî ra ver Cebraîl, nûrê Muhemmedî aleyhî selam girewto. Bi ê nûrî ezmanan, ‘erdan û dengizan de geyrayo. Ey heme mehluqat bi şerefdarîya Muhemmedî pê hesnayo. Dima Homayî, ey rê emir kerdo ke wa o nûr ra bikerên mîyanê çemurê Hz. Âdemî. Ê zî bi emrê Homayî xo ê nûrî ra kerdo mîyanê çamurî. Âdem, yew wexto derg hina maneno. Badê uca Homa, ey şeklê leşa însanî şekil dano Âdemî û ino nûr runîyeno sulbê Âdemî (Abdîrrahman, 1995: 119).

Meleketî, ey dima saf depişenî. Hz. Âdem, xo dima saf girewtîşê meleketan rê ecêb maneno. Wexto ke hîkmetê ino halî ra pers keno, museno ke, nûrê şahê însanan û cînan ho paştê ey de yo. Hz. Âdem zî wazeno wa Homa nûrê Muhemmed paştê ey ra bigîro û bierzo çareyê ey. Eger hina bibo ino nûr tima-tim vernîya ey de beno. Ino waştîşê ey ra dima nûr, paştê ey ra neqil beno werteyê çareyê ey. Badê cû, Âdem Rabbê xo ra wazeno ke ê nûrî bierzo yewna wasleyê ey û wa o inî nûrî pê çimanê xo bivîno. Nûr, yeno gişta ey de nîyeno ro. Hz. Âdem heta cenet de bi o nûr, her tim sawitêne çimanê xo ra (Abdîrrahman, 1995: 119).

يُو سَبَبُ رَا كَشِنَا رَا شِنْتَهْ اَفْضَالًا / زِي چِيَهْ اَيِ اَهْلِي حُبُّ وَا مُبْتَلَا -155

Yu sebeb ra gişta raşte efzel a / Zey çepê ey ehli hubb u muhtela

لُومَا وَقْتُ نَنْكُوي خُو فَسْنَنِي / دَسْتُ رَا شِنْدَهْ عَوْلِي دَسْتُ پِي كَنِي -156

Luma weqtu nenguyî xu qesnenî / Destu raşt de ‘ewwîlî destpî kenî

دَسْتُ رَا شِنْتُ رَا زِي كُو كَشِنَا نُورُ نَدَهْ / بَعْدُ جُو هِيرِ هَمَهْ يَا كَشِنْتَهْ دَهْ -157

Destu raşt ra zî ku gişta nûr tede / Be‘dî cu hîrî hemey ya gişte de

Vanî, waştîşê Âdemî dima nûrê Muhemmedî aleyhî selam ameyo kewto gişta eya eşhed ser o. Belka ino sebeb ra zî gişta raşte, gişta çepe ra efdal yena zanayîş. Ina efdalî zaf cayan de xo mocnena ra; labelê qesnayîşê nenguyan de verê cû gişta raşte ra dest pêkerdiş sunet o. Goreyê İmam-i Nevevî qesnayîşê nenguyan de destan ra dest pêkerdiş xeyr o. Verê cû gişta eşhed ê destê raştî ra dest pêkênî, dima gişta werte ra heta gişta qije nenguyî tîdima qesiyênî. Dima gişta pile qesiyena. Tewr dima gişta qije ya destê çepî ra dewam kenî (Uca, 2003: 205).

وَقْتُ نُورٍ أَمَّهَ كَشْتَهُ بِي سَكَانٍ / نُورٍ جَارٍ يَارَانُ زِي أَمَى بِي بِيئَانُ 162-

Weqtu yu nûr ame gişte bî sekan / Nûrî çar yaran zî amey yî bînan

نُورٌ صِدِّيقِي دِ رَاشَتِ صِدْقِ دَه / بِي سَكَانٍ فَارُوقِ زِي صِدِّيقِ دَه -163

Nûrî Şiddîqî de raştî şidqî de / Bî sekan Fârûqî zî Şiddîqî de

نُورٌ عُثْمَانُ زِي رَاشَتِ عُمْرِي / بِي عَلِي كَشْتَنَا جَبِي بِيئَمْرِي 164-

Nûrî ‘Usmânî zî raştî ‘Umerî / Yî ‘Elî kişta çepey Peyğemberî

وَقْتُ أَدَمَ جَمَّ كَشْتَنَا شَدَه / آئِي كُو نُورِ مُصْطَفَايِ هَاؤُ تَدَه -165

Weqtu Âdem çim gina gişta şede / Ay ku nûrî Muştefâyî ha w tede

بِي مُفَرَّحٍ فَا بِالْهَامِ رَبِّي / أَلْسَلَامُ هَمَّ عَلَيْنُكُمْ يَا أَبِي -166

Bî mufferreh va bi îlhamê Rebbî / Es-selâmu hem ‘aleykum ya ebî

ذَا جَوَابِ نُورِي قَرَا رَبِّي وَرَى / وَعَلَيْنُكُمْ السَّلَامُ فَا تَرَا -167

Da cewab nûrî vera Rebbî wera / We ‘aleykumu’s-selâmu va tera

Şaîr Xasî, inî beyîtan de zî behsê nûrê Muhemmedî ser vateyanê xo dewam keno. Derheqê nûrê Muhemmedî de Bedîuzzaman hina vano:

“İno halê Resulullahî -viraştîşê nûrê ey- bi eqil nê, bi nûrê îmanî yeno famkerdiş û vînayîş. Seyîdê ma bezreyê inaî alemî yo. Eynî wext de fêkiyo tewr rind o. İlmê îlahî de heyat bi nûrê ey dest pêkerdo, bi wucudê ey o rumetîni însaniyetî resayo kamilî. Ino gure qey Ellahî, asan û (şenik) o. Keso ke, îkramêko rind verê cû dano dostê xo. Homayo pîl waşto cemal û kemal, qudret û pîltîya xo ramocno. Ino semed ra heme alemî esteyan û însan viraşto. Aha Homayî, bi nûrê hebîbê xo yê Muhemmedî dest pêkerdo ino tecellîyo muazzam.” (Nûrsî, 2003: 514-540).

İbn Hacer el-Heytemî vano: “Heme Pêxemberî roşniya xo Hz. Muhemmedî aleyhî selam ra gênî; çunkî wi sultanê înan hemîn o, wi reisê înano tewr şerefin o ke wi wesifnayîşî heq keno û îmamo tewr berz ê înan o.” (Selvî, 2007). Xasî inî beyîtan de bînatyê nûr û çar xelifeyan de yew tîkîlî virazeno. Goreyê Xasî, çî wext nûrê Muhemmedî yeno reseno giştan, kiştê ê nûrî de binî zî şoq danî. Inî nûrî, nûrê çar xelifeyan o. İta de, fezîlet, meqam û qîmetê inî çar yaranê rûmetan yeno ramotiş.

#### 2.4. Qisimê Hewtinî de Mefhumê Nûrî

Qisimê hewtinî de Xasî, behsê inî persanê cêrênan keno û geyreno cewabanê înan bido:

Hz. Âdem û Hewa cenet ra çira ameyî vetiş?

İnan qey qebulkerdişê tobeyê xo çita û kam kerdo wesîle?

Nûrê Pêxemberî ma Hz. Âdemî ra senî neqil bîyo kalikanê Pêxemberî ma û heta bawkalê ey ‘Ebdulmuttalîb senî ameyo?’

169- حَضْرَةَ حَوْا نَظَرُ دَا أَدَمِي / فَآ چِه نُورُ فَا پِي فَخْرُ عَالَمِي

Hezretî Hewwa nezer da **Âdemî** / Va çîhi nûru, va ‘Yî Fexrî **‘âlemî**’

170- خَالِقِي هُرْدِي مُزَيِّن كَرْدِي بِي / هَم دِ جَنَّتْ دَه مُخَيَّر كَرْدِي بِي

Xâliqî hurdî muzeyyen kerdî bî / Hem dî Cennet de muxeyyer kerdî bî

Vatişê Xasî ser asena, Hz. Hewa, çareyê Âdemî de nûrê Muhemmedî vînena û ino nûr ra persena. Homayî, Âdem û Hewa zaf rind viraştî û ê wîrdî cenet de muxayer verdayî. Ino xusus ayet de hina vîyeren:

“Ma va ya Âdem! Ti u cînîya xu pîya cennet di runişên uca di şima ça ra wazênî zêda zêd biwerên; labelê duştê ina dar ra meşîyerên! (Eger şima şîyerên) şima benî zaliman ra.” (Çolîg, 2014: Beqera 2/35).

180- بَعْدُ عَفْوِي أَدَمِ رَا بِالْبَيِّنِ / أَمَه پَاشَتِي شَيْبِثِ يُو نُورُو قَرِينِ

Be‘dî ‘efwey **Âdemî** ra bîl-yeqîn / Ame paştey **Şîsî** yu nûro verîn

181- شَيْبِثِ زَا زِي أَمَه لَآجِ پِي هَمَا / نِشَكْنَا هَنْدِي بِمَارِ قِي شَيْمَا

**Şîsî** ra zî ame lacî yî hema / Nişkena hendî bimarî qey şima

182- چُونَكِي حَتِّي بِيئُو عَدْنَانَ رَسُو / كُو بِيئُو نَزْدِ سَه نَامِي پِي رَسُو

**Çunkî** hetta bîru ‘Ednânî risu / Ku bibu nîzdî se namî pîrîsu

184- لَّا بَلِي عَدْنَانَ رَا پِي پِي هَمَا / قِيسَتُ بِي پِي بِي شَكِ فَآجِي شَيْمَا

Labelî ‘Ednânî ra pey yî hema / Vîstu yew pî bîşekî vacî şima

185- عَوْلِي عَدْنَانَ و مَعْدُو و هَم نِزَارُو / يُو مُصَرُّ بِي يُو زِي أَلْيَاسِ نَامِدَارُو

‘Ewwulî ‘Ednân u Me‘d u hem Nîzâr/ Yew Muzer bî yew zî **Îlyâs** namedar

186- مُدْرِكُهُ يُو يُو خُرَيْمَهُ يُو كَنَانَ / نَضْرُو وَمَالِكُ فَهْرُو و غَالِبُ زِي هَمَانَ

Mudrîke yew, yew Xuzeyme yew Kenân / Nezr u Mâlik, Fehr u **Gâlib** zî hemân

187- هَم لُوئِي هَم كَعْبُو و مُرَّهُ هَم كِلَابُ / هَم قَصَصِي زِي هَوْتُ و دَسَ أَمِي حِسَابُ

Hem Lu‘ey hem Ke‘b u Murre hem Kîlâb/Hem Quşey zî hewt u des amey hîsab

188- يُو زِي يُو عَبْدُ الْمَنَافِ مُرْتَعِبُ / يُو زِي هَاشِمِ يُو زِي عَبْدُ الْمُطَلِّبِ

Yew zî yu ‘Ebdulmenâfu murte‘îb / Yew zî Hâşîm yew zî ‘Ebdulmuttelib

189- شَيْبِثِ رَا حَتِّي تَيَا نُورُ بِي نِهَانَ / فُجَاءَةُ پِي پِي دَه بِي ظَاهِرُ هَمَانَ

**Şîsî** ra hetta tîya nûr bî nîhan / Fuc‘eten pî yî de bî zâhîr heman

Wexto ke Hz. Âdem şirawîya ina dinya û Homayî tewbeyê ey qebl kerd, dima nûrê Muhemmedî ke çareyê ey de bî. O nûr uca ra şî kewt paştê Hz. Şîsî. Wexto ke Şîs, kewt hemlê dadîya Hz. Hewa

o nûro ke çareyê aye de bî welidiyayîşê Şîsî de vîyartîbî çareyê ey. O nûrê Muhammedî yo ke çareyê Şîsî de beriqîyayênî o nûr hewilîya cînîya ey; uca ra şî çareyê lacê ey Enuşî, dima kewt çareyê lacê Enuşî Kaynanî. Bi seserran ino nûr, çareyan ra vîyart şî çareyanê bînan û vindert. Ino nûr, peynîye de ‘Ebdulmuttâlîbî ra şî resa ‘Ebdullahî û ey ra zî kewt çareyê Muhammedî aleyhî selam û wayirê xo esil de qerar kerd (Köksal, 2011: 67-68).

Qisimê heştinî de behsê vîyartişê nûrê Muhammedî ê babîyê ey ra Hz. Muhammedî est a. Reyna, îta de behs est a ke; tikê duşmenî, çareyê ‘Ebdullahî de nûrê nubuwet vînenî û inay ra ey rê dom nanî ro...

### 2.5. Qisimê Heştinî de Mefhumê Nûrî

Mewlîdê Xasî de biyê ino qisim çend qisiman de nûrê Muhammedî ra behs kerdîbî. O nûr, Hz. Âdemî ra heta Hz. İbrahîmî silsileyânê pakan ra kirişiyayo û vîyarto ameyo resayo çareyê babîyê Pêxemberê ma ‘Ebdullahî.

وَقُتِلَ عَبْدُ اللَّهِ دَهْ نُورٌ بِي ظُهُورٍ / كَافِرَانُ زَانَا كُوْ آمُوْ نَزْدِي نُورٌ -191

Weqtu “Ebdullahî de nûr bî zuhûr / Kâfîran zana ku amew nîzdî nûr

بَعْدُ جُوْ كَيْرَائِي بِقَتْلِي هَمَّا / حَافِظِي بِي خَالِقِي عَزْدُو سَمَّا -192

Be‘dî cu geyray bîqetlî yî hema / Hâfîzî yî Xâlikî ‘erd u sema

تَمَّ فِجِي رَا پَاوْتِي بِي كَافِرَانُ / جَائِكُهُ عَبْدُ اللَّهِ بِكُتْشِي بِي بَرَانُ -193

Tim qicî ra pawutî yî kafîran / Cayke “Ebdullahî bikşî bî biran

Behsê nûrê Muhammed û întiqalê nûr ser zaf kîtaban de behs est o. Mewludê Suleyman Çelebî zî inî eseran ra yo. Çelebî, qey nûrê Muhammedî inî çiyî terzê şîrî de vatî:

Sonra Havvâ alnina nakl ettî bîl / Durdu onda dahî nîce ay u yıl

...

Erdî İbrâhîm’e İsmâîl’e hem / Söz uzar gerî kalanin der îsem

...

İş bu resm île müselsel muttasıl / Tâ olunca Mustafâ’ya muntakil (Yılmaz, 2006: 8).

‘Ebdullah, qicanê ‘Ebdulmuttâlîbî ra mîyanê lacan de laco heştin bî. Hetê ruçik û kurmê xo ra nêmanayêne birayanê xoyanê bînan. O nûro ke çareyê ‘Ebdulmutallîbî de bî, biyayîşê ‘Ebdullahî ra dima yeno kuweno çareyê ‘Ebdullahî. Ino nûr, yew rindîya weşe û şîrinîya bêemsale dabî rîyê ey. Labelê kesî nêzanayêne ina rindî û şîrinî çara ameya (Suruç, 2012: 1-4).

Çi wext wextê ameyîşê inê pêxemberî bibo nîzd û elemetê ey zî bibîyî eşkera ina weşê cuhudan nêşî. İnî sebebî ra înan ra yew qisim çî wext elameta Pêxemberî o nûr, çareyê babîyê Muhammedî aleyhî selamî de dî, ey rê biyî duşmen û kewtî ey dima ke yi bierzêne dom. Xasî inî beyîtan di, babîyê pêxemberî ma ‘Ebdullahî de zuhurê nûrî dima duşmentîya cuhudan ser yew mesele ra behs keno; labelê raştîya ina mesele ser çimeyan de yew melumat çin o.

Weqîdî ra rîwayet bîya, ‘Ino nûr çareyê bawkalê ‘Ebdulmuttâlîbî de tewr zaf beriqîyayênî. Dima çareyê “Ebdullahê Zebîhî de zahîr bî. Çi wext, Rebbê mayo Celîl waşt tîjê zatê Muhammedî wa

‘ezmanê ruhan ra bierzîyo ‘alemê wucudî sînayê nîqahî eşt qelbê “Ebdullahî. Ey dadîya xo ra va:

- Ez wazena şîma mi, wayirê rindî û cemal, zanayîş û fikir yew keyna de bizewecnêni. Wa nesebê aye berz, baxirê aye ezîz bo. Dadîya ey va:

- Sare û çîman ser, ez waştîşê to cade ana ca! Û dest pêkerd cigêrayîşê qebileyanê Qureyşî. Yew keyeyo ke tede wayirê nesep, hesap û rindî, cemal keyna est a nêverda ke tede gêraya (Suruç, 2012: 21).

Şewa zîfafê “Ebdullah û Âmîna de nûrê Muhemmedî çareyê ‘Ebdullahî ra vecîyeno kuweno çareyê Âmîna (Topaloğlu, 1991: 63-64). Tikê çîmeyan de qeyd bîyo ke, Wehb lacê Zuhre hetê ruçik ra rind bi û keynaya ey Âmîna zî yew mewkîya berze de bî. Tikê vanî inî rîwayetî hinayînî badê cû ameyî vatiş ke Xasî zî beyîtanê corênan de wesifanê hinayinan dano û inî rîwayetî seba hurmet û sînayîşî ke qey Hz. Âmîna ameyî pawitiş û vatiş. Labelê, hetê eselet û şerefi ra cayê Qureyşîjan exleb mîyanê qebileyanê ereban de berz bî. Hem zî ‘Ebdulmutalib sermîyan û seyîdê Qureyşîyan bî. Helbet hina yew merdim lacê xo rê keyna biwazo ey rê umîş bena ke yew keyeyo menşur ra xo rê veyve biwazê. Înay ra, yew vaco inî rîwayetî hinayînî eslê yin çin a, efsane yî û bêbin î ina raşt nîya (Topaloğlu, 1991: 63-64).

Nûrê Muhemmedî sebebê viraştîşê her çî yo. Homayî ma her çî ra ver nûrê Pêxemberî ma viraştî. Dergahê Homayî de Muhemmed aleyhî selam hem wayirê dostî hem berzî hem meqama Mehmudî û hem pîlitî yo. Eger ma raşt xelasî wazenî gereka ma Muhemmed aleyhî selam dima şîyerê. Fek û qelbê ma her tim ey rê salat û silom bîyaro û eemelê ma zî umîşê sunetê ey bo.

## 2.6. Qisimê Newinî de Mefhumê Nûrî

Qisimê newinî de behsê ravîyartişê nûrê Muhemmedî babîyê ey Hz. ‘Ebdullahî ra çareyê dadîya ey Hz. Âmîna est o. Reyna verê bîyayîşê bimbarekî de ê hewnê ke Hz. Âmîna dîyî û ê xeberî mîjdanan bi wesîleyê inî hewnan girewtî û hema hemleyê dadîya xo de sêwirmendişê Hz. Muhemmedî ra behs est o.

بَعْدَ جُو نُورِو كُو مَا كَرْدُ تَنَا / آمَه بِي مَيْمَانُ بَقِيْبِ آمَنَا -219

Be‘dî cu nûru ku ma kerdu sena / Ame bî meyman bi qeybî **Âmîna**

وَقْتُ يُو نُورِ آمَنَا دَه بِي ظُهُورِ / آمَنَا زِي دِي عَجَبِ عَزُو سُرُوْر -220

Weqtu yu nûr **Âmîna** de bî zuhûr / **Âmîna** zî dî ‘êceb ‘îzz u surûr

Ma bizanê, her çîyo ke est o, bi nameyê Homayî û qasidê ey Muhemmedî aleyhî selam qîmet gêno. Mexluqat, însanî, pêxemberî û ina ummet heminê înan pê nûrê Muhemmedî qîmet girewto. Înay ser Xasî, vano:

‘Îno nûro ke nuştîşê Mewlîdê mi bi wesîleya ey bîyo û nûro ke ma beyîta verên ra heta îta medh û sena ey kerdo ino nûr, şewa zîfafê ‘Ebdullahî û Âmîna de çareyê Âmîna de beno eşkera. Âmîna zî bi inî nûrî zaf îzzet û şayî, mîjdan û xelatî, şayî û weşî vîna.’

آمَنَا فَا وَقْتُ مِنْ زَانَا كُو نُورِ / آمَه وَ مَيْمَا نَبِيْبِي مِنْ بِي قُتُوْر -222

**Âmîna** va weqtu min zana ku nûr / Ame u meymanîyey min bîfutur

يُو شَوِكْ اَزْ دِ هُوْنِ كُو شِرِيْنِ / مِنْ دِي آمَه مَرْدُمِ كُو اَنْوَرِيْنِ -223

Yew şewike ez di hewnikew şîrîn / Min dî ame merdumikew enwerîn

224- مَرْحَبًا فَيْكَ مُحَمَّدٌ قَا هَمَا / نَامَه مِنْ پَرَسَا وَ قَا اَزْ اَنَمَا -

Merhebâ fike Muhammed va hema / Name min persa u va ez Âdem a

Rîwayet bîyo ke, a şewa ke Âmîna Xatun, bîya nêweş û Pêxemberê ma kewto hemleyê aye erd û ezman ra hina veng dîyeno ci: ‘Nûrê Muhammedî nimitkî emşo pîzeyê Âmîna de ca girewto. Wi qey mîjdandayîş û tersnayîşê însanan vecîyeno werte (û beno wezîfedar).’

Emir dîyena Ridwanî (Wi yew meleket o û wezîfeya ey pawitişê berî cenetî yo.) (Develioğlu, 2012: 1179) rê ke wi qey ameyîşê Muhammedî xelat bido inî kâinatî û ina şewe beranê cenetî abikero.

A şewe, Mekke de çendêk heywanî est î yenî ziwan û yew fek ra vanî:

“Dadiya ey Muhammedî rê bîya nêweş. Ma Rabbê Ka’be rê sond wanenî wi nûrê dinya yo û ê ke hê dinya de yê çilayê înan o.”

Reyna her aşma nêweşîya Âmîna de erd û ezman de hina veng dîyeno û hina vacirîyeno:

“Seba nizdbîyîşê Mustafayê Emînî mîjdan bidên!”

Dadiya seyîdê ma Resullullahî Âmîna vana ke:

“Hemleyê mi ra şeş aşmî vîyartîbî mi xeyb ra vengêk şinawit. Wayirê ê vengî hina vatên: ‘Ya Âmîna! Qey welediyayîşê tutê xo rê hezir bo. Wi emîn (ey rê bawerî bena) o.’” (es-Safûrî, 2016).

Zafê kitabî sîyerî o nûro ke çareyê ‘Ebdullahî de est bi û beriqîyayênî o nûr ra behs kenî. Çi wext, ‘Ebdullah, Âmîna dir zewicîyeno o nûr, şino kuweno çareyê Âmîna. O nûro ke behsê ey kitabane ‘*Delâilü’-n-nubuwwê*’, mewlîdan de û zobîna eseran de bi ‘nûrê Muhammedî’ û ‘nûrê nubuwwet’ tabîr beno, ino nûr kuweno çareyê Âmîna. Reyna çimeyî qeyd kenî ke ê hedîseyî ecaybî ke hemlê Hz. Âmîna ra heta biyayîşê Hz. Muhammedî ameyî meydan înan ra çend hedîseyî bi şahadîya Âmîna benî. Muellîfî verênî inî rîwayetan ser zaf nîvindertî (biwennê; İbn-î Hîşâm, Î, r. 157-158.). Inî rîwayetî hetê cigêrayoxanê neweyan ra tenkîd bîyî û inî cigêrayoxî derheqê inî mewzuyî de hina vanî: ‘Sihetê inî rîwayetan sabît nîyo.’ Yew rîwayeto sehîh est o, ino rîwayet zafê çimeyanê hedîsan de vîyareno. Inî rîwayetî de îfade bîyo ke Hz. Pêxember ‘xatemê nebîyan’ o û dadiya ey derheqê ey de yew hewn vînena... Ehmed b. Hanbel, kitabê xoyo *el-Musned* de hîrê cayan de û Heysemî zî yew ca de ino rîwayet qeyd kerdo; labelê muhtewayê inî hewnî ser o yew îzah çin o. Tikê cigêrayoxî vanî; ‘Muhtewayê inî hewnî ra yew qîsim baco zeliqîyeno inî hedîsî. Ino hewn yew rîwayetê sehîhî ra yew qîsim o; çendêk hetê muhtewa ra zaf zixm nîyo ma bizanê ino yew hewn o; coka ma nêşkenî zaf tenkîd bikerî. Ino behîs, mewlîdê *Vesîletu’-n-necât* de zî est o (Topaloğlu, 1991: 63-64). Dadiya seyîd û serwerê ma Âmîna, wextê nêweşîya de her tim çiyî ecaybî zey ‘keramet û delîl’ dîyêne. Inî hedîseyî zî qedr û qîmetê Muhammedî motêne ra. Wi bi inî nûrî ame dinya.

Keso ke bi nûrê xo alem keno roşn (Suruç, 2012: 55): Vatişê ma qey xelasîya ma ya tamam û timatimî ‘Seyîdê Kâinat Hz. Muhammedî rê hezar salat û selam...’

### 2.7. Qisimê Desinî de Mefhumê Nûrî

246- شى رَبِيعُ الْأَوَّلِ رَا دَسَنَ شَوَى / آمِنَا بى عَرَقَ نُورَى بُو هَوَى -

Şî Rebî‘ul-ewwelî ra des şewî / Âmîna bî ğerqî nûrî yew hewî

247- آمَنَهُ قَا وَفَتْ بى دُوَيْسَ شَوَى / اَزْ تَبَى مَنَدَا دِ خَلُوَه بى بُوَى -

Âmîna va weqtu bî duyyes şewî / Ez tenî mendî di xelwe bî yewî

أئ شوى هم بي دوشنبه بي فئور / من دي چار جيني مري امي حضور -248

Ay şewî hem bî duşenbe bîfutur / Min dî çar cînî mi rî amey huzur

Hîn wextê bîyayîşê Pêxemberî ameybî. Desê aşma Rebîulewel bî. Pêxemberê ma kewtîbî îta ra new aşmî û des rocî verê cû kewtîbî hemleyê dadîya xoya Âmîna. Qey şoqdayîşê ina dinya nûrê Muhemmed aleyhî selam, bîbî nêzdî. Nêzdîbîyayîşê wextê welednayîşê Pêxemberê ma ser a dadîya yi Âmîna vana:

“Reb’ûlewwel ra diwês şewî vîyartîbî. A şewe, şewa dişemeyî bî. Ez yew halo teynayî de teyna bîya. Mi dî, çar cînî mi ra vecîyayî ameyî. İnî cînîyî -silomê Homayî yin sera bo- ‘Hewa, Asiye, Sara û Meryem’ bî. İnan bi a meqama xoya berz û pîlîtiya xo xizmetê mi de bêqusur bî. Mi seba bara (hemleyê) xo qet yew zehmet, giranî û ezîyet nêant. Çi wext ez bibîyêne teyšan; mi diyêne, mi rê yew şerbet ardêne, ino şerbet mendêne awa gule; labelê a awe ne şekerine bî ne tede engemîn est bî. Mi o şerbet werd û canê mi zaf bî rehet. Badê werdişê inî şerbetî mi dî yew teyr amî serê banê mi. A teyre hebîbê mino Emîn bî. Çi wext wi ame ina dinya qom û qebîleya ey her kes hedir bî...”

A dadîya Ezîze wayîrê hina yew şerefi bî, ino şeref ina dinya de tu kesî rê qîsmet nêbîyo. Reyna a cînîya biqîmet wextê bîyîşê/ardişê ina dinya Muhemmedî hina vatîbî:

“Aşma şeşine yê hemleyê mi de şewêk hewnê mi de yewî mi ra va: ‘Ya Âmîna! Bizane ke, ti xeyrinê heme aleman rê bîya hemle. Çi wext ti wi ard ina dinya nameyê ey pawane Muhemmed û wezîyetê xo ra çewî ra behs mekere!’ De vace, wextê welediyayîşî amebî... Vistoreyê mi ‘Ebdulmuttâlîb, şîbî Qabe tewaf bikero. Ez keye de bîya. Nişka ra vengêko pît ame goşanê mi. Tay mendbî ez ters vera bihelîy. Ez çi bivînî! Mirçikêka sipîye vecîya ame cayê mi û bi pelê xo paştîya mi vilêna. A deqa ra nat mi de nameyê ters ra çîyêk nêmend. Mi çime eşt kişta xo: zereyê tasêk de hê şerbet danî mi. Mi tase ra şerbet werd nêwerd nûrêk ez pişta û Muhemmed aleyhî selam ame dinya.” (Suruç, 2012: 29). Bi inî ameyîşî û welediyayîşê tu, ti vanê seke alem yew hew dec û keder ra xelisîya, xem û huzun kerd xo vîra û keyfweş bî. Tarîtî, cade bi nûrê ey bî vila. Kaînat, zereyê yew şayî û kelecânî de qîra (Suruç, 2012: 63):

Merhebâ ey sîrrî Subhân merhebâ / Merhebâ ey ruhî ruhan merhebâ

Merhebâ ey Fexrî ‘arşî merhebâ / Merhebâ nesley Qureyşî merhebâ

Merhebâ ya şahîbe’d-dînî’l-mubîn / Merhebâ ya şadiqe’l-we’dî’l-emîn

Merhebâ ya men sereyte bilherem/ Merhebâ ya men denewte bilqedem

Merhebâ ya qurrete’l ‘eynî’l-wera / Merhebâ ya men nubî’te fî’l-hîra

Merhebâ ya ‘alime’l ‘ilmî’l-ezel / Merhebâ ya Şâfi’en(y) yewme’l-wecel

Merhebâ ey rehmeten lîl’âlemîn / Merhebâ ya şefî’u’l-muznîbîn

Wazenî ger ma xelaşîyyâ temâm / Vatişî ma eş-şalâtu wes-selâm

Safîyye Xâtun zî hina vatîbî: “Wexto ke Muhemmed aleyhî selâm dadîya xo ra bî, her ca yew nûr guret. Binêk bi şî secde, sereyê xoyo bimbarik da wera û bi ziwanêko zelal va “Lâilâhe illallah, innî resulullah / Bêşik Ellah yew o, ey ra ber yewna Homa çin o. Bêşik ez zî Resulê Homayî yo.”

Reyna a şewe, Hz. Âmîna, nûrêk vînena û şoqê inî nûrî de qesran û koşkanê Şamî temaşe kena (Suruç, 2012: 65). Wexto ke Seyîdê inî Kaînatî, şeref da ina dinya, cayê dadîya ey de dadîya ‘Ebdurrahman b. ‘Efw Şîfa Xatun û dadîya ‘Usman b. Ebu’l As Fatima Xatun zî est bî.



Şîfa Xatun ke, wextê weledîyayîşê Muhemmed aleyhî selam de ebatî kerdîbî. A qey ino bîyîşo bimbarik inî temaşayî xo ma rê neqil kerdî:

“Wexto ke Resulullah ame ina dinya, ez uca de bîya. Cade resaya. Vengêk ame goşanê mi: Rehmê Ellahî ey sera bo!’ Bênatyê meşriq û mexrîb bi yew nûr bî de. Heta, mi tikê qesrî welatê rumijan dîyî! Badê cû mi Resulê Homayî girewt vereka xo û mi wi lona. Hina yew hal ame mi ser, tew kewt mi û çimî bîyî tarî. Gerguş verê çimanê mi ra bî vîndî. O veng hina persa, ‘(Muhemmed) Şî ça?’ hina cewab dîya, ‘ Wi berd rocwete!’” (Suruç, 2012: 65).

Fatima Xatun zî vîrardişê xo de vatîbî:

“A şewa mesude de keyeyo ke bîyîş(tewellud) rê wayirî kerdîbî nûr bî de û estareyî ezmanî weşe-weşe ricîyêne û şindilyebî.” (Suruç, 2012: 65).

Înî kaînatî de bêguman hedîseya tewr pîle, teweludê Pêxemberê ma Hz. Muhemmedî yo. Çunkî wi, bezreyê dara hîlqatî yo. Eger Qadîro Zulcelal ameyîşê Muhemmedî aleyhî selam teqdîr nêkerdêne ne ino kaînat ne zî insan nebîyêne. Derheqê ina dehqera de Bedûzzaman hina vano:

“Eger bi ewnîyayîşê kitabêk biewnîyê ina alema xişne ra, nûrê Muhemmedî murekebê qelemê katîbê (nuştox) inî kitabî yo. Eger a alema xişne (zey) yew dare xeyal bibo, nûrê Muhemmedî hem beno dendikê aye hem zî (beno) fêkiyê aye. Eger dinya wayirê heyatî bîyo qebulkerdiş, o nûr beno ruhê aye. Eger dinya zey yew insanî tesewur bibo, ino nûr beno eqlê aye.” (Nûrsî, 2003: 99). Wextê ameyîşê eyê ina dinya de nûrêk vîniyeno ke ino nûr rojhelatî û rojawanî sey yew wadeyî kerdîbî roşn (Suruç, 2012: 35). Ino nûr, Qur’an û Muhemmed aleyhî selam ser yew nîşan bî.

## PEYNÎYE

Hz. Muhemmed, dendik, kakil û bezreyê mexluqatan o. Nûro Îlahî ey sera vîyarto ameyo heme mexluqatan ser. Ruhê ey eşref û sîretê ey rind qey heme aleman bîyo wesîleyê rehmetî. Nameyê ey o bimbarik Lewh-î Mehfuuz de pêxembero sifte ameyo nuştiş. Rîwayetan gore resulê Homayî bi teqdîrê Homayî kaînatî rê tecelîyê heskerdişî yo. O sebebê viraştişê inî alemî muhabeto Îlahî yo.

Homayî waşto bi cemalet û celalê xo bîyo zanayîş û ino rid ra mexluqat viraşto. Viraştişê mexluqatan de yew cebr (tada) çin o, teyna heskerdiş û sînayîş est o. Ino heskerdiş zî verê cû qey Hz. Muhemmedî ameyo ramotiş. Mîyanê esteyan de Homayî rê tewr sînaye zat hebîbê ey Muhemmed o. Ey teqdîrê îlahî de senî ke dora verêne girewta, tecelîyê alemanê esteyan de zî dora verênê girewta. Nûrê ey zî heme mexluqatan ra ver xelq bîyo. Derheqê inî mewzuyî de hedîsî û vateyî zixmî est î. Reyna ino nûr û ruho berz qey heme pêxemberan, welîyan û bawermendan bîyo çimeyê nûr, zanayîş, heskerdiş û bereketî. Eger wi şefect nêkero û mebo mîyançî tu kesî rê yew nûr, zanayîş, îlim, heskerdiş û bereket nîno. Qedr û qîmetê Hz. Muhemmedî endêk berz o seba inay heme pêxemberî wazenî bibîyê umetî ey û binê sencaxê ey de bidîyayî arî. Seba inay mewzuyê nûrê Muhemmedî zaf eseranê dîniyan û edebîyan ca girewto. Derheqê inî nûrî de nuşteyî, şîirî û kitabî ameyî nuştiş. Ina çarçewa de edebîyatê tirkan, ereban, farisan û kurmancan de zaf xebatî est î.

Edebîyatê zazakî yê klasîkî mîyan de zî çend eseran de mewzuyê nûrê Muhemmedî ra behs bîyo. Inî eseran ra eserêko muhîm mewlîdê Ehmedê Xasî yo. Zereyê mewlîdê Xasî de 26 beyîtan de 31 rey ca dîyayo mefhumê nûrî. Inî beyîtan de kelîmeyê nûrî manaya xoya esil, manaya nûrê Homayî, alametê pêxembertî, nûrê Muhemmedî û motîşê çar xelifeyan sera şuxulîyaya. 15 beyîtan de kelîmeyê nûrî ya raşt-a-raşt ya serakî manayê nûrê Muhemmedî de şuxulîyaya. Ma zî ina meqala de bi referansê inî mewlîdî nûrê Muhemmedî ra behs kerd.

### **EXTEND ABSTRACT**

Commentators and Sufis have talked about Muhammadian-Nûr in the light of verses and hadiths since the early times. They wrote books such as Siyar, Tabaqat, Mawlid and Aqaid on this subject. According to Sufis, Muhammadian-Nûr is the first thing created among all creatures. In this context, different religions, sects and sciences have put forward theses on the first point of existence. Many scholars, such as Muhy al-Din al-Arabi, Imam al-Rabbani and Ahmed Khasi, stated that the first thing created was Muhammadian-Nûr. Everything that exists, such as the Qalam, the ninth heaven, space, mind, spirit and plants, came into existence through that light.

The first created being, Muhammadian-Nûr, was named as Muhammad's soul and Muhammadian truth. Understanding the subject of Muhammadian-Nûr is possible by knowing the concept of light. Knowing the answers to questions such as how the word Nûr is used in the Holy Quran and hadiths, what its meaning is, which beings are called light, and what the relationship between light and prophethood is necessary to understand the subject (Çelik, 2004: 144-146). If the thought of Muhammadian-Nûr is separated from its own meaning and treated as a new subject, the truth cannot be understood and revealed.

The concept of Nûr is used in different meanings in the Holy Quran. Sometimes this concept was used for Allah, and sometimes for other beings (Çelik, 1999: 149-155). The word Nûr is attributed to the name of Allah in the 35th Verse of the Nûr Surah. In this context, it is known that the manifestation of Allah's names is manifested as several names in every being. All the names of Allah are manifested in humans. This issue is mentioned in the 31st verse of the Bakara Surah. Allah, the light of the earth and the skies, is manifested in all existence under the name of light (Çelik, 1999: 149-155). These two issues lead to the following conclusion: All Divine names are fully manifested in our Prophet Muhammad. Because, according to the hadiths, his rank is higher than that of all people. In the sight of Allah, he is the most valuable person among the past and future people (Iyâz, 2012: 196-198). In the interpretation of the following verse, some commentators state that what is meant by Nûr is Muhammad, peace be upon him (at-Taberi, 2003: 264; ar-Râzî, 1988: 548).

“O People of the Book! Now Our Messenger has come to you, revealing much of what you have hidden of the Scriptures and disregarding much. There certainly has come to you from Allah a light and a clear Book.” (Maide 5/15).

Information about the subject of Muhammadian-Nûr is also given in the hadiths:

“I was a prophet while Adam was still between the soul and the corpse.” (Yıldırım, 2001: 193-207).  
“I am the first of the prophets in terms of creation and the last in terms of sending.” (Akkaya, 2012: 180-202).

“I was a light in the sight of Allah thousands of years before the creation of Prophet Adam...” (Ay, 2010: 77-120).

Those who conveyed the first information with Muhammadian-Nûr and Muhammadian truth are Câfer es-Sâdık, Zunnûn el-Mısırî and Abdullah et-Tusterî (d. 283/896). (Çift, 2004: 144-146).

According to Khallaj al-Mansur, ‘The light of prophethood emerged from the light of the Prophet Muhammad. These lights become apparent with his light. His is the brightest light among all lights, and there is no other light before his light.’ (Akkaya, 2012: 180-202).

Prophet Muhammad was praised both before and after he was born, and he will be praised until the end of time. The first poem among these praises is the poem written by his grandfather Abd al-Muttalib:

“Praise be to God; he gave us this beautiful and cute child.

He became a master to other children while he was still in the cradle.

I entrust it to the owner of the pillars of the Kaaba” (Bakırcı, 2003: 129).

Poets come to the fore in praising the Prophet Muhammad after Islam. There were these poets among the companions. The birth of the Prophet is an important link in these praises. However, the life of the prophet is not limited to birth. For this reason, Shemail-type books are also considered within the Mawlid genre (Bakırcı, 2003: 63, 67).

Muhammadian-Nûr is a symbol and this symbol is represented and compared with the sun, moon or stars. This light removes darkness and ignorance. It illuminates the universe from beginning to end. Muhammadian-Nûr has not only been discussed scientifically among scholars, Sufis and poets. This light is also mentioned in terms of love and praise. Poems and odes were written about this light. The subject of Muhammadian-Nûr has been discussed in classical literature in Turkish, Arabic, Persian and Kurdish literature. This subject is mostly included in works such as Siyar, history and Mawlid. The subject of Muhammadian -Nûr has been discussed in different classical works in Zaza literature. One of these works is the work called Mewlidu'n-Nebiyu'l-Qureyşî, which is also the first work in Zaza language. This work was written by Ahmed Khasî in 1899. The subject of Muhammadian-Nûr is extensively included in this work.

Knowing the concept of Muhammadian-Nûr and studying about this concept is important and a necessity for literature. This concept is a concept found in Islamic religious literature. For this reason, it is a need to know the framework of this concept and determining this concept is a problem. For this reason, this study deals with the subject of light in Ahmed Khasî's mawlid and the concept of Muhammadian-Nûr. Descriptive Analysis method was used in the study. The data of the study were taken from Khasî's mawlid. Then, sources dealing with the subject of Muhammadian-Nûr were used according to the limits and needs of the study. The answers to questions such as how many times the word Nûr is used in Khasî's mawlid and in what sense it is used are answered according to the order of the mawlid. The couplets in which the concept of Muhammadian-Nûr is mentioned are explained by the commentary method.

## ÇİMEYÎ

- Akkaya, V. (2021). İbnü'l-Arabî'nin Nûr-i Muhammedî Açısından Hz. Muhammed ve Diğer Peygamberler Arasındaki İlişkilere Bakışı. *Sufiyye*. 10, 180-202.
- Akman, M. (2011). Hakikat-i Muhammedî Düşüncesi ve Bu Düşüncenin Referanslarını Aktaran İki Kaynak ve Müellifleri. *Yalova Sosyal Bilimler Dergisi*. 2, 107-131.
- Anter, M. (2013). *Hatıralarım*. (3. Baskı). İstanbul: Aram Yayınevi.
- Apuhan, D. (2022). *Molla Mehmet Demirbaş Divanı (Şekil, Biçim ve İnceleme)*. (1. Baskı). İstanbul: Neşirxaneyê Vir.
- Ay, M. (2010). İshârî Tefsirlerde Hakikat-i Muhammediyye Anlayışı. *İstanbul Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi*. 23, 77-120.
- Bakırcı, S. (2003). *Mevlid Doğuşu ve Gelişmesi*. İstanbul: Akademik Araştırmalar.
- Çantay, H. B. (1965). *Kur'an-ı Hakîm ve Meâlî Kerim*. (1. Baskı). İstanbul: Ahmed Said Matbaası.
- Çelik, Ö. (1998-99). Kur'an-ı Kerim'de Nûr Kavramı. *Marmara Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi*. 16 (17), 149-155.
- Çift, S. (2004). İlk Dönem Tasavvuf Düşüncesinde Nûr Kavramı. *Uludağ Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi*. 13 (1), 144-146.
- Çolig, F. (2014). *Tefsire Qur'one Kerim Zazaki*. (1. Baskı). İstanbul: Astun.
- Dağılma, İ. (2015). Ahmedê Xasî'nin Hayatı ve Mewlid Adlı Eserinde Tema. *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*. 1(1), 124-146.
- Demirci M. (2018). Nûr-i Muhammedî. *DEÜİFD*. 1, 239-258.
- Demirci, M. (1997). Hakikat-i Muhammediyye. *İslâm Ansiklopedisi* içinde (c. 27, 179-180). İstanbul: TDV Yayınları.
- Devellioğlu, F. (2012). *Osmanlıca Türkçe Ansiklopedik Lugat*. Ankara: Aydın Kitabevi.
- El-Cezûlî, M. (2018). *Delaili Hayrat Şerhi Kara Davut*. A. Akçiçek (Çev). İstanbul: Çelik Yayınevi.
- Er-Râzî, F. (1988). *Tefsîr-i Kebîr Mefatih 'ul Gayb*. S. Yıldırım vd. (Çev). Ankara: Akçağ Yayınları.
- Erzurumlu, İ. (2003). *Marifetname*. M. F. Başar (Sad). İstanbul: Âlem Yayıncılık.
- Es-Safûrî, A. (2016). *Nüzhetü'l-Mecâlis ve Müntehabu'n-Nefâis II*. Beyrut: Dârü'l-Kütübi'l-İlmiyye.
- Et-Taberî, E. (2003). *Tefsîru'l-Taberî*. A. Abdulmuhsin (Thk). Riyâd: Dâru'lâlemi'l-İslâmî.
- Et-Tüsterî, A. (2002). *Tefsîrû'l-Tüsterî*. Beyrut: Dârü'l-Kütübi'l-İlmiyye.
- Güler, Z. (2006). Yunus Emre'nin Nûr-ı Muhammedî Anlatımının Türk Yaratılış Destanlarıyla Benzerliği. *Fırat Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi*. 16 (2), 63-72.
- Hayig R. & Werner B. (2012). *Zazaca Türkçe Sözlük - Türkçe Zazaca Sözcük Listesi*. İstanbul: Tij Yayıncılık.
- İdiz, F. (2014). Tasavvufta Hakikat-ı Muhammediyye Meselesi ve Mesnevi'den Örnekler. *EKEV Akademi Dergisi*. 59, 179-200.
- İyâz, K. (2012). *Şifa-i Şerif I*. M. Y. Kandemir (Çev). İstanbul: Tahlil Yayınları.
- Kandemir, M. Y. (2010). Şemâil, İslam Ansiklopedisi içinde (c. 38, 497-500), İstanbul: TDV Yayınları.
- Kastallani. (2015). *Mevahib-i Ledunniyye I*. H. R. Yananlı (Sad). İstanbul: Divan Yayınları.
- Kaya, M. A. (2009). Kâinat Nasıl Yaratılmıştır ve Yaratılış Amacı Nedir? *Sorularla İslamiyet*. Erişim Tarihi: 16.11.2023, <http://m.sorularlailslamiyet.com/index.php?oku=180437>
- Kılıç, M. E. (2009). *Şeyh-i Ekber İbn Arabî Düşüncesine Giriş*. İstanbul: Sufi Kitap.
- Korkusuz, M. Ş. (2004). *Tezkire-i Meşayih-i Amid (Diyarbakır Velileri) I-II*. İstanbul: Kent Yayınları.
- Köksal, M. Â. (2011). *Peygamberler Tarihi I*. Ankara: TDV Yayınları.
- Nürsî, S. (2003). *Mesnevî-i Nûriye*. İstanbul: Yeni Asya Neşriyat.

- Nürsî, S. (2003). *Sözler*. İstanbul: Yeni Asya Neşriyat.
- Özkat, M. (2014). Osmancıklı Paşalı-zâde Abdülkadir Hilmî (Âşık Kadri) ve Mevlûd-ı Cedîd-i Şâh-ı Risâleti. *Divan Edebiyatı Araştırmaları Dergisi*. 12, 135-176.
- Özmen, İ. (2020). *Tasavvuf: Dinsel ve Bilimsel Açıklaması*. İstanbul: Urzeni Yayıncılık.
- Sarı, İ. (2016). *Kur'anda Besinler*. Antalya: Netmedya.
- Selvi, D. (2007). İlk Yaratılan Nûr. *Semerkant Dergisi*, 99.
- Suruç, S. (2012). *Kâinatın Efendisi Peygamberimizin Hayatı*. İstanbul: Nesil Yayıncılık.
- Topaloğlu, B. (1991). Âmine, *İslam Ansiklopedisi 3* içinde (63-64). İstanbul: TDV Yayınları.
- Uca, İ. H. (2013). *Delil ve Kaynaklarıyla Büyük Kadın İlmihali*. Konya: Kitap Dünyası.
- Uludağ, S. (2007). Nûr, *İslam Ansiklopedisi* içinde (c. 38, 244). İstanbul: TDV Yayınları.
- Yardım, A. (2002). Ebû Abdillâh Muhammed b. Selâme b. Ca'fer el-Kudâî, *İslam Ansiklopedisi* içinde (c. 26, 309-310), Ankara: TDV Yayınları.
- Yazır, E. M. H. (1995). *Hak Dini Kur'an Dili 8*. İstanbul: Azim Yayıncılık.
- Yıldırım, A. (2000). *Tasavvufun Temel Öğretilerinin Hadislerdeki Dayanakları*. Ankara: TDV.
- Yıldırım, A. (2001). Hadislerde Yaratılış Problemi. *IV. Kutlu Doğum Sempozyumu* içinde (193-207), Isparta: SDÜ İlahiyat Fakültesi Yayınları.
- Yılmaz, H. K. (2006). Mevlid-i Nebî'de Muhammedî Nûr. *Altınoluk Dergisi*. 242, 8.

# Adaptasyona Asta Pêş A1ê ya CEFRê Bo Şîyana Xwendinê ya Kurdîya Kurmancî<sup>1</sup>

## CEFR'da Bulunan Okuma Becerisinin A1 Öncesi Seviyesinin Kurmanci Kürtçesine Uyarlanması

### Adaptation of the Pre-A1 Level of Reading Skill in CEFR to Kurmanji Kurdish

Ali ONAY

<b>Ali ONAY</b>	Ali ONAY   <a href="https://orcid.org/0000-0002-9613-3056">https://orcid.org/0000-0002-9613-3056</a>   onayali77@gmail.com MA Candidate, Mardin Artuklu University, Institute of Living Languages in Türkiye, Department of Kurdish Language and Culture, Mardin, Türkiye
<b>Jêgir Citation Atıf</b>	Onay, A. (2024). Adaptasyona Asta Pêş A1ê ya CEFRê Bo Şîyana Xwendinê ya Kurdîya Kurmancî. <i>The Journal of Mesopotamian Studies</i> (16), 48-66 DOI: <a href="https://doi.org/10.35859/jms.2024.1435822">https://doi.org/10.35859/jms.2024.1435822</a> .
<b>Dîroka Şandinê Submission Date Geliş tarihi</b>	12.01.2024
<b>Dîroka Qebûlê Acceptance Date Kabul Tarihi</b>	27.03.2024
<b>Dîroka Weşandinê Publication Date Yayın tarihi</b>	30.03.2024
<b>Cureyê Gotarê Article Type Makale Türü</b>	<b>Gotara vekolînê</b> Research article Araştırma makalesi
<b>Hakemî Peer-Review Hakemlik</b>	<b>Cot Nenas – Du ji derve</b> Double anonymized - Two External Çift Taraflı Kôr Hakemlik – İki hakem
<b>Beyana Etîk Ethical Statement Etik Beyanı</b>	<b>Hatîye beyankirin ku di pêkanîn û nivîsîna vê xebatê de hemû rêzikên zanistî û etîk hatine şopandin û hemû çavkanî bi awayekî têkûz hatine referanskirin</b> <i>It is declared that scientific and ethical principles have been followed while carrying out and writing this study and that all the sources used have been properly cited.</i> Bu çalışma yapılırken ve yazılırken bilimsel ve etik ilkelere uyulduğu ve kullanılan tüm kaynaklara uygun şekilde atıfta bulunulduğu beyan edilir.
<b>Kontrola İntihalê Plagiarism Checks Benzerlik Kontrolü</b>	<b>Belê – iThenticate</b> Yes – iThenticate Evet – iThenticate
<b>Nakokiyên erjewendiyan Conflicts of Interest Çıkar Çatışması</b>	<b>Di gotarê de di navbera nivîskar û ti aliyên din nakokîya berjewendîyê tune ye.</b> <i>There is no conflict of interest between the author and any parties in the article.</i> Yazar ile makalede yer alan taraflar arasında herhangi bir çıkar çatışması bulunmamaktadır.
<b>Alîkarîya Darayî Grant Support Maddi Destek</b>	<b>Nivîskar beyan dike ku wan wî ji bo vê vekolînê ti fonên derveyî wernegirtine.</b> <i>The author(s) acknowledge that they received no external funding in support of this research.</i> Yazar(lar), bu araştırmayı desteklemek için herhangi bir dış fon almadıklarını kabul etmektedirler.
<b>Mafê Telifê &amp; Destûr Copyright &amp; License Telif Hakkı &amp; Lisanslama</b>	<b>Nivîskar li jer lisansa CC BY-NC 4.0 mafê xwe yê li ser xebata xwe diparêzin.</b> <i>Authors publishing in the journal retain the copyright to their work licensed under the CC BY-NC 4.0.</i> Dergide yayın yapan yazarlar, CC BY-NC 4.0 kapsamında lisanslanan çalışmalarının telif haklarını saklı tutarlar.

<sup>1</sup> Ev gotar ji teza masterê ya nivîskar a ku li ber nivîsandinê ye hatiye hilberandin.

## KURTE

Cîhana ku em tê da ne ragihandinê misoger dike. Ji bo ragihandinê ziman amûrê herî giring e; loma jî mirov, her çî bi deng û her çî jî bi îşaretan be radigihe. Pêdivîya ragihandinê sistematîzekirina ziman jî bi xwe ra aniye. Zimanên ku negihîştin vê standardê yan qels ketin an jî mirin. Ji bo vê metirsiya windabûnê jî her millet (netewe) kete nav karûbarê sistematîzekirin û hînkirina zimanê xwe. Xebatên ku tên kirin jî nîşan didin ku kurdî jî ji wan zimanan e ku dixwaze xwe bigihîne vê standardê. Konseya Ewropayê jî ji bo welatên ku endamê wê ne, xwast standardeka hînkirinê çê bike. Û xebateka bi navê Ji Bo Zimanên Ewropî Metna Çarçove ya Hevpar/*Common European Framework of Reference for Languages* (CEFR) saz kir. Me jî hewl da ku ji bo kurdîya kurmancî jî em wekî pêşniyazekê yan nimûneyekê jî şîyana xwendinê, Asta Pêş A1ê bi rêya çalakî/rahênan adapteyî kurdîya kurmancî bikin. Ji bo ku em adaptekirinê pêk bînin ewil me destkeftiyên di CEFRê da destnîşan kirin, paşê jî ji wan destkeftiyên me pênc heb çalakî/rahênan saz kirin. Herweha di sazkirinê da ewil destkeftiyên şîyana xwendinê yê Asta Pêş A1ê hatin diyarkirin û paşê jî li gor wan destkeftiyên bi rêya çalakî û rahênanan Asta Pêş A1ê hate adaptekirin.

**Peyvên Sereke:** Hînkirina ziman, CEFR, asta Pêş A1ê, şîyana xwendinê, adaptasyon, kurdîya kurmancî

## ÖZ

Yaşadığımız dünya iletişimi kaçınılmaz kılmaktadır. Dil iletişimin en önemli aracıdır; bu yüzden ister sesletim yoluyla ister işaret yoluyla olsun, insanlar iletişimlidir. İletişim ihtiyacı dilin sistemleşmesini de beraberinde getirmiştir. Bu standarda uymayan diller ya zayıflamış ya da ölmüştür. Bu yok olma tehlikesi karşısında her millet kendi dilini sistemleştirme ve öğretme çabası içine girmiştir. Kürtçe de yapılan çalışmalar da gösteriyor ki Kürtçe de bu standarda ulaşmak isteyen dillerden biridir. Avrupa Konseyi de üye ülkeleri için bir öğretim standardı oluşturma isteğiyle. Diller İçin Avrupa Ortak Başvuru Metni/ *Common European Framework of Reference for Languages* (CEFR) adında bir çalışma oluşturmuştur. Biz de okuma becerisini bir tavsiye veya örnek olarak A1 Öncesi Düzeyini Kurmancî Kürtçesine yönelik etkinlikler/aktiviteler yoluyla uyarlamaya çalıştık. Önce CEFR’da bulunan okuma becerisi kazanımlarını belirttik sonrasında bu kazanımlara göre beş tane etkinlik yaptık. Aynı zamanda adaptasyon sürecinde, öncelikle A1 Öncesi seviyenin kazanımları belirlendi daha sonra da bu kazanımlara göre etkinlik/aktiviteler oluşturuldu. Bu sayede okuma becerisinin A1 Öncesi seviyesi uyarlandı.

**Anahtar Kelimeler:** Dil öğretimi, CEFR, A1 öncesi seviye, okuma becerisi, adaptasyon, Kurmancî Kürtçesi

## ABSTRACT

The world we live in makes communication inevitable. Language is the most important tool of communication; That’s why people communicate, whether through pronunciation or sign. The need for communication brought about the systematization of language. Languages that did not meet this standard either weakened or died out. In the face of this danger of extinction, every nation has attempted to systematize and teach its own language. Studies conducted in Kurdish also show that Kurdish is one of the languages that want to reach this standard. The Council of Europe also wanted to establish a teaching standard for its member countries. And they created a study called the Common European Framework of Reference for Languages (CEFR). As a recommendation or example of reading skills, we tried to adapt the Pre A1 Level through events/activities for Kurmanji Kurdish. First, we stated the reading skill outcomes in the CEF, and then we did five activities based on these outcomes. At the same time, during the adaptation process, the achievements of the Pre A1 level were first determined

and then the event/activities were created according to these achievements. In this way, the Pre A1 level of reading skill was adapted.

**Keywords:** Language teaching, CEFR, pre A1 level, Reading skill, Adaptation, Kurmanji Kurdish.

### Destpêk

Di gelek xebatên li ser ziman û hînkirina wê da pirsra ewil pîrî caran “ziman çî ye” ye. Gelek zimanzan û yên ku li ser zimanan dixebitin pênase û bersivên cihêreng dane ku Aksan jî dibêje: “Ziman, bi qasî ku wê bi carekê neyê pênase kirin pîralî û mexsûsî mirov e.” (Aksan, 2003: 9). Loma jî ji bo pênasekirinê sînora li zimanî nikare bê dayîn. Bi qasî ku ziman nikare bi carekê bê pênasekirin, ew tenê ne aîdê komekê ye jî. Herweha ew “wekî zimanê însanan, zimanê komputeran, zimanê heywanan, zimanê îşaretê, zimanê nivîsê, zimanê nivîskarî, zimanê herêmî, hwd.” (Yonat, 2021: 8). Tê dabêşkirin û her yek bi sîstemeka cuda û pênaseyeka din tê lêkolîn. Heke bi giştî lê bê nêrîn, dikare bê gotin ku ew amûrê ragihandinê ye gelek kom û komikan e. Lê di vir da zimanê ku em ê li ser rawestînin ê însanan e. Ji hebûna mirovahiyê û vir ve wekî amûrê ragihandinê ziman hatîye bikaranîn. Piştî ku têkilîyên siyasî, aborî, civakî û hiqûqî di navbera komên însanan da çê bûn îcar hewcedarî bi amûreke ragihandinê ye bi kêr hatî çê bû. Loma jî însanan pêwîstî bi hînbûna zimanan dît. Hînbûna zimanekî din bi pîranî ji ber yê nepêşketî ber bi yê pêşketî ve diçû lêbelê piştî ku hate famkirin bê zimanekî din çawa rengê çê dide çand û hunera cihanê îcar ew qelsî û kêmasî ji holê rabûn û her du jî ber bi erênîyê ve çûn. Ango hînbûna zimanekî din êdî ji keyfîyetê derket û ew bû hewcedarîyek. “Di nav şert û mercên cihana îroyîn da hînbûna zimanekî yan jî çend zimanan, ji qabilîyeteka baş wêdetir bûye hewcedarîyek. Geşedanên ku di teknolojîya înfomatîk da pêk tên, amûrên ragihandinê dewlemend kirîye û sînora erdnîgarîyê ji holê rakirîye pê ra mirovên li deverên gelekî cuda bi awayekî demildest gihandîye hev.” (Demirdöven, 2021: 340).

Loma jî sazîyeka wekî Komîsyona Ewropayê (*Council of Europe*) xwast ku vê yekê bilindtir bike û pêşdatir bibe. Ev yek ji hêla hevqebûlkirinê, rêzdayînê û gelek normên din wê di navbera gelên Ewropayê da bibûya pêngaveka mezin, loma jî bi giştî 47 welatan alîkarî da vê projeyê, yanî dane CEFRê (Ji Bo Zimanên Ewropî Metna Çarçove ya Hevpar).

Vê komîsyonê hewl da ku ew ji bo gelên Ewropayê têgehên wekî pîrzimanî û pîrçandîtîyê di xwe da bihewînin da ku “dijberîya bîyanîyan” ji holê rakin û li hemberî nasnameyên din jî rêzdar bin. Herwekî din komîsyonê bi vê projeyê, ku li jêr em ê bi hûrgulî qal bikin, xwast ku zimanên kêmaxivêr neyên jibîrkirin û herwekî din jî her çî herêmî û her çî jî netewî be, ziman bî hînîkirin. “Li gor feraseta pîvanên çandî ku di heman demê da polîtîkayên perwerdeya zimanê bîyanî yên Ewropî jî çê dike, serdestîya yekzimanî wekî zimanê bîyanî geşedanek e ku ji bo parastina pîrzimanîya wekî mîrateya çandî ya Ewropayê tê dîtin, divê were astengkirin” (Polat, 2001: 32)

Îcar komîsyonê hewl da ku bi bernameyeka hevpar vê mîrateyê sîstematîze bike. Di heman demê da CEFR an jî “Çarçoveya Pêşnîyazan ji rêveberên perwerdeyê, ji nivîskarên pirtûkên dersê ra, ji mamosteyan ra, ji yên ku mamosteyan perwerde dikin ra, ji pêşkêşvanên azmûnê ra hwd. materyalan pêşkêş dike.” (Avrupa Konseyi, 2001: 1). Loma jî bi beşdarîya gelek welat û zanîngehan, metneka bi navê CEFRê amade kirin.

Di metna ku 2001ê da hate pêşkêşkirin tê da şeş astên ziman hatibûn destnîşankirin. Di sala 2020an da bi navê Metna Temamker, Metna Çarçove hate revîzekirin. Di vê guherînê da “astên ziman ên ku berê wekî (CEFR, 2001), A1, A2, B1, B2, C1, C2 hatibûn destnîşankirin ji ber hewcedarîyê asta Pêş A1ê (Pre A1) jî tê da hate destnîşankirin, program li gor şert û mercên îroyîn hatin sepandin. Bername û destkeftîyên nû ji bo astên zimanê hevpar hatin diyarkirin.” (Demirdöven, 2021).



Di vê xebatê da jî em ê bi hûrgilî li ser vê metnê (Metna Çarçove) bisekinin û hewl bidin ku hem baş bê famkirin û di heman demê da hem jî ji bo hînkirina kurdî bo bîyanîyan qonax bi qonax li gor qeyd û bendê CEFRê bîn sazînin. Yanî mabesta me ew e ku em CEFRê adapteyî kurdîya kurmancî bikin.

Mijara vê xebatê adaptasyona CEFRê ji bo kurdîya kurmancî ye. Me di vê xebatê da hewl da ku em CEFRê bidin nasîn û ji bo hînkirina kurdîya kurmancî adaptasyona Asta Pêş A1ê ya şîyana xwendinê bikin. Herweha ev xebat ne ku bi giştî li ser CEFRê sekinîye ew bi xwe li ser beşeka CEFRê ya nû rawestîyaye ku ew jî Pre A1-Pêş A1-A0 e.

Ev xebat ji bo hînkirina kurdîya kurmancî dê bibe çarçoveyek û ji bo hînkirinê dê standardekê bide me. Ji bo pirsra “di dema hînkirina kurdî da em ê destkeftî û çalakî/rahênanan çawa bi kar bînin?” dê bibe bersiv. Herweha ev xebat dê bibe alîkar ku hînkirina kurdîya kurmancî bi awayekî komî dabeş bibe û bersiva ji bo kê û çawayê, bide. Di heman demê da ev xebat dê ji bo yên ku bixwazin li ser hînkirina kurdî bixebitin, bibe çavkanîyeka alîkar.

Ji bo ku ev xebat li ser adaptekirina CEFRê bû, û mijara xebatê li ser perwerdeyê bû me bi rêbaza lêkolîna bingeh sêwirandin (design-based research/tasarım tabanlı araştırma) bi kar anî. Xebatên ku di derheqê CEFRê da hatibûn kirin, hatin vekolandin û herweha ji xebatkarê ku li ser vê mijarê xebitîne jî sûd hate wergirtin.

Di dema lêgerîna çavkanîyan da, çavkanîya sereke CEFR bû ku jixwe mebesta me adaptekirina wê bû. Beşên ji me ra hewce, hatin wergerandin û CEFR bi beşên xwe yên ku dê bibin mijara xebatê neqlî kurdîya kurmancîyê bûn. Piştra xebatên ku li ser hînkirina zimanî û CEFRê hatibûn kirin bi hûrgilî hatin vekolandin û ji wan sûd hate wergirtin. Çend çavkanîyên ku me jê zêde sûd wergirt ev in: Diller İcin Avrupa Ortak Başvuru Metni: Öğrenme, Öğretme, Değerlendirme-2001; Diller İcin Avrupa Ortak Başvuru Metni: Öğrenme, Öğretme, Değerlendirme- Tamamlayıcı Cilt- 2020. Ev her du çavkanîyên ku hatin dayîn wergerên Metna Çarçove ya ku ji hêla Wezaretê Perwerdeya Netewî (MEB) ya tirkîyê ve hatine çêkirin. Ev çavkanî ji hêla Konseya Ewropayê ve di salên 2001ê û di salên 2020an da ji bo bikarhênerên ku di qada zimanî da dixebitin hate weşandin.

## **1. Di Peywenda Sîyasî û Perwerdeyê da ji bo Zimanên Ewropî Metna Çarçove ya Hevpar.**

### **1.1. Ji bo Zimanên Ewropî Metna Çarçove ya Hevpar Çi ye?**

Ji bo ku mebesta xebatê baş bê famkirin divê ewil em binêrin bê CEFR çî ye?

“Ji Bo Zimanên Ewropî Metna Çarçove ya Hevpar, bernameyên zimanên Ewropî, rêwerzên bernameyê, pirtûk û pirtûkên dersê, hwd. vedihewîne. Armanc ew e ku di derbarê mijarên xwendinê da çarçoveyeka hevbeş pêşkêş bike. Ew bi berfirehî rave dike ku hînkirina zimanên bîyanî ji bo ku vî zimanî seba ragihandinê bi kar bînin divê çî zanibin û bona ku di vî zimanî da çalak bibin divê ew çî zanîn û qabiliyetan bi pêş bixin. Ev ravekirin di heman demê da çarçoveya çandî ya ku ziman tê da hatine afirandin jî dihewîne. Nivîsara referansê di heman demê da asta jêhatîbûna xwendekarên bîyanî jî vedibêje, ku rê dide wan; ew di her qonaxeka fêrbûnê da pêşkeftin û fêrbûna xwe bipîvin.” (Avrupa Konseyi, 2001: 1).

“Ji Bo Zimanên Ewropî Metna Çarçove ya Hevpar li gor zimanan, pileyên cuda dide û van pileyan li gor sistemekê bi rê ve dibe. Metna Çarçove ya Hevpar, metneka referansê ye ku ew bi giştî çarçoveyeka ku ew kesên dixwazin ziman hîn bibin divê xwedî kîjan şîyanan bin, vedibêje.” (Demirdöven, 2021).

Mebest ew e ku di hînkirina zimanekî din da ji bo gelên Ewropayê konsensûsek ava bibe û kesê ku fêr dibe yanî xwendevan, bizanibe gihîştîye çî astê yan jî di hînbûnê da çiqas bi pêş da çûye. “Konseya Ewropayê, dixwaze bi biryarên hevpar li welatên ku endamê wê ne pergaleka tetbîqî belav bike. Li Ewropayê bi armanca ku pirzimanîyê û pirçandîyê belav bikin, di pêvajoya hilberandina polîtîkayên nû da bi rêgezeka standard dixwaze nêzîkatîyeka piralî di xwe da bihewîne. Loma jî li Ewropayê, zimanê lê tên axiftin; hînkirina wan a wekî zimanekî biyanî yan jî fêrbûna wan, pîvandina wan û herweha di perwerdeya mamosteyan da dê ev qayde dê bî ber çavan.” (Mirici, 2015: 42). Herweha ev proje di heman demê da hem sîyasî û hem jî çandî wê germahîyekê yan jî hevgirtineke baş di nav gelên Ewropayê da çê bike. Loma jî Konseya Ewropayê/*Council of Europe* û pêkhatayên wê xwastin ku vê yekê bi awayekî zanistî birêkûpêk çê bikin.

Piştî pêkhatinê di Metna Çarçove da hin guherîn jî çê bûne, di *metna temamker* a CEFRê da jî di derheqê dîrokçeya CEFRê da bi berfirehî hatîye behskirin lê dîsa jî ji bo ku mijar zelaltir bibe bi kurtî guherînên wê wisa ne: “Ji bo Zimanên Ewropî Metna Çarçove ya Hevpar piştî pêvajoya pêşnûmayeka berfireh, sepandin û şewirmendîyê bi temamî di sala 2001ê da hate weşandin. Piştra, piştî ku di derheqê pêdivîyên hînkirina zimanê biyanî da rexne lê hatin kirin, hin guherîn tê da çê bûn. Bi dorê ev guherîn weha ne: Di Cotmeha 2007an da ji bo Zimanên Ewropî Metna Çarçove ya Hevpar Cilda Pênaseyên Temamker a Demî (CEFR Comoanion Volume with new Descriptors Provisional Edition); Di Sibata 2018an da ji bo Zimanên Ewropî Metna Çarçove ya Hevpar Cilda Temamker a Pênaseyên Nû (CEFR Companion Volume) û guherîna dawî jî bi navê Di Avrela 2020an da ji bo Zimanan Metna Çarçoveya Hevpar a Ewropî Cilda Temamker (CEFR Companion Volume) hatîye nûjenkirin.” (Demirdöven, 2021:340).

## 1.2. Armanca û Mebestên Sîyaseta Zimanî ya Konseya Ewropayê

Armanca Metna Çarçove ew e ku di navbeyna endamên Konseya Ewropayê da yekîtiyeka baş ava bike û vê yekîtiyê bilind bike. Herweha ew hewl dide ku di hêla çandî da endamên Konseyê bi hev ra çalakîyan saz bikin. Konseya Ewropayê bi rêya Konseya Hevkarîya Çandî ji roja ku hatîye damezrandin ve gelek proje pêk anîne û ev çêkirana projeyan hîn jî didome. Di dema avakirina projeyan da Konsey li ser sê rêgezan radiweste:

1. Pirrengîya zimanî û çandî û mîrata dewlemend a Ewropayê divê bî parastin û pêşxistin. Ew çavkanîyeka hevpar e û divê ev ciherengî ji bo ragihandinê nebe asteng, bereks divê bibe cihê dewlemendîyê. Ji bo ku ev yek jî pêk bê di qada perwerdeyê da hewcedarî bi kedeka mezin heye.

2. Ji bo ku Ewropa çalaktir bibe, divê têgihîneka hevpar û karkirineka hevbeş pêş bixin û ji bo ku karibin ji heqê pêşdarazî û cihêkarîyê derkevin, pêwîst e di navbera Ewropîyên ku zimanê wan ê dayikê cuda ye ragihandin û têkilîya wan hêsan bibe. Ev yek jî ancax bi rêya zanîna baş a zimanên Ewropayî yên modern gengaz e.

3. Welatên endam, di perwerde û fêrbûna zimanê modern da, heke karibin nixrên neteweyî qebûl bikin û wan bi pêş ve bibin wê karibin hevkarîyê û koordînasyonê sererast bikin û pê ra jî wê karibin di asta Ewropayê da nêzketineka mezin bi dest bixin (Avrupa Konseyi, 2001: 2).

“Xebatên ku ji aliyê Konseya Ewropayê ve hatine kirin nîşan didin ku zimanên Ewropî di warên civakî, aborî û çandî da çiqas bi qîmet in. Di encama xebatên ku hatine kirin da armanca herî bilind jîndarîya zimanan bî parastin û civakeka pirçandî û pirzimanî bî avakirin, hatîye plankirin.” (Seyhan, 2018: 39).

Dem a ku em li van her sê rêgezan dinêrin, ya ku em têdigihîjin ew e ku Metna Çarçove li ser çend peyvên sereke radiweste: pirçandî, pirzimanî û hevkarî. Ya ku ji metnê tê xwastin em dikarin bi van

her sê peyvên nima bikin. Ango “Yek ji armancên herî giring ên politikaya zimanî ya Ewropayê jî pêşxistin û teşwîqkirina pirzimanî û pirçandîyê ye.” (Yücel, 2006: 112).

### 1.3. Ji bo Çi Pêdivî bi CEFRê Hatîye Dîtin?

Konseya Ewropayê li gor bendên li jêr hewcedarîya Metna Çarçove vedibêje. Li jor jî hatibû dîyarkirin ku hewcedarîya ewil hînkirina zimanî ye, lêbelê hin hincet û hewcedarîyên din jî hene ku ew jî di metna ewil ya CEFRê (2001) da bi vî awayî hatine dayîn:

Di bin serokatîya hikûmeta Swîsrayê da di Mijdara 1991ê da li Ruschlikonê di sempozyûma navdewletî da “Li Ewropayê di hînbûna zimanîda şefafî û hevgerî: Armanc, Nirxandin, Belgekirin” ev biryar hatin girtin:

1. Li welatên endam, bêtir liv û tevger, rêzdarî li nasname û çandên cihêreng û pê ra jî têkilîyeke bibandor a navteweyî, bi hêsanî bidestistina zanîne, zêdetir tekilîya kesani û ji bo armancên hevkar ên kûr û gur hînbûna û hînkirina zimanî giring e.

2. Ji bo ku van armancan bi dest bixin, hînkirina zimanî çalakîyeke ku ji pêşdibistanê heta kamilbûnê bi pergala perwerdeyê divê bê bipêşxistin û gurkirin. Herweha ew divê di tevahîya jîyanê da bê dayîn.

3. Tê xwastin ku Metna Çarçove were bipêşxistin ku dê fêrbûna zimanî di hemû astan da ji bo armancên jêrîn bi rê ve bibe.

a. Zêdekirina hevkarîya di navbera sazîyên perwerdeyê yê li welatên cuda,

b. Di şîyanên zimanî da avakirina bingeheka hevebeş,

c. Di damezrandina van sazîyan û hevrêzkirina xebatên wan da alîkarîya xwendekar, mamoste, bipêşdebirên bernameyan, lijneyên îmtihanê û midîrîyetên perwerdeyê. (Avrupa Konseyi. 2001).

“Metna Çarçove armanc dike ku mufredata zimanî ya di standardên Ewropî da li ser bingeheka hevbeş were sazîkirin, ji bernameyên ku tene amadekirin ra rêbertîyê bike û di amadekirina azmûn û cerebeyan da nêzîkatîyeke hevpar bi pêş da bixe.” (Deniz & Uysal, 2010).

### 1.4. Cihên Bikaranîne yê CEFRê Çi ne?

#### 1.4.1. Cihê Bikaranîna Metna Çarçove:

Di dema sazîkirinê da Metna Çarçove wekî rêbernameyekê tevdigere. Ew dixwaze ku metin bi naverok û şeweya xwe zelal be. Loma jî ew ji me ra xal bi xal cihên ku dê metin bi kêrî çî bê û li ku derê wê derbasdar be vedibêje û pirsên di serê hînkir û yê ku amûrên perwerdeyê sazî dikin dibersivîne. Di vê binavê da jî cihên ku metin lê derbasdar e hatîye dayîn ku ew jî ev in:

#### a. Plankirina bernameyên fêrbûna zimanî

Bi zanînen berê û hînbûnen hatin jîyîn,

Bi texmînen ku hînbûna dibistana seretayî, navîn û asta pêşketî dide ber çavan,

Ber bi armancan ve,

Li gor naverokê bê plankirin.

**b. Belgekirina fêrbûna zimanî**

Naveroka bernameya azmûnê,

Plansazîyê li gor pîvanên nirxandinê dike (li şûna yên neyînî, taybetmendiyên erênî dihesibîne).

**c. Plankirina xwehînbûnê**

Zêdekirina haydarîya xwendekaran ji zanîna xwe ya heyî,

Li gor xwesazkirina armancên guncav û hêja,

Hilbijartina materyalan,

Li gor ku xwe binirxîne tê plankirin.

**d. Bernameyên fêrbûnê û pêdivîyên sertîfîkayê**

**Gerdûnî** (amadekirina xwendekar ji bo hemû pîvanên asta ziman û ragihandinê)

**Modular** (ji bo armanca taybetî li devereka tixûbdar bipêşkeftina şîyana xwendekar)

**Bi giranî** (teqezkirina fêrbûnê di hin alîyan da, bêtir di hin warên zanîn û jêhatîbûnê da afirandina ‘profilek’ ku dê astên bilind qezenc bike)

**Qismî** (bi tenê di hin çalakî û bikêrîyan da (mînak: di hêla têgihiştinê da) bipêşxistina berpirsyarî û bi yên din ra mijûlnebûn.

Nivîsara Metna Çarçove ya Hevpar, ji bo yekkirina van formên cihêreng hatîye sazîkirin. Gava ku rola Metna Çarçove ya Hevpar tê hesibandin ji bo asta bilind a qedemeyên hînkirina zimanî, çarçoveya xweza û cihê ku hînber pêdivîyê pê dibîne giringîyê distîne. Divê di çarçoveya metna hevpar da wesfên giştî bîn dîyarkirin. Divê ev wesf baş bîn pênasekirin. Divê li gor taybetmendiyên neteweyî bîn adaptekirin, qadên nû (bi taybetî jî hem çandî û hem jî yên taybetî) di xwe da bihewîne. Bi vê ra hin pêdivîyên taybetî, taybetiyên wan û çavkanîyên hînberan roleka giring dilîze. (Avrupa Konseyi, 2001).

**1.4. Astên Hevpar ên Metna Çarçove**

“Hejmar û xwezaya astên ku ji bo perwerdeya zimanî bi awayekî fermî di çarçoveyeka berfireh da (ne bi qeydên gerdûnî) lihevkiyên/konsensûsek ava bûye. Ev hemû, şeş astên giştî yên Metna Çarçove ji bo şagirtên zimanî yên Ewropî li ser perwerdeyê bi zelalî wekî lihevhatinekê tê nasîn.” (Avrupa Konseyi, 2001). Di CEFRê da, di metna ku di sala 2001ê da bi wergera xwe ya tirkî hate pêşkêşkirin da şeş ast hene. Ew ast li jêr bi rêya tabloyan hatine dayîn. Di metna 2020an da jî li van astan astek hate zêdekirin ku ew jî Pre A1/Pêş A1 e.

**1.5. Çarçoveyeka Şeş Astî ya Metna Çarçove**

Astên ku di metnê da ne “di Portfolyoya Zimanî ya Ewropayê da li gor cudahîyên ku hatine tesbîtîkirin, di hînkirina zimanekî zikmakî yan jî bîyanî da ev ast wekî A1, A2, B1, B2, C1, C2 hatine destnîşankirin.” (Kartal, û Yeşil, 2021: 610). Herweha di Metna Çarçove ya 2001ê da jî ji bo astan dabeşîkirin weha ye:

**Asta Destpêkê yan jî Keşfê: (Breakthrough)** Wilkins di pêşniyazîya xwe ya sala 1978an da ku jê ra “formul û qabiliyet” gotîye û herwekî ku Trîm jî di heman weşanê da gotîye “qabiliyeta destpêkê” vê astê nîşan dide.

**Asta Navberê yan jî Asta Hewcedariyên Bingehîn: (Waystage)** wêfên naveroka niha ku hîn jî li Konseya Ewropayê derbasdar e, nîşan dide.

**Asta Şêmîkê (Threshold)** wêfên naveroka niha ku hîn li Konseya Ewropayê derbasdar e nîşan dide.

**Asta Pêşketî (Wantage)** yan jî Axiverê Serbixwe, Ji aliyê Wilkins ve “qabilîyeta bikarhatî ya sînordar” û ji aliyê Trim ve jî “ji bo rewşên asayî bersiva guncan” hatîye îfadekirin yanî wekî asteka bilindtir a asta şêmîkê ye.

**Asta Xweser an jî Qabilîyeta Bikarhatî ya Rastî (Effective Operational Proficiency)** ji aliyê Trîm ve wekî “qabilîyeta çalak” hatîye pêşkêşkirin û lê li gor Wilkins wekî, ji bo çalakîyên gelemşeyî yan jî li gor lêkolîn pêk werin ra yanî ev ast dengî qabilîyeta bilind tê.

**Asta Hostatîyê (Mastery)** (Trîm: “hostatîya yekeyî”; Wilkins: “qabilîyeta giştî ya bikêrhatî”) di nav şeş astan da ya herî bilind e. Ew kesên di zimanî da profesyonel, digihêjin vir û herweha asta navçandîya herî bilind jî beşdarî vir dibe. (Avrupa Konseyî, 2001).

Astên ku di metna ewil da hatine destnîşankirin. (Di guherîna 2020anda asta pêş-A1ê lê hatîye zêde kirin.)

A	B	C
Asta Bikarhênerê Bingehîn (destpêk)	Asta Bikarhênerê Navberê (navîn)	Asta Bikarhênerê Pêşketî (bilind)
<b>A1</b> Destpêk an jî Keşif <b>A2</b> Pêdiviyên Navber an jî Bingehî	<b>B1</b> Asta Şêmîkî <b>B2</b> Pêşdaçûyî an jî Serbixwe	<b>C1</b> Xweser <b>C2</b> Hostatî

**Tablo 1** (Avrupa Koseyi, 2001).

<b>A</b> Bikaranîna Bingehîn a Zimanî	A1 Asta Naskirina Zimanî A2 Asta Navberê
<b>B</b> Bikaranîna Serbixwe ya Zimanî	B1 Asta Şêmîkî B2 Asta Pêşketî
<b>C</b> Bikaranîna Gihîştî ya Zimanî	C1 Asta Xweser C2 Asta Axiverê Gihîştî

**Tablo 2** (Avrupa Koseyi, 2001).

Di Porfolyoya Ziman a Ewropayê da 6 Ast (A1-A2-B1-B2-C1-C2) hene.

Tablo 2. Tabloya li jêr bi navê “Pîvanga Kûrewî” (Global Scale) tê binavkirin.

BIKARHÊNERÊ BINGEHÎN	A1	Ew kesên ku bi wan ra (yên ku ziman hîn dibin) diaxivin heke fambar û hêdî biaxivin û hwd. heke ji alikariyê ra amade bin, ew dikarin bi awayekî hêsan bi wan re bidin û bistînin.
		Dikare xwe yan jî hin kesên din bide nasandin. Divê çarçoveyê da ew li ku derê rûdine, kê nas dike, xwedîtîyên wî yê tiştan û hwd. dikare bi rêya hin pirsên bingehîn bide û bistîne.
		Ji bo ku pêdivîyên xwe yê şênber bi cih bîne, îfadeyên rojane û biwêjên pêwîst û bingehîn dikare fam bike û bi kar bîne.
		Dikare bi zimanekî hêsan behsa paşeroja xwe û derûdora xwe ya nêzîk bike. Herweha dikare pêdivîyên xwe yê demkî pêk bîne.
	A2	Dikare bi ragihandineka hêsan di mijarên ku dizane yan jî yê ku hinî wan bûye danûstandinê bike.
		Dikare hevok û biwêjên bingehîn ên ku gelek caran li ser şexsê xwe, malbat, danûstandinê, kar û derûdorên nêzîk tene bikaranîn, fam bike.
Dikare bûyer û serpêhatîyên ku jiyaye ragihîne; dikare behsa xewn, hêvî û daxwazên xwe bike; bi kurtî dîtî û planên xwe bi sedemên wan dikare vebêje.		
	Dikare bi rêya mijarên ku bala wî dikişîne, mijarên ku dizane bi hêsanî û bi danûstandina fikran bi metna ku pêwendî pê ra danîye xwe îfade bike.	
BIKARHÊNERÊ SERBIXWE	B1	Di dema rêwîtiyê da, cihê ku ziman lê tê axiftin, dikare gelek rewşan bi rê ve bibe. Dikare rêzikên sereke yê bêjeyên nivîskî û axiftinê yê li ser bingeha mijarên hevpar û nas di jiyana rojane da, li kar an jî li dibistanê fam bike.
		Dikare xwe bi awayekî berfireh û têgihîştî di mijarên cuda cuda da îfade bike û dikare li gor nêrîna xwe di derheqê mijarekê da fikrên xwe yê erênî yan jî neyînî îfade bike.
	B2	Dikare bi zimanekî xwezayî û rewan, bêyî ku zor û zehmetîyê bikişîne, bi kesekî axiverê zimanê zikmakî ra têkilîye dayne.
		Dikare fikra bingehîn a metnê tevlihev ên ku li ser mijarên razber û berbiçav tene damezrandin fam bike û dikare li ser mijarên di warê pîsporîya xwe da niqaşên teknîkî bike.
		Dikare di mijerên tevlihev, yê ku baş hatine vesazkirin û têkilîyên wan baş hatine dayîn û herweha yê ku bi hûrgilî hatine saz kirin da, xwe îfade bike.

BIKARHÊNERÊ GIHÎŞTÎ	C1	Dikare ziman bi nermî û bi bandorî ji bo armancên akademîk û pîşeyî û di jîyana rojane da bi kar bîne.
		Dikare xwe bi awayekî xwezayî û herikbar îfade bike, bêjeyên ku jê ra pêwîst in bêyî zehmetîyeka zêde bikişîne, dikare bibîne.
		Dikare metnên direj û tevlihev ên bi avahîyên cihê fam bike û di wan nivîsan da îfade û wateyên nerasterast nas bike.
	C2	Dikare xwe bi giştî bi zimanekî rewan îfade bike. Dema ku xwe îfade dike, di rewşên tevlihev da jî dikare ji cudahîyên biçûk di wateyê da sûd wergire.
		Dikare agahîyên ku ji çavkanîyên cuda yên nivîskî yan jî yên devkî bi dest xistine kurt bike, li ser wan çavkanîyan nîqaşekê ava bike û wan bi awayekî herikbar û xwezayî pêşkêş bike.
		Ew bi hêsanî dikare her tiştê ku dibihîze û dixwîne fam bike.

**Tablo 3** (://www.coe.int/en/web/common-european-framework-reference-languages-uses-and-objectives)

## 2. Ji bo Kurdîya Kurmancî Adaptekirina CEFRê

Wekî me li jor jî destnîşan kiribû, CEFR piştî ku kete rojevê, gelên Ewropayê û pêkhate û şopînerên Ewropayê ev Metna Çarçove wekî standardekê pejirandin.

Bêgûman ev çarçove hem ji bo hînberan û hem hî ji bo mamoste û pêşkêşvanên azmûnê derfeta standardekê dide. Loma jî êdî gelek netewe di dema hînkirina zimanê xwe da wekî zimanê bîyanî CEFRê bi kar tînin. Mînak: Ji hêla erdnîgarîyê ve, zimanê tirkî yek ji zimanên herî nêzî kurdî ye, di hînkirina wê da jî CEFR çavkanîyeka bingehîn e û herweha ew hîn jî hewl didin ku xwe bigihînin asta CEFRê, îcar ji bo adaptasyonê bêgûman hewcedarîyeka mezin pê heye ku divê CEFR baş bê famkirin. Ji bo ku di kurdîya kurmancî da jî ev yek pêk bê divê CEFR baş bê famkirin û di bin sernavê da çar şîyanên ku hatîne dayîn (guhdarîkirin, axiftin, nivîsîn û xwendin) divê destkeftîyên wan baş bê analîzkirin. Ji bo wê jî bêgûman hewcedarîya me bi çalakî û rahênanan heye da ku mijar baş bê famkirin. Yalçin tîne ziman ku, piştî van çalakîyan heke xwendevan bikaribe tiştên ku di pêvajoya hînbûnê da bi dest xistîye di jîyana xwe ya rojane da bi kar bîne em ê bizanibin ku ew bi serkeftî ye. (Yalçin, 2006). Loma jî adaptasyona CEFRê dê bi rehênan û çalakîyan pêk bê, herweha piştî van rahênan û çalakîyan dê di her qonaxê da nirxandinek û piştî hemû pêvajoyê nirxandineka giştî çê bibe da ku hem xwendevan û hem jî hînkere rewşa xwe bizanibe.

### 2.1. Li Gor CEFRê Şîyana Xwendinê û Destkeftîyên Wê

Di CEFRê da şîyana xwendinê û ya guhdarîkirinê ji ber ku her du jî şîyanên standinê/têgihîştinê ne di bin banê wergirtin-pejirandinê (reception) da hatine dayîn.

“Di Metna Çarçove ya 2020an da “xwendin û guhdarîkirin” bi awayekî du şaxî hatîye hildan.” (Aytañ, yd. 2021). Şîyana xwendinê di bin van şaxan da jî bi şeş sernavan hatîye dabeşkirin. Armanca dabeşkirinê jiber ku têgihîştina xwendinê divê bi awayekî ku hem nivîsên nivîskî û hem jî metnên zimanê îşaretî dihewîne li ser bê sekinîn. Herweha xwendin bi çend awayan pêk tê ku ew ji aliyê mebest û armancê guherîn û rêbazên cuda hewce dike.

Ji aliyê mebest û armancê ve, cudahîyek di navbera “xwendin, ji bo ku bibe xwedî fikir” û “xwendin, ji bo zanînê” da heye. “Şîyana xwedî fikirbûnê” carinan wekî xwendina lêgerînê tê binavkirin ku ew jî bi du dirûvan pêk tê: yek jê ji bo biryardayîna xwendina metnekê, (perçeyên metnekê) xwendina zû ya “çepûrast” (=“çavlêgerandin” (skimming)) ya din jî ji bo tiştêkî bi taybetî –bi piranî zanîneka biçûkbigere, li metin zûbizû çavgerandin (=“têgerîn” (scanning)). Îcar “xwendin ji bo zanîn û dozînê” xwendina tarîfên wekî trê û otobusê ne, lê belê carinan hin kes metneka dirêj ê pexşanî ji bo ku tiştêkî taybetî tê da bibîne sehî dike/kontrol dike. Ji bilî vê, ferqeka mezin di navbera “xwendin ji bo zanîn û dozînê” û “xwendin wekî çalakîya demeka serbest” da heye. “xwendin wekî çalakîya demeka serbest” dikare metnên ku ne pevxistî bin di xwe da bihewîne lê ne mecbûre ku metnên edebî bin. Herweha kovaran, rojnameyan, blogan, biyografiyan û hwd. bi ihtîmalekê ew metnên ku bala wî bikişîne û yên ji bo kar û perwerdeyê dê bihewîne. Wekî ya dawî cûreyên xwendinê yên taybetî, wekî ku ji bo zanînê xwendin (xwendina dîrektîfan) he ne. Wekî wê “xwendina pevnivîsê” jî cuda ye. Ji ber ku her pîvek di kategoriyan da ji bo bikaranîna ziman a navbera kesan da dest pê dike, di pileya ewil da tê pêşkêşkirin. “Wekî çalakîyeka wextê serbest xwendin” ji ber ku di 2018an da hatîye lêzêdekirin di dawîya listeyê da cih standîye (Avrupa Konseyi, 2020).

## 2.2 Şîyana Xwendinê

Hînkirina zimanî bi guhdarîkirinê dest pê dike û bi şîyanên din jî dewam dike ku yek ji wan jî xwendine. “Xwendin erka têngihîştina sembolên taybetî ên ku mirovan berê li ser wan lihevkerine û nirxandina wan a bi rêya organên sehek tê têngihîştin û bi rêya mejîyê jî tê şirovekirin.” (Yalçın, 2006: 47). Xwendin bi şîyanên din ra jî têngildar e lê xwendin û guhdarîkirin ji hêlekê ve pir dişibin hev ku di CEFRê da di bin navê “têngihîştinê” da hatine dayîn. “Hînkirina zimanî ji çar beşên bingehîn ên fêrbûnê pêk tê: xwendin, guhdarîkirin, axiftin û nivîsandin. Gengaz e ku mirov van çar şîyanên zimanî yên bingehîn bi du şîyanên sereke ve girê bide: famkirin û ravekirin. Xwendin û guhdarîkirin di bin şîyana têngihîştinê da ne, axiftin û nivîsandin jî di bin şîyana vegotinê da ne.” (Yılmaz, 2019: 9). Di dema xwendin û guhdarîkirinê da xwendevan neçalak e. Lewra ew distîne lê di yên din da xwendevan çalak e, ji ber ku ew dide. “CEFRa 2018an şîyana xwendinê di bin sernavê “Çalakîyên Têngihîştinê” da dide. “Çalakîyên Têngihîştinê bi xwendin û guhdarîkirinê wekî du beşan ji hev diqetîne. Di CEFRa 2018an da şîyana xwendinê li ser pênc kategoriyan dabeş dibe: Xwendin, famkirina pevnivîsan, xwendin ji bo bidestxistina fikir, ji bo zanîn û dozînê xwendin, xwendina rêbernameyan, xwendina wexteke serbest. Ji çapa berîya 2018an CEFR astên zimanî jî C2ê kişand ber bi Pre A1/A0ê. Lê bi piranî pênaseyên vê astê tune ne.” (Çelik & Başutku, 2020: 111). Îcar ku bê vekolîn bê ka şîyana xwendinê çi ye û di hînbûnê da rola xwe çi ye: “Xwendin ji tevgerên cihêreng ên pênc hestan û hewldana hiş ji bo têngihîştina wateyê pêk tê. Ew çalakîyeka tevlihev e. Bi gelemperî, 1% ya ku em fêr dibin tamkirin û 1.5%. destdan, 3,5% bîn, 11% bihîstin, 83% ditin e. Li gor van encaman, xwendina ku xîtabî guh û çav dike, di hînbûnê da pareka xwe ya giring heye ku 94% e” (Arıcı & Taşkın, 2019: 187). Helbet şîyanên din jî di hînbûnê da roleka mezin dilîzin lê xwendin ji hêla analîzkirinê wextekî fireh dide mirov ku ji vê hêlê jî dişibe nivîsê. Şîyana xwendinê jî wekî şîyanên din divê birêkûpêk bê dayîn da ku xwendin baş bê famkirin loma em hînkirina xwendinê jî di nav xwe da dabeş dikin. Ku ew dabeşbûyîn di CEFRê da bi hurgilî hatîye qalkirin. Şîyana xwendinê her çend di bin wergirtin/pejirandinê da hatibe dayîn jî ew şîyanên din jî bandor dike loma ew dîsa şîyaneka çalak e. Divê yê ku ziman hîn dibe di vê şîyanê da serkeftî be da ku şîyanên din jî baş fam bike. “Xwendin, pêvajoyeka fikirinê ya bi zanebûn û bê zanebûn e. Gava xwendekar an jî xwendevan tiştêkî dixwînin, ji bona ku bikaribin peyama ku nivîskar daye bigirin gelek stratejîyê xwendinê bikar tînin. Ji bona vê hewldanê jî ew bi gelemperî agahî û zanebûna ku di deqê da cih digire bi zanîna paşxaneyê xwe û tecrûbeyên berê ra didin ber hev. Wekî baş tê zanîn, tiştê ewil ku tê heşê mirov di pêvajoya xwendinê da, bi saya xwendinê peyvê ku mirov dizane zêde dibin û famkirina hevokan çêtir dibe.” (Geyik, 2020: 123). Wekî ku Geyik jî di pênaseya xwe da diyar dike xwendevan di dema xwendinê da rastî gelek peyv û



hevokên nû tê, ev yek jî bandorê li ser her çar şîyanan dike û pê ra jî wekî şîyaneka din têgihîştinê jî xurt dike. “Deqên xwendinê di heman demê da ji bona hînbûna nivîsê jî modelên baş in. Dema ku em yekî hîne xwendinê dikin, hewce ye ku em gelek deqan peşkeşî xwendekaran bikin da ku gelek mijar bi awayekî xwezayî di hişê xwendekaran da cih bigirin.” (Geyik, 2016: 74). Bi vê yekê ra xwendin ne çalakîyeka ku ji xweber bê kirin e. Hem bi serê xwe xwendin û hem jî wekî çalakî û rahênan xwendin, divê li gor sistemekê bê kirin da ku em jê sûd wergerin.

#### 2.4. Asta Pêş A1ê Çi ye? (Pre A1)

Di çapa ewil a CEFRê da (2001) şeş astên zimanî hebûn piştî 2018an ev ast guherîn, di çapa temamker a 2020an da lê hate zêdekirin ku ew jî asta Pêş A1ê bû. Asta Pêş A1ê xwendavanê ku hîne ziman dibe amadeyî hînkirina zimanî dike. Çimkî hînbûna zimanî pêvajoyeka ku jê ra motîvasyon, hayjêbûn û hwd. faktor pêwîst in.

“Asta Pêş A1ê, temsîla ku xwendevan hîne negihîştîye zerengîya (kapasîte) afirandinê lêbelê Asta A1ê şemîka famkirina peyv û îfadeyên ku zêde nas in. Di serê Ji bo Zimanên Ewropî Metna Çarçove ya Hevpar 2001ê da, di bin A1ê da behsa hebûna besayîyekê hatîye kirin. Di vir da, di projeya lêkolînê ya Weqfa Zanista Neteweyî ya Swîsrê (SNSF) ku mînakên pênasayan çê dikin da, listeyeka di derbareyê standardeka pênasakirî ya di bin A1ê da hatîye dayîn. Wekî ku projeyên ku li ser astên jêr hûr dibin jî piştrast dikin, pênasayeka berfireh A1ê û lêzêdekirina wê ji bo bikarhêneran giring bû. Ji ber vê yekê di piranîya pîvekan da bendeka besayî ya ku bi navê Pêş A1ê tê bi nav kirin cih digire.” (Avrupa Konseyi, 2020).

#### 2.5. Li Gor Destkeftinên Şîyana Xwendinê ya Pêş A1ê Çalakî/Rahênan

Wekî ku tê zanîn di hînbûn an hînkirina zimananî da, çar şîyan derdikevin pêşberî me. Ji van çar şîyanan dudu xwe îfadekirine û dudu jî têgihîştin bûn. Yê xwe îfadekirinê, şîyanên axiftin û nivîsandinê ne û yê tegihîştinê jî, xwendin û guhdarîkirin e. Li gor destkeftiyên şîyana xwendinê ya ku di CEFRê da hatîye pejirandin û pêşniyazkirin em ê bi rahênan/çalakîyan saz bikin. Di dema sazkirina van rahênan û çalakîyan da em ê ewil destkeftiyê pey ra vegotina wê bidin. Paşê em ê çalakîya xwe saz bikin bi ser destkeftiyê da û vegotina çalakîyê û armanca çalakîyê jî dê bê dayîn. Di dawiyê da listeya îfade û peyvên ku dê bîne hînkirin di çalakîyê da, wê bîne dayîn.

#### 2.6. Li Gor CEFRê Rahênan/Çalakî ji bo Destkeftiyên Xwendinê yê di Asta Pêş A1ê da

Di vê beşê da me adaptekirina destkeftiyên asta Pêş A1ê li gor CEFRê çê kirin. Li jor jî me behs kiribû ku di bin beşa Wergirtinê/Pejirandinê da şîyana xwendinê dabeş dibe. Ew jî di bin şeş binavan da ji hev cuda dibe. Di vê beşê da jî li gor destkeftiyên Pêş A1ê yê di bin van navan da me çalakî/rahênan çê kirin ku mebest jî ew bû bi rêya wan adaptekirine em pêk bînin. Di bin van binavan da tenê ji bo “Wekî Çalakîyeka Wextê Serbest Xwendinê”ê destkeftî nehatine dayîn loma jî me ji bo vê binavê çalakî/rahênan çê nekirin.

##### 2.6.1. Têgihîştina Xwendina Giştî

**Destkeftî:** “Dikare peyv/nîşanan bi wêneyan nas bike, wekî mînak: menuya xwaringehê yan pirtûkeka wêneyî ya bi peyvên naskirî.” (Avrupa Konseyi, 2020)

**Vegotina destkeftiyê:** Ew kesê ku di asta Pêş A1ê da be, divê bikaribe bi alîkarîya wêneyan, peyv an jî îşaretan binase. Ji ber ku di nav astan da ya ewilê (piştî cilda 2020an ku hate revîzekirin) jî xwendevan tê xwastin ku bikaribe peyv bi rêya wêneyan binase, ku bingehekê ji bo asta bê çê bike. Di vê astê da peyvên ku xwendevan wê zêde merûzê wan bimîne, tê hînkirin. Wekî ku di destkeftiyê da

jî hatîye vegotin em dikarin mînaka xwaringeh, dibistan, nexweşxane û hwd. ya baş jî ji ber ku wêne ji bo vê destkeftîyê giring e menûyên xwaringehê an jî katalog wê bi kêrî me bîn.




### Çalakî 1

**Vegotina çalakîyê:** Kesekî ku di asta Pêş A1ê da be divê destkeftîya “Dikare peyvan/nîşanan bi wêneyan ve nas bike, wekî mînak: menûya xwaringehê an pirtûkeka wêneyî ya bi peyvên naskirî.” Bikaribe bi cih bîne, ne ku di vê astê da ji xwendevan famkirineka jorî vê destkeftîyê bê xwastin. Ew anca divê bikaribe bi rêya wêneyan îşaret û peyvan binase.

**Armanca çalakîyê:** bi rêya vê çalakîyê bikarhêner/xwendevan dê bikaribe peyvan û îşaretan bi alîkarîya wêneyan nas bike û wan hêdî hêdî di xwe da bihewîne ji bo astên din. Yanî wekî amadehîyekê yan jî şîyarkirina zanînên berê. Ew ê êdî bikaribe peyvên di menûyeka xwaringehê yan jî yên di katalogên ku peyvên zêde tînan bikaranîn nas bike.

### Di Menûyê da Çi Heye?

Divê çalakîya jêr weha bê çêkirin. (mînak: A1, B2 û hwd.)

A) Goşt 1		C) Av 3	
B) Masî 2		D) Nan 4	

1) **Peyvên ku we bihîstin bi wêneyan ra hevcot bikin.**

- A \_\_\_\_\_  
 B \_\_\_\_\_  
 C \_\_\_\_\_  
 D \_\_\_\_\_

**Lîsteya îfade û peyvan:** Nan, av, goşt, masî.

### 2.6.2. Xwendina Pevnivîsan

**Destkeftî:** “Ji nameyek, kart an e-nameyê, ew dikare bûyera ku ew vexwendîye û agahdarîya li ser roj, dem û cihê hatî dayîn fam bike.” (Avrupa Konseyî, 2020)

**Vegotina Destkeftîyê:** Ji bo kesê ku gihîştibe asta Pêş A1ê pêwîste ku ew dem û wextan bi şertê ku jê ra nas be, bizanibe. Loma jî destkeftîya “Ji nameyek, kart an e-nameyê, ew dikare bûyera ku ew vexwendîye û agahdarîya li ser roj, dem û cihê hatî dayîn fam bike.” Dê bike ku xwendevan di kar û barên xwe yê rojane da dem û wextên sereke bizanibe û fam bike.





#### Çalakî 2

**Vegotina çalakîyê:** Di vê çalakîyê da li gor destkeftîya “Ji nameyek, kart an e-nameyê, ew dikare bûyera ku ew vexwendîye û agahdarîya li ser roj, dem û cihê hatî dayîn fam bike.” wê xwendevan bi awayekî pir hêsan bikaribe hejmaran û pê ra jî telifûza saetan bêje. Di vê çalakîyê da wê xwendevan saeta ku şaş hatîye dayîn bibîne û îşaret bike. Lê piştî ku ya şaş dît dê yê rast jî bilêv bike.

**Armanca çalakîyê:** Ji ber ku ev ast, hêsanî û aramîyê dixwaze divê xwendevan pir kêm xwe pê ra mijûl bike loma jî me xwast ku di vê çalakîyê da ew ji bo dem û saetan bikaribe yê sereke bilêv bike, bizanibe. Mebest ew e ku xwendevanê di vê astê da bikaribe bibêje saet 9. 10 deqîqe ye, loma jî ev çalakî dê ve yekê pêk bîne.

#### Kîjan Saet Xelet e?

Dê çalakîya li jêr wisa bê çêkirin. (Mînak: Saeta 1,2 hwd. şaş e.)

1) Saet 12.05 deqîqe ye?		3) Saet 15.45 deqîqe ye?	
2) Saet 10.45 deqîqe ye?		4) Saet 7.00 e?	

Lîsteya îfade û peyvan: Dem, saet, deqîqe.

1) Saetên ku we guhdarî kir li gor wêneyê heke şaş be “şaş” û heke rast be “rast” îşaret bikin.

	Rast	Şaş
1) Saet 12.05 deqîqe ye?		
2) Saet 10.45 deqîqe ye?		
3) Saet 15.45 deqîqe ye?		
4) Saet 7.00 e?		

### 2.6.3. Ji Bo Bidestxistina Fikrê Xwendin

**Destkeftî:** “Dikare îşaretên rojane yê hêsan ên wekî “Park”, “Stasyon”, “Qafeterya”, “Cixare Qedexe” fam bike.” (Avrupa Konseyi, 2020)

**Vegotina destkeftîyê:** Xwendevan di çûyin û hatinê xwe yî rojane da dê li hin hişyardeyan rast bê ew jî bi piranî wekî ku di destkeftîyê da jî hatîye vegotin wê wekî “park, stasyon, cixare qedexe ye û hwd.” be. Îcar ew kesê ku di asta Pêş A1ê da be dikare van simbol û hişyardeyan fam bike.

### Çalakî 3





**Vegotina çalakîyê:** Di vê çalakîyê da xwendevan dê li gor destkeftîya “Dikare îşaretên rojane yê hêsan ên wekî “Park”, “Stasyon”, “Qafeterya”, “Cixare Qedexe” fam bike.” Dê deverên ku rojane rastî wan tê yan jî merûz dimîne bi liv û tevgeran vebêje. Yanî di vê çalakîyê da ji hêla dramayê ve jî wê bikaribe xwe vebije an jî deverên muhîm binase.

**Armanca çalakîyê:** Armanca vê çalakîyê ew e ku xwendevan bi rêya hin liv û tevgeran cih û deverên ku zêde rastî wan tî û simbolên ku wekî qeydên civakî ne binase.

### Min Pênase Bike!

Dê çalakîya li jêr wisa bê çêkirin: ( Xwendevan dê ji mamoste yan jî ji hînkêrê xwe ra bi rêya jest û mîmîkan cih û deveran bide pênasekirin û di heman demê da qeydên ku hatine simbolîzekirin jî wê wisa bide pênasekirin di dawîyê da wê van îşaretan bilêv bike mînak:

cixare kişandin qedexe ye!)

1)		3)	
2)		4)	

**Lîsteya îfade û peyvên:** Destşok, qedexe, xwaringeh.

### 2.6.4. Ji bo Zanîn û Dozînê Xwendin

**Destkeftî:** “Dikare ji materyalê agahdar ê herî hêsan, wekî menuya xwaringehêk wêneyî ya ku xwarina bilez difroşe yan çîrokên wêneyî bi peyvên rojane/nîşanên pir hêsan ên rojane fam bike.” (Avrupa Konseyi, 2020)

**Vegotina destkeftîyê:** Dê xwendevan di vê destkeftîyê da materyalên ku zanînê didin, yê wekî “menûya xwarinê hazir, çîrokên wêneyî û hwd.” fam bike. Di heman demê da wê bikaribe yê di hundirê wan da ne jî pênase bike.





#### Çalakî 4

**Vegotina çalakîyê:** Di vê çalakîyê da çend wêneyên ku tê da hest hene, hatine dayîn. Li gor destkeftîya “Dikare ji materyalê agahdar ê herî hêsan, wekî menuya xwaringehêk wêneyî ya ku xwarina bilez difroşe an çîrokên wêneyî bi peyvên rojane/nîşanên pir hêsan ên rojane fam bike.” Wê çîrokê fam bike. Ev çar sembolên ku hestan di xwe da dihewînin bi çend hevokên kurt wekî çîrokekê hatîye dayîn, divê xwendevan van hevokan binase û li gor wêneyan hevçot bike.

**Armanca çalakîyê:** Armanca vê çalakîyê ew e ku xwendevan bi rêya hin wêneyan hestan fam bike. Lê mebest ew e ku çîrokek ku bi hevokên kurt û wêneyan hatîye çêkirin ji hêla xwendevan va bê famkirin.

#### Çîrokek Dixwînim

Dê çalakîya li jêr wisa bê çêkirin. (mînak: 1 û 2 divê cih biguherin.)

1) Zana hêrs e.		3) Zana kêfxweş e.	
2) Zana kelegirî ye.		4) Zana matmayî ye.	

#### 1) Divê kîjan sûret cih biguherin?

**Lîsteya îfade û peyvan:** Ken, girî, matmayîn, hêrs.

#### 2.6.5. Xwendina Rêbernameyan

**Destkeftî:** “Dikare rêwerzên pir kurt û hêsan fam bike (mînak, Park kirin nabe!, Xwarin û vexwarin tune!) ku di çarçoveyek rojane ya naskirî da têne bikaranîn, nemaze heke wêne hebin.” (Avrupa Konseyi, 2020)

**Vegotina Destkeftîyê:** Ev destkeftî ji bo kesê di asta Pêş A1ê da be, divê rêwerzên kurt fam bike û bertekê bide wan hatîye dayîn.

#### Çalakî 5

**Vegotina çalakîyê:** Di vê çalakîyê da, li gor destkeftîyê çend wêne û hevokên kurt û tevlihev hatine dayîn. Dê xwendevan van hevok û îşaretan bide serhev. Kîjan kîjanê dihewîne wê dîyar bike.

**Armanca çalakîyê:** Bi vê çalakîyê ra dê destkeftîya “Dikare rêwerzên pir kurt û hêsan fam bike (mînak, Park kirin nabe!, Xwarin û vexwarin tune!) ku di çarçoveyeke rojane ya naskirî da têne bikaranîn, nemaze heke wêne hebin.” Ji alîyê xwendevan wê were famkirin. Herweha dê xwendevan êdî rêwerzên kurt û hêsan bi rehetî bikarbîne.

### Min Fam Bike

Ev çalakî divê wisa bê çêkirin. (mînak 1/A, 2/B hwd.)



1) Rêwerzên ku we guhdarî kirin bi simbolên wan re hev cot bikin.

- 1 \_\_\_\_\_
- 2 \_\_\_\_\_
- 3 \_\_\_\_\_
- 4 \_\_\_\_\_

**Lîsteya îfade û peyvan:** Deng, xwarin-vexwarin.

### 2.6.6. Wekî Çalakîyeka Wextê Serbest Xwendin

Ji bo sernavê “Wekî Çalakîyeka Wextê Serbest Xwendin” destkeftîya Pêş A1ê nehatîye dayîn. Ev jî tê wateya ku di dema hînkirinê da dikare ji yên din sûd were hilgirtin.

### ENCAM

Cîhana ku em tê da dijîn ji bo hemû zîndeweran pêwîstîya ragihandinê divê, ji bo wê jî ziman amûreka girîng e. Loma jî li gelek deverên cihêreng li rê û rêbazên bikêrhatî yên hînkirina zimanî tê gerîn. Sazîyeka wekî Konseya Ewropayê bi navê “Ji bo Zimanan Ewropî Metna Çarçove ya Hevpar (CEFR)” saz kir. Bi vê metnê Ewropayê hewl da ku di hînkirina zimanî da konsensûsek ava bibe. Endam û şopînerên Ewropayê jî di heman demê da xwe li gor vê metna ku hatîye amadekirin, revîze kir. Metin û şîyanên ku ast bi ast li gor destkeftîyan hatîye amadekirin hêsanî û rehetîyek da wan kesên ku vî karî dikin. Me jî dît ku di vê qadê yanî li gor rêgezên Metna Çarçove, ji bo kurdîya kurmancî

xebatek pêk nehatîye. Loma jî hewcedariyeka wisa ji bo zimanê kurdîya kurmancî jî hate dîtin. Di serî da metin hate pênasekirin û bi pey ra jî şîyana xwendinê bi tevî hemû astên xwe li gor destkeftîyan hate vegotin di dawîyê da jî li gor destkeftîyên asta Pêş A1ê rahênan/çalakî hatin amadekirin. Jiber ku îmkânên tetbîqê nîn bûn, ji bo van çalakîyên ku hatin çêkirin; nêrînên mamosteyên ku di qada kurdîya kurmancî da dixebitin hate standin. Li gor nêrînên mamosteyan kemasî hatin temamkirin û çalakî hatin sererastkirin.

Ji bo vê xebatê armanca sereke ew bû ku Metna Çarçove (CEFR) bê nasandin û ji bo adaptasyona wê pêşniyazek bê kirin. Lewma jî pênasekirina Metna Çarçove, şîyana xwendinê, destkeftîyên şîyana xwendinê têgehên sereke yên vê xebatê bûn. Herweha çalakîyên ku hatin çêkirin jî ji bo bikarhênerên ku wê Metna Çarçove bi kar bînin wekî nimûneyekê hatin dayîn. Dîsa ev xebata ku me pêk anî dê ji bo hînkêrên kurdîya kurmancî bibe pêngaveka ku hînkirina kurdîya kurmancî ji hêla hînkirinê û ji hêla materyalan ve li gor standardên Ewropayê pêk bînin û ji bo bîyanîyan di hînkirina kurdî da gaveka teze bê avêtin; yên ku di vê qadê da dixebitin jî dê ji wan ra di hînkirina zimanî da wekî rêbazekî wê bibe pêşniyazek.

## EXTENDED ABSTRACT

### The aims of the study

The aim of this study is to develop a teaching material for foreigners in teaching Kurmanji Kurdish. Also, practicing the reading skill at Pre-A1 level is another aim of this study. These outlined objectives will be complemented by the introduction of the CEFR.

### Study questions

Are there teaching materials for foreigners to teach Kurmanji Kurdish?

Is it possible to apply the European language education system to Kurmanji Kurdish?

These two questions are the main questions of our work. Among these questions, the adaptation and introduction of the CEFR and the European language education system will also be defined. A basic research method was designed for the study. This method was chosen because our work is about designing language teaching materials.

### Literature review

When we look at the literature of this work, we see that teaching materials have been prepared for bilingualism and Kurdish. In addition, courses and institutions that provide language education in Turkey mainly provide education and produce materials for bilinguals and Kurdish people. Although foreigners find language education in these courses, materials and methods have not been prepared directly for them. Mentioned in the literature are a number of individual institutions, courses and studies working on the teaching of Kurmanji Kurdish. Şahmus Kurt and Resul Geyik are also working on Kurmanji Kurdish materials and teaching Kurmanji Kurdish.

### Conclusion and evaluations

Our work is to design an educational material in Kurmanji Kurdish. So we didn't try to do anything to implement it. I mean, there was no one to implement the language levels of the CEFR. So we made our work as a material and recommended it to Kurmanji Kurdish language educators. Our work is mainly on the Framework Text (CEFR). The context text is a text for teaching and disseminating the language of European culture. This framework has been adopted and used as a linguistic system in many states. We tried to introduce this Framework to foreigners and adapt it as an experiment, so we chose the Pre-A1 level. After determining the study skill outcomes at Pre-A1 level, it was adapted to Kurmanji Kurdish through activities and trainings. In addition, the Framework Text was introduced and the reading ability of the text was adapted.



## Çavkanî

- Aksan, D. (2003). *Dil Şu Büyüklü Düzen*. Ankara: Bilgi Yayınevi.
- Arıcı, A. F., & Taşkın, Y. (2019). Okuma Becerisinin Diğer Dil Becerileriyle İlişkisi. *International Journal of Field*, 185-194.
- Avrupa Konseyi. (2001). *Diller için Avrupa Ortak Başvuru Metni Öğrenme, Öğretme, Değerlendirme*. (M. E. Bakanlığı, Wer.). Cambridge University Press.
- Avrupa Konseyi. (2020). *Diller İçin Avrupa Ortak Başvuru Metni: Öğrenme, Öğretme Ve Değerlendirme*. (M. E. Bakanlığı, Wer.). Strasbourg: Avrupa Konseyi.
- Aytan, T., Göksel, A. & Günaydın, Y. (2021). 2020 Diller için Avrupa Ortak Çerçeve Metni'inde (CEFR) Dinleme Becerisi: Ölçekler ve Kazanımlar. *Journal of History School*, 51, 1192-1220.
- Çelik, N., & Başutku, S. (2020). 2018 (CEFR) Diller için Avrupa Ortak Öneriler Çerçevesi Yeni Açıklamalar Metninde Okuma Becerisine Yönelik İncelemeler. *TÖMER*, 91-118.
- Demirdöven, G. H. (2021, 10 20). 20- 2020 Avrupa Ortak Öneriler Çerçevesi (CEFR) metninde bulunan dilbilgisel yeterliklerin incelenmesi. *RumeliDE Dil ve Edebiyat Araştırmaları Dergisi*, (Ö10), 339-351. DOI: 10.29000/rumelide.1011952. , ra. 339-351.
- Deniz, K., & Uysal, B. (2010). Avrupa Dilleri Öğretimi Ortak Çerçeve Metni Ve Yurt Dışındaki Türk Çocukları İçin Türkçe ve Türk Kültürü Öğretim Programı. *Türklük Bilimi Araştırma Dergisi*(27), 239-261.
- Geyik, R. (2016). *Hinkirina Kurdî Wekî Zimanê Yekem (Ewil)*. Teza Lisansa Bilind. Wan: ZYY. Enstîtuya Zimanên Zindî Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî
- Geyik, R. (2020). *Teoriya Hinkirina Kurdî-Kurmancî*. Ankara: Weşanxaneyê Azad.
- Kartal, M. û Yeşil, Y. (2021). Avrupa Dilleri Öğretimi Ortak Çerçeve Metni Doğrultusunda A1-A2 Düzeyinde Kelime Hazinesi Geliştirmeye Yönelik Bulmaca Örneği. *21. Yüzyılda Eğitim ve Toplum / Education And Society In The 21st Century*, 10, 607-624.
- Mirici, İ. H. (2015). Yabancı Dil Öğretmeni Yetiştirmede Avrupa Politikaları ve Uygulamalar. *Hacettepe Üniversitesi Eğitim Fakültesi Dergisi*, 42-51.
- Polat, T. (2001). Avrupalılık Bağlamında Kültür Boyutuyla Yabancı Dil. *Alman Dili ve Edebiyatı Dergisi*, ra. 29-39.
- Seyhan, L. (2018). *Yabancılar Türkçe Öğretimi İçin Avrupa Ortak Öneriler Çerçevesindeki Bağlamlardan Hareketle Türkçenin Temel Söz Varlığının Belirlenmesi*. Yayımlanmış Yüksek Lisans Tezi. Konya: NEÜ. Eğitim Bilimleri Enstitüsü.
- Türk Amerikan Derneği. "Avrupa Dil Standardı". 10/02/2024. <http://www.bemkaegitim.com>.
- Yalçın, A. (2006). *Türkçe Öğretim Yöntemleri*. Ankara: Akçağ Yayınları.
- Yılmaz, C. (2019). *Avrupa Ortak Öneriler Çerçevesi Bağlamında Okuma Kazanımlarının (B1 Düzeyi) Ders Kitaplarındaki Görünümü*. Yüksek Lisans Tezi. Ankara: HÜ. Eğitim Bilimleri Enstitüsü.
- Yonat, M. (2021). Taybetiyên Însanan Yê Bêemsal. A. Kırkan, & M. Yonat, *Zimannasîya Kurdî* ( ra. 8-21). Van: Weşanên Peywend.
- Yücel, M. S. (2006). Avrupa Ortak Başvuru Metni - Avrupa Dil Portföyü Eleştirel Bir Yaklaşım. *Trakya Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi*, 8(1), 110-122.

## Ji Aliyê Wateyê ve Cureyên Risteyan: Bi Nimûneyên Ji Mem û Zînê

### Anlam Bakımından Cümle Çeşitleri: Mem û Zîn'den Örneklerle

Sentence Types in terms of Meaning: Examples from Mem û Zîn

Halil AKGÜL

Halil AKGÜL	Halil AKGÜL   <a href="https://orcid.org/0000-0003-1365-8461">https://orcid.org/0000-0003-1365-8461</a>   xelilakgul@gmail.com MA Candidate, Bingöl University, Institute of Living Languages in Türkiye, Department of Kurdish Language and Literature, Bingöl, Türkiye
<b>Jêgir</b> Citation Atf	Akgül, H. (2024). Ji Aliyê Wateyê ve Cureyên Risteyan: Bi Nimûneyên ji Mem û Zînê. <i>The Journal of Mesopotamian Studies</i> (16), 68-79 DOI: <a href="https://doi.org/10.35859/jms.2024.1437251">https://doi.org/10.35859/jms.2024.1437251</a> .
<b>Dîroka Şandinê</b> Submission Date Geliş tarihi	14.02.2024
<b>Dîroka Qebûlê</b> Acceptance Date Kabul Tarihi	27.03.2024
<b>Dîroka Weşandinê</b> Publication Date Yayın tarihi	30.03.2024
<b>Cureyê Gotarê</b> Article Type Makale Türü	<b>Gotara vekolinê</b> Research article Araştırma makalesi
<b>Hakemî</b> Peer-Review Hakemlik	<b>Cot Nenas - Du ji derve</b> Double anonymized - Two External Çift Taraflı Kör Hakemlik – İki hakem
<b>Beyana Etîk</b> Ethical Statement Etik Beyanı	<b>Hatîye beyankirin ku di pêkanîn û nivîsîna vê xebatê de hemû rêzîkên zanistî û etîk hatine şopandin û hemû çavkanî bi awayekî têkûz hatine referanskirin</b> It is declared that scientific and ethical principles have been followed while carrying out and writing this study and that all the sources used have been properly cited. Bu çalışma yapılırken ve yazılırken bilimsel ve etik ilkelere uyulduğu ve kullanılan tüm kaynaklara uygun şekilde atıfta bulunulduğu beyan edilir.
<b>Kontrola İntihalê</b> Plagiarism Checks Benzerlik Kontrolü	<b>Belê - iThenticate</b> Yes - iThenticate Evet - iThenticate
<b>Nakokiyên Berjewendiyan</b> Conflicts of Interest Çıkar Çatışması	<b>Di gotarê de di navbera nivîskar û ti aliyên din nakokîya berjewendiyê tune ye.</b> There is no conflict of interest between the author and any parties in the article. Yazar ile makalede yer alan taraflar arasında herhangi bir çıkar çatışması bulunmamaktadır.
<b>Alîkarîya Darayî</b> Grant Support Maddî Destek	<b>Nivîskar beyan dike ku wan wî ji bo vê vekolinê ti fonên derveyî wernegirtine.</b> The author(s) acknowledge that they received no external funding in support of this research. Yazar(lar), bu araştırmayı desteklemek için herhangi bir dış fon almadıklarını kabul etmektedirler.
Mafê Telifê & Destûr Copyright & License Telif Hakkı & Lisanslama	<b>Nivîskar li jer lîsansa CC BY-NC 4.0 mafê xwe yê li ser xebata xwe diparêzin.</b> Authors publishing in the journal retain the copyright to their work licensed under the <b>CC BY-NC 4.0</b> . Dergide yayın yapan yazarlar, <b>CC BY-NC 4.0</b> kapsamında lisanslanan çalışmalarının telif haklarını saklı tutarlar.

## KURTE

Ev gotar mijara “ji aliyê wateyê ve cureyên risteyan” vedikole. Riste ku yekeyên sereke yê bingehîn ên zimên in, di rahigandinê de bi roleke giring radibin. Riste, amûrên sereke ne ku ji bo derbirîna ramanan, agihandina agahiyên û veguhastina wateyê tîk bikaranîn. Lewra xebatên li ser curbicurî û wateyên risteyan giring in ji bo mirov fam bike bê ziman çawa dixebite. Di vê nivîsarê de em li ser binyad û fonksiyonên risteyên ji aliyê wateyê ve cuda dixebitin û mînakên wan ji *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî didin. Risteyên ku ji aliyê wateyê ve dikarin ji hev bîr cudakirin ev in: Risteya agihandinî (*declarative sentence*), risteya pirsê (*interrogative sentence*), risteya fermanî (*imperative sentence*), risteya baneşanî (*exclamatory sentence*), risteya mercî (*conditional sentence*) û risteya daxwazî (*wish clauses*). Her yek ji wan bi fonksiyoneke wateyî ya cuda tîkariyê li ragihandinê dike. Armanca vê nivîsarê ew e ku wate û bikaranîna van cureyên risteyên rave bike. Ji minakên *Mem û Zînê* jî dixuye ku curbicuriya risteyên ji aliyê wateyê ve jihev cuda atmosfereke zindî dide vegêranê û dike ku hemû hestên di vegêranê de veguhêze guhdar û xwîneran.

**Peyvên Sereke:** Kurmançî, Cureyên Risteyan, Li Gorî Wateyê Riste, Mem û Zîn.

## ÖZ

Bu makale anlam bakımından cümle çeşitleri konusunu araştırmaktadır. Dilin temel yapı birimi olan cümleler, iletişimde önemli bir rol oynamaktadır. Cümleler, düşünceleri ifade etmek, bilgi iletmek ve anlamı aktarmak için kullanılan temel araçlardır. Bu nedenle, cümlelerin anlamı ve çeşitliliği üzerine yapılan çalışmalar, dilin işleyişini anlamak için önemlidir. Bu makalede, anlam bakımından cümle çeşitlerinin fonksiyonlarını ve yapılarını ele aldık ve Ahmed-i Hanî'nin *Mem û Zîn*'inden örnekler verdik. Anlam bakımından birbirinden ayrılabilen cümle çeşitleri şunlardır: Beyan/Bildiri cümlesi (*declarative sentence*), soru cümlesi (*interrogative sentence*), emir cümlesi (*imperative sentence*), ünlem cümlesi (*exclamatory sentence*), şart cümlesi (*conditional sentence*) ve dilek-istek cümlesi (*wish clauses*). Bunlardan her biri farklı farklı bir anlamsal fonksiyon ile iletişime katkıda bulunur. Bu makalenin amacı bu cümle çeşitlerinin anlamlarını ve kullanımlarını açıklamaktır. *Mem û Zîn*'den verilen örneklerin de gösterdiği gibi, anlam bakımından cümle çeşitliliği anlatımda canlı bir atmosfer oluşturmakta ve anlatımdaki tüm duyguların okuyucu veya dinleyiciye aktarılmasını sağlamaktadır.

**Anahtar Kelimeler:** Kurmanca, Cümle Çeşitleri, Anlamına Göre Cümle, Mem û Zîn.

## ABSTRACT

This article explores the topic of sentence types in terms of meaning. Sentences, being the fundamental building blocks of language, hold a crucial role in communication. Sentences are the primary means used to express thoughts, convey information and convey meaning. Therefore, studies on the meaning and variety of sentences are crucial for understanding the functioning of language. In this article, we discuss and examine the functions and structures of sentence types in terms of meaning and give examples from Ahmad-i Hanî's *Mem û Zîn*. Sentence types that can be distinguished from each other in terms of meaning are as follows: Declarative sentence, interrogative sentence, imperative sentence, exclamatory sentence, conditional sentence and wish clauses. Each of them contributes to communication with a different semantic function. The primary objective of this article lies in elucidating the meanings and applications of these sentence types. As the examples given from *Mem û Zîn* show, the diversity of sentences in terms of meaning creates a lively atmosphere in the narration and enables all the emotions in the narration to be conveyed to the reader or listener.

**Keywords:** Kurmanji, Sentence Types, Sentences by Meaning, Mem û Zîn.

## Destpêk

Ziman, amûreke bingehîn e ku mirov pê ragihandinê saz dike. Ji bo ku bi awayekî kartêker ragihandinê pêk bê, divê ziman bê bikaranîn û famkirin. Yek ji hîmên zimên, riste ye ku di ragihandinê de bi roleke giring radiibe. Riste, yekeyên wateyî û binyadî ne ku ji bo derbirîna fikran, ragihandina hestan, veguhastina agahiyan û daxwazîkirinê tîk bikaranîn. Wate, cureyên risteyê yê cuda bi bandora ragihandinê ya cuda û avaniya wateyî ya cuda derdikevin pêş.

Giringiya rêzimanî ya cureyên risteyan ên ji aliyê wateyê ve ew e ku bandor û kartêkeriya ragihandinê zêdetir dikin. Bikarhênerên zimên, bi rastbikaranîna cureyên cuda yê risteyan dikarin peyamên xwe karîgertir ragihînin û bi vî awayî famkirin û bersivdayîn ji bo aliyê din (peyamgir; receiver) hêsantir dibe. Rê û rêbazên rêzimanî, binyada cureyên risteyan û bikaranîna wan rave dike. Bikarhênerên zimên, bi hînbûn û sepandina wan rê û rêbazan dikarin cureyên risteyan di cihên rast de bi kar bînin. Bo nimûne, heger armanc vekolîna mijarekê be, an jî hînbûna fikrên aliyê din be, li şûna risteyeke agihandinî divê risteyeke pirsîkirinê bê bikaranîn. Bi vî awayî ragihandin karîgertir û înteraktîvtir dibe.

Di zimannasiyê de, wateya risteyê ji binyada wan wêdetir bi girêdan û bihevrebûna hêmanên risteyê ve têkildar e. Famkirina taybetiyên wateyî yê risteyê pengaveke giring e ji bo famkirina xebitîna zimên û bê çawa wate tê hilberandin. Ji ber ku cureyên risteyan xwedî fonksiyon û taybetiyên wateyî yê cuda ne, dibin amûreke giring ji bo têgihîştina binyada wateyî ya zimên. Curbicuriya cureyên risteyan yê di zimên de dewlemendî û livdariya zimên nîşan didin.

Ji aliyê wateyê ve cureyên risteyan piranî bi şeş sernavan tîk dabeşkirin lê hin zimannas di bin van beşan de binbeşan jî rêz dikin. Risteya agihandinî (*declarative sentence*), risteya pirsê (*interrogative sentence*), risteya fermanî (*imperative sentence*), risteya baneşanî (*exclamatory sentence*), risteya mercî (*conditional sentence*) û risteya daxwazî (*wish clauses*) sernavên sereke ne. Huddleston û yd. (2022: 500) cureyên risteyên îngîlîzî bi pênc sernavan dabeş kirine (*declarative, closed interrogative, open interrogative, exclamative, imperative*). Di xebata wan de risteyên mercî (*conditional*) û risteyên daxwazî (*wish*) bi sernavên cuda hatine dayîn. Herwiha, divê bê diyarkirin ku Huddleston û hevalên xwe (2022: 499) di xebata xwe de ev mijar di bin sernavê hevokan (*clauses*) de dane û bi taybetî amaje pê kirine ku ev di eslê xwe de ne riste (*sentence*) ne, hevok in lê ku bi tena serê xwe bin, dikarin bibin riste jî. Risteya agihandinî rewşekê an jî heqîqetêkê diyar dike. Di xebatên kurmancî de (Ciwan, 1992: 213) piranî bi sernavên *Risteyên Erênî* û *Risteyên Neyînî* hatiye dabeşkirin. Risteyên pirsê bi armanca hînbûna tiştêkî tîk bikaranîn. Erênî û neyînîtiya risteyên pirsê jî hene. Risteya fermanî, çawa ku ji navê wê jî tê famkirin, ji bo fermandayînê tîk bikaranîn. Risteyên fermanî jî dikarin erênî an neyînî bin. Risteyên baneşanî ji bo derbirîna hestên xurt û qîrînê tîk bikaranîn. Di risteyên mercî de, pêkhatina rewşekê bi pêkhatina rewşeke din ve girêdayî ye. “Heger tiştêk bibe dê tiştêkî din jî bibe” an jî berevajî wê. Risteyên daxwazî jî rewşên xwestek, daxwazî û xwezîyê derdibirin.

Güzel (2018: 80), di xebata xwe de ji aliyê wateyê ve risteyan bi çar sernavan dabeş dike: “Hevokên ragihandinê, hevokên fermanî, hevokên pirsyarî û hevokên baneşanî”. Sernavê “Hevokên Ragihandinê” li şûna risteyên agihandinî hatiye bikaranîn. Tan (2015: 338), li gorî peyama ku jê derdikeve, ji aliyê wateyê ve risteyan dabeş dike. Bisernavkirina Tan wiha ye: *Hevokên ragihandinî, hevokên fermanî, hevokên navberî, hevokên erênî, hevokên neyînîyê, hevokên pirsyariyê, hevokên xwestekî, hevokên baneşanî*. Öcek (2020: 265), ji aliyê wateyê ve heşt cureyên risteyên ji hev cuda rêz kirine; *fermanî, navberî, baneşanî, erênî, neyînî, divêtî, bilanî, pirsyarî*.

Armanca vê nivîsarê ew e ku ji aliyê wateyê ve cureyên risteyan ên ji hev cuda bînin pênasîkirin, vekolîn û senifandin. Bi vî awayî, em ê binyada wateyî ya zimanê kurmancî baştir fam bikin. Herwiha, her cureyeke risteyê bi tena serê xwe xebateke serbixwe heq dike û em vê gotarê wekî destpekekê

ji bo xebatên siberojê amade dikin. Lewma ev gotar dê zêde kûr neçe nav mijarê, weku me got dê amadehiyek be ji bo rêzegotarên kûrtir ên siberojê. Ji bo pênasekirin, vekolîn û senifandina cureyên risteyan ên ji aliyê wateyê ve ji hev cuda, em ê ji *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî mînakan bidin. Ehmedê Xanî şa'irekî Kurd ê serdema klasîk e û di warên ji hev cuda de berhem nivîsîne. Li gorî agahiyên berdest mesnewiya *Mem û Zînê* di edebiyata kurdî ya klasîk de dibe mesnewîya evîni ya pêşî. Di mesnewîyê de, nêzikî 2656 malik hene. Li gorî Dost (Xanî, 2010: 32) ev mesnewî li ser bingeha çirok û destana Memê Alan hatiye nivîsîn.

Li ser *Mem û Zînê* gelek xebatên kurmancî hatine kirin lê di qada zimannasiyê de hejmara xebatan kême. Gotarên Kızıllı (2019) û Açar (2021) du xebatên sereke ne derbarê zimannasiya *Mem û Zînê* de. Kızıllı li ser morfema “di”yê ya kurmancî xebitiye. Wî wate û peywira vê morfemê li ser berhema Ehmedê Xanî sepandiye. Açar jî di xebata xwe de li ser şêwaza zimanî ya *Mem û Zînê* xebitiye. Em ê jî di vê nivîsarê de, ji aliyê wateyê ve cureyên risteyan bisenifînin, wan rave bikin û ji bo her cureyê ji *Mem û Zînê* (Xanî, 2022) mînakan bidin.

## 1. Ji Aliyê Wateyê ve Cureyên Risteyan

### 1.1. Risteya Agihandinî

Risteyên agihandinî risteyên herî berbelav in û ji ber ku agahî û derbirînan neql dikin, di ragihandinê de roleke wan a girîng heye. Bingeha axaftina me ya rojane, metnên me yê nivîskî û dîskûra akademîk ava dikin. Famkirina fonksiyon û taybetiyên van risteyan ji bo famkirina zimên û ragihandina kartêker girîng e. Brown û Miller (2013: 122) diyar dikin ku armanca sereke ya vê risteyê ew e ku daxuyani (*statement*) bê dayîn.

Di kurmancî de risteyên agihandinê gelemperî ji biker, berkar û pêveberê pêk tên û bi heman rêzê ev heman li dû hev tên (SOV)<sup>1</sup>. Biker, ew heyber e ku kiryarê pêk tîne, pêveber temsîla kiryarê dike û berkar jî qada kiryarê ye, yanî ew heybera ku di bin tesîra pêveberê de ye. Li gorî alozbûna risteyê dibe ku ev rêzbûn û erk biguherin. Ji bo agahiyên zelaltir dibe ku di risteyê de hoker, rengdêr, daçek û yww. jî bînan bikaranîn.

Armanca sereke ya risteya agihandinê, pêşkêşkirina agahiyekê, bilêvkirina baweriyekê an jî derbirîna heqîqetekê ye. Digel ku derbirînen asayî ne em bi alîkariya van risteyan dikarin angaşten xwe, nêrinên xwe û belgeyên xwe parve bikin. Nivîsarên saloxder, gotarên akademîk, raporên zanistî û axaftina rojane hêza xwe ji van risteyan werdigire. Risteyên agihandinê dikarin di gelek pêwendî û mijarên berfireh de bînan bikaranîn. Bo nimûne, di gotareke zanistî de dikare encama xebatê an jî encama ceribandîna diyar bike: “Di *Mem û Zînê* de herî zêde hunerên girêdayî wateyê hatine bikaranîn” (Aslanoglu, 2019: 157). Em dikarin teoriyan, têgehên an jî angaşten xwe di nivîsaran de berpêş bikin. Bo nimûne: “Alfabeya kurdî alfabeke ne fonetîk e lewre ji bo her dengêkî tîpek nehatiye danîn” (Açar, 2015: 14). Herwiha di axaftina rojane de ji bo derbirînen asayî em van risteyan bi kar tînin. Bo nimûne: Ez ê sibê neçim zanîngehê.

---

1 S (Subject), O (Object), V (Verb). Di zimannasiyê de rêza peyvên a di risteyê de li gorî binyada wî zimanî hatiye formülîzekirin. Givon (2001: 233) li ser gelek zimanan xebitiye û varyantên rêzêkirina peyvên nîşan dane. Hin rêzêkirînen gramatîk hebin jî di her zimanî de, di axaftinê de varyantên rêzêkirinê çêdibin. Digel ku di kurmancî de rêza gramatîk SOV (biker-berkar-pêveber) “ez nê dixwim” e jî varyantên din jî tên ditîn. Bo nimûne: SVO (biker-pêveber-berkar) “ez dixwim nê”, OVS (nê dixwim ez), VSO (dixwim ez nê), OSV (nê dixwim ez), VOS (dixwim nê ez). Ev varyantên din gelemperî di axaftinê de pêk tên û ji bo bînan fêhmkirin faktora prosodiyê dikeve dewrê. Prosodî, di zimên de tiştên wekî întonasyon, ton, navber (*break*), guvaş û teqla (*rhythm*) axaftinê îfade dike. (Bülbül, 2017: 92).

Risteyên agihandinî li gorî fonksiyonên xwe dikarin bi çend binsernavan bèn dabeşkirin. Bo nimûne wextê em bêjin “Av di hîza behrê de di 100 santîgratê de dikele” em agahiyeke rasteqîn ya bêpêşdaraz pêşkêş dikin ku em dikarin bibêjin ev agahiyeke objektîv e. Herwiha, em dikarin agahiyên subjektîv jî derbibirin ku ew an nêrîn an jî baweriyên şexsî ne. Bo nimûne: “Spor jî bo tenduristiya însên gelek baş e”. Digel wê, em dikarin hin rastiyên gerdûnî û heqîqetên gelemperî jî derbibirin. Bo nimûne: “Dinya li dora rojê dizivire”.

Di pirtûkên rêzimana kurmancî de (Ciwan, 1992: 212; Tan, 2015: 338; Öcek, 2020: 265) risteyên agihandinî wekî Risteyên Erênî û Risteyên Neyînî hatine nîşandan lê erênîti û neyînîti bes du fonksiyonên risteyên agihandinî ne. Wate, risteyên agihandinî dikarin him erênî him jî neyînî bin. Hin nimûneyên risteyên agihandinî yên di *Mem û Zînê* de ev in:

- Bê husnê te nîne wan wucûdek  
Bê nûrê te nîne wan numûdek (r. 21)  
Sef sef dimeşîne koh û deştan (r. 70)  
Tacdîn sekinî û pirsîyar kir (r. 75)  
Begzade ye yêk ji neslê mîran  
Yek jî bi neseb kurrê debîran (r. 99)  
Tacdîn bi vî terzi çû serayê  
Mem ma li derî digel du'ayê (r. 133)  
Sehra hemî bûye sehnê bostan  
Sahil bûye gulşen û gulistan (r. 171)  
Îro li Memê ezê xezeb kem (r. 204)  
Evrenge ye halê min şeb û rûz (r. 218)  
Em çûne huzûrê mîrê mîran (r. 258)  
Wî secde nekir li xeyri me'bûd (r. 25)  
Sih danediket ji wî li 'erdan (r. 30)

## 1.2. Risteya Pirsê

Wergirtina agahiyên, dandestpêkirina nîqaşê, balkişandin, provokekirin û manîpûlekirina ramanan û zêdekirina kartêkeriyê fonksiyonên sereke yên risteyên pirsê ne (Brown û Miller, 2013: 238). Him di ragihandina nivîskî him jî di ragihandina devkî de berbelav tèn bikaranîn. Ji ber ku li benda bersivan e, teşwîqa fikirinê dike, lewma pêwendiya mijarê kûrtir dike û ragihandinê xurtir dike.

Risteyên pirsê gelemperî dibin du beş; Pirsên “Erê/Na”yê û pirsên ku bi peyvên pirsê tèn sazkirin (Çima, Kengî, Çawa, Kî, Kîjan û wd.). Lê dibe ku li gorî binyada hin zimanan zêdetir an jî kêmtir binbeşên van risteyan hebin. Bo nimûne, Burstein (2013: 320-25) ji bo zimanê îbranî sê cureyên risteyên pirsê nîşan dide. Cureya sêyem ew e ku di eslê xwe de pirsê “Erê/Na” ye lê ji ber ku pirs bi vebijêrkeke alternatîv diqede bersiv ne “Erê/Na” ye (*Em herin Mêrdînê an Diyarbekirê?*). Di kurmancî de, di ragihandina devkî de bi alikariya prosodiyê em jî dikarin risteyên pirsê saz bikin.

Nexasim bi kirpandinê û bilêvkirina biguman fonksiyona pirsê li risteyê zêde dike. Bersivên van pirsan jî gelemperî “Erê/Na” ne.

Wate, di kurmançî de ji yekê zêdetir rê hene ku mirov risteya pirsê saz bike. Hoker, rengdêr, cînav, daçek û fonksiyonên prosodîk dikarin wateya pirsê li risteyê bar bike. Risteyên pirsê dikarin erênî û neyînî bin. Ji bo neyînîkirina risteya pirsê divê morfemên neyînîkirinê {ne-, na-, ni-, me-} li lêkerê bê zêdekirin. Hin nimûneyên risteyên pirsê yên di *Mem û Zînê* de ev in:

Aya ne te çêkirin muqabil? (r. 23)

Yûsif te çira numa Zuleyxa (r. 22)

We zû şemirand ji bo çî sersal? (r. 87)

Eshabê nigîn bibêje kî ne

Cinnî ne, perî ne, ademî ne? (r. 96)

Ev xewne sehîh e yan betal e? (r. 187)

Kanî li me aş e ya ne zîz e?

Baxê wî behare ya peyîz e? (r. 219)

Derman çiye? (r. 227)

Pirsîn ‘eceb ev çî bînewa ye (r. 264)

Bêhûde çira dikey tu feryad (r. 163)

Zindaniyê min, te kê celîs e?

Sewdayiyê min, te kê enîs e? (r. 218)

Saqî were bêje min çî lewn e?

Ev kewnexeyal e ya ne xewn e? (r. 286)

Qaim dibitin ‘erez bi cewher

Bê şemsê qemer dibit munewer (r. 91)

Ma destî dida ku dest û pence (r. 121)

Qet xîret e ey penahê ‘alem

Qet layiq e ey şebanê adem (r. 35)

Ji mînakên jî diyar dibe ku di *Mem û Zînê* de ji bo rewşa pirsê ava bibe, digel peyvên pirsê prosodî jî li kar e. “**Aya, çira, çî (ji bo çî), çira, kanî, kî**” peyvên pirsê ne ku wextê di risteyê de cih wergirin bêyî nîşaneyêke din diyar dibe ku ev riste risteya pirsê ye. Herwiha, di hin risteyên *Mem û Zînê* de bêyî ku ev peyv bînarî, rewşa pirsê hatiye avakirin. Wextê peyvên pirsê hebin bi awayê siruştî kirpandin li ser van peyvên e lê wextê pirsê peyvê di risteyê de tune bin, cihê kirpandinê li gorî mijar (*topic*) û fokûsê (*focus*) diyar dibe. Pirsên ku bersivên wan “heye, tune” ne, bi kirpandinê “heye, tune” ava dibin. Heger riste bi kopûlayê (*copula*) ava bibe, kirpandin li ser peyva berî kopûlayê ye. Em rastî pirsên bi “heye, tune” nehatin lê mînakên din li jor in û peyvên kirpandinê hatine binxêzkirin.

### 1.3. Risteya Fermanî

Risteya fermanî gelemperî bi frazeke lêkerî dest pê dibe û di risteyê de biker ne diyar e. Frazaya lêkerî rasterast dîrektîfêkê an jî daxwazekê derdibire. Di zimanê îngilîzî de qurmê lêkerê yê bê gire tê bikaranîn “*You just stay there*” (Brown û Miller, 2013: 220). Di kurmancî de lêker li gorî hejmarê cînavên kesandinê yên kesên duyem (-e, -in) bi dawîya lêkerê ve dizeliqin û gireya dema bê “bi-“ tê pêşîya lêkerên xwerû û ligel ku raweya fermanî di kurmancî de bi qayîde ye jî hin cureyên lêkeran jî vê qayideyê azad in (Bedirxan û Lescot, 1990: 127; Kurdo, 1981: 125-26). Bo nimûne; “*Biçe. Bimeşe. Bixwe. Bicû. Hişbe!, Hişbin!, Rabe!, Rabin!, Herne pêş., Were vir. Werin vir.*” Risteyên fermanî an bi xalê (.) an jî bi baneşanê (!) bi dawî dibin.

Risteyên fermanî di jiyana rojane de, li dibistanê, li kargehê, li malê û li derdorên din, piranî ji bo ragihandina fermî û hiyerarşik tîkên bikaranîn. Bo nimûne, li malê dê û bav ji zarokan re dibêjin “Odeya xwe paqij bike.”, Sifreya şivê amade bike.”, an jî mamoste li dibistanê ji xwendekaran re dibêjin “Bixwîne.”, “Rabe ser xwe!”.

Şeweya derbirîn û kirpandinê karîgeriya risteya fermanî xurtir dikan. Kirpandinê rast û di cî de, dê bike ku ragihandinê birêkûpêk saz bibe. Lê dema risteyên fermanî tîkên bikaranîn divê mirov ji çarçoveya rêzdariyê dernekeve an na dibe ku di encamê de bertekên vajî jî derkevin holê. Li şûna “Odeya xwe paqij bike.”, “Ji kerema xwe odeya xwe paqij bike.” baştir e.

Risteyên fermanî xîtabî kesê duyem dikan. Di kurmancî de kesê duyem; yekjimar mê, yekjimar nêr û pirjimar e. Yanî di kurmancî de mirov dikare rasterast ferman bide sê koman lê di fermankirinê de zayend diyar nabe (Rabe! Were! Tu Were! Hûn Werin!). Herwiha, mirov dikare di ser navbeynkaran jî fermanê bide. Downing (2006: 6) diyar dibe ku risteyên fermanî yên zimanê îngilîzî dikare fonksiyona pêşniyazkirin, vexwendin, qedexekirin û dîrektîfê jî hilgire ser xwe. Di zimanê îngilîzî de risteyên fermanî ên ji bo kesê yekem û kesê sêyem bi peyva “*let*”ê dest pê dikan. Di kurmancî de, ev risteyên fermanî ku bi alikariya navbeynkaran ve tîkên veguhastin, bi hokera “bila”yê tîkên sazkin. Di xebatên rêzimanî yên kurmancî de ev cure risteyên fermanî piranî wekî fermana nerasterast hatine binavkirin. Bo nimûne; *Bila Xelîl şivê amade bike. Bila Gulê gotara xwe biqedîne. Bila ew neyê.* Hin nimûneyên risteyên fermanî yên di *Mem û Zînê* de ev in:

Go rabe bira ji nav nivînan

Bes ahê bike ji ber birînan (r. 84)

Rabe here zû bibêje Tacdîn (r. 109)

Go: “bîne ji bo mi xateman zû (r. 93)

Şêx go: “Tu here bibîn wusaqan

Teftêşi bike cih û wusaqan (r. 99)

Bohtan tu bibê bila siwar bin

Cundî tu bibêje da bi kar bin (r. 246)

Herçî ku wekîl e, bêt û rûnit (r. 113)

Mîr go: “Biqutin def û rebaban

Bînin hemî şerbet û şeraban (r. 113)

Mîr go: ku “vekin evan xezalan

Pabende mekin evan şepalan (r. 191)



#### 1.4. Risteya Baneşanî

Risteyên baneşanî dibin amûra zimanî ji bo derbirîna hestan. Ji bo derbirîna hestên xurt ên wekî kelecânî, heyirîn, bextewarî, gefxwarin û tirsê tîn bikaranîn û tenê bi kirpandina deng jî dikare bîn derbirîn (Bedirxan û Lescot, 1990: 331). Di ragihandina devkî û nivîskî de, berbelav tîn bikaranîn, ev jî dike ku ziman dewlemend bibe û hêza vegêranê xurttir bibe. Ji ber ku bi alikariya risteyên baneşanî îfadeyên dilîni gurtir dibe di metnên helbestkî û berhemên edebî de berbelav tîn bikaranîn.

Di ragihandina devkî de bi kirpandinê, di metnên nivîskî de bi nîşenake baneşanê (!) rewşa baneşanî tê nîşandan. Di risteyên baneşanî de, ne hewce ye ku biker, berkar, pêveber an jî hêmaneke din hebe lê dikare hemû qayideyên peyvêziyê bi kar bîne jî. Bo nimûne; *Eywax! Hevalno! Wî li min pepûkê! Çi rojeke xweş!* Bikaranîna risteyên baneşanî li gorî pêwendîya civakî û çandî û binyada zimanî dikare di her zimanî de kêma an jî zêdetir be û dikare wateyên cuda jî derbibirin. Hin nimûneyên risteyên baneşanî yên di *Mem û Zînê* de ev in:

Heqqa! ku te xweş nîzam û rewneq (r. 19)

Çi bkem ku qewî kesad e bazar

Nînin ji qumaşî ra xerîdar (r. 43)

Ez dê çî bibêjim ey şehînşah! (r. 32)

Ey Daye! ji bo me çaresaz î (r. 109)

Mîrim! bike der vî dergevanî (r. 141)

Ey dil! Were da biçîn nehanî (r. 180)

Pîrsa me bikey tu ey şekerxa! (r. 211)

Bes nîne! Li min te kir qiyamet (r. 261)

Cana! Tu di canî da nîhanî (r. 213)

Evçende munafîq û neyar î

Hêja tu bi çavê min diyar î (r. 261)

Mîrim mi nego ji bo te pêşîn! (r. 227)

Ev ‘adete nîne xassê mîran

Nabîni li ber derê feqîran! (r.142)

Nabîni ku pêkve cumle zidd in!

Hikmet çî ye, bo çî pêkve nidd in! (r. 140)

Ji mînakên li jor jî tê dîtin ku rewşên baneşanî piranî bi bangê (nîda) hatine avakirin. Di berhemê de digel bangê hin risteyên heyirînê (*Evçende munafîq û neyar î, Hêja tu bi çavê min diyar î*), û hişyarkirin û balkişandinê (“*Mîrim mi nego ji bo te pêşîn!*”, “*Ev ‘adete nîne xassê mîran, Nabîni li ber derê feqîran!*”, “*Nabîni ku pêkve cumle zidd in! Hikmet çî ye, bo çî pêkve nidd in*”) jî hene.

#### 1.5. Risteya Mercî

Risteyên mercî di ragihandinê de rewşên sermeselê, dibetî, ihtîmal û nediyariyê derdibirin. Di van risteyan de, heger şertek, mercekek bê cî encamek derdikeve pêşberî me. Bi risteyên mercî em têkîliya şert û encamê saz dikin. Risteyên mercî gelemperî bi gihaneka “*Eger*”ê (*Ger, Ku, Heger, Heke, Eke, Hek, Hekî, Heku*) dest pê dikin û bi beşa encamê diqedin. Bo nimûne di vê risteyê de; “*Eger sibê ne*

baran be, em ê herin gerê.” Merc “Eger sibê ne baran be” ye, encam jî “em ê herin gerê” ye.

Risteyên mercî li gorî avaniyê dikevin nav risteyên aloz. Yanî di risteyê de du hevok hene. Ew jî tê vê wateyê ku du pêveber yanî du darazên risteyê hene. Hevoka ewilî hevoka mercî (*If Clause*) ye, hevoka dîn jî hevoka sereke (*Main Clause*) ye (Bell, d.t.: 129). Ji ber ku ji du hevokan pêk tên çend şeweyên sazkirina van risteyan hene. Hejmara van şeweyan li gorî zimanan diguherin, dibe ku şeweya ku di zimanê îngilîzî de pêkan be di kurmancî de ne mimkin be. Ji bo kurmancî em dikarin van mînakên bidin: “*Ku baran dibare, ez bi sîwanê diçim zanîngehê. Ku ez ji zanîngehê zû tîm, ez li malê xwarinê çêdikim. Heger tu bixebitî, tu yê bi ser bikevî. Ger pereyên min hebûna, ez ê bifiriyama. Ku tu bihata, min ê tişteki girîng ji te re bigota.*” Hin nimûneyên risteyên mercî yên di *Mem û Zînê* de ev in:

Gava ku nezer biket li Zînê

Tehqîq e, ku naketin çu jînê (r. 232)

Ger Wamiq î, ha ji bo te ‘Ezra (r. 256)

Ger bulbul î, gul ji bo te hazir (r. 256)

Cismê me eger diçîte çalê

Rûhê di me dê biken wîsalê (r. 245)

Mem ger bi vî rengî zû fena bit

Dê keşmekeş û niza’ê rabit (r. 232)

Ger îznê bidet ji bo mi ra Mîr

Ez dê bikujim, Memê bi tedbîr (r. 231)

Ger ez nekirim feda bi carek

Mîrînî li min nebit mubarek (r. 115)

### 1.6. Risteya Daxwazî

Risteya daxwazî ji bo derbirîna arezû, xwestek, daxwazî an jî mirazan tên bikaranîn (Bedirxan û Lescot, 1990: 331). Di van risteyan de raweya mercî û raweya fermanî berbelav in. Risteyên daxwazî di ragihandinê de kartêkeriyê hestî çêdike û dike ku bala xwîner an jî guhdar zêde bibe. Mirov dikare him ji bo xwe him ji bo kesên din risteya daxwazî saz bike.

Di zimanê îngilîzî de gelemperî bi lêkera “wish”ê risteyên daxwazî tên saz kirin. Lêkerên modal (*may, can, will, would, could* û yd.) û gihaneka “*that*”ê jî pir caran di risteyê de cih digirin. Dema “*wish*” û “*that*” bi hev re tên bikaranîn an hestên poşmaniyê dide an jî rewşa heyî derdibire (Thomson û Martinet, 1986:186). Bo nimûne; *I wish that I could fly* (Xwezila min karîba bifiriyama/Min dixwest ez karibim bifirim). Di kurmancî de jî piranî bi gihaneka “*xwezî*” û varyantên wê (*xwezila, xwaziku, xwazka, xwazil*) tên saz kirin. Sazkirina risteyên daxwazî bi xwe re saz kirina raweyan jî tîne. Bedirxan û Lescot (1990: 138,147,151,157,163) bi hûrgilî ev rawe pênase kirine û ji bo her demê mînak dane. Di çirokiya hevedudanî ya daxwaziyê de rehê dema borî ya kesê sêyem dikeve nav dorgira daxwaziyê. Ev dorgir li gorî kesan diguhere: Kesê yekem ê yekjimar: bi-)...(-ama, kesê duyem ê yekjimar: bi-)... (-ayî, kesê sêyem ê yekjimar: bi-)...(-a, kesên pirjimar: bi-)...(-ana. Di heman xebatê de wan ev mînak dane: Ez biketama. Tu biketayî. Ew biketa. Em/Hûn/Ew bikatana. (Bedirxan û Lescot, 1990: 138). Hin nimûneyên risteyên daxwazî yên di *Mem û Zînê* de ev in:

Xuz'ya ku li min xezeb kira Mîr  
Manendê Memê bi xull û zincîr (r. 219)  
Ger dê hebuwa me serferazek (r. 37)  
Hasil bibuwa ji bo wî tacek (r. 37)  
Carek bidiya min ew bi dilxwah (r. 183)  
Ez jî bişehandima wê çalê (r. 219)  
Carek bidiya min ew girîftar  
Derman bikira min ew birîndar (r. 219)

### Encam

Di encamê de me dît ku curbicuriya risteyan ên ji aliyê wateyê ve jihevçuda, di metnên edebî de amûreke giring a wateyî û zimannasiyî ye. Nimûneyên risteyan nîşan didin ku nivîskêr xem xwariye da ku bi bikaranîna curbicuriya risteyan ve azmûneke kûr a xwendinê bide xwîneran.

Herwiha, em di vê xebatê de dibînin ku têkiliya di navbera zimannasî û edebiyatê de jî gelekî xurt e. Vekolînên zimannasiyî ji bo famkirina taybetî û binyada zimanî ya metnên edebî dibin pirên bivênevê. Bikaranîna curbicuriya risteyan rêyeke giring e ji bo derbirîna armanca nivîskêr, derûnnasiya lehengan û temaya metnê.

Ehmedê Xanî di *Mem û Zînê* de vegêranekê çîrokî vedibêje, yanî performanseke hunerî li dar dixê. Lewma, divê çîroka xwe bi awayê herî xweşik û estetîk neqil bike da ku atmosfera çîrokê bide jiyîn. Ehmedê Xanî ji hemû cureyên risteyan sûd wergirtiye û bi fonksiyonên wateyî yên van risteyan ve guhdar û xwîner kişandine nav çîrokê. Van fonksiyonên zimannasiyî kirine ku metna edebî xîtabî hestên guhdar û xwîneran bike.

Axirî, me di vê xebatê de dît bê qadên zimannasî û edebiyatê çawa tên cem hev û çawa bandorê li hev dikin. Lêkolînên zimannasiyî, taybetiyên wateyî û binyadî yên zimanê metnên edebî berçav dikin û edebiyat jî qadeke xebatê dide zimannasiyê. Di vê pêwendiyê de, divê em bibînin ku ev hevkarîya di navbera zimannasî û edebiyatê de him ji aliyê zanistî him jî ji aliyê edebî ve derfetên dewlemend dide me.

Di vê nivîsarê de, em li ser cureyên risteyan ên ji aliyê wateyê ve jihevçuda xebitîn û me ji *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî mînak dan. Armanca me ew bû ku ji aliyê wateyê ve cureyên risteyan bi pêwendîya metnên edebî bîn lêkolîn. Me ji bo her cureya risteyê ji *Mem û Zînê* hin mînak dan û nihêrî bê ka curbicuriya van risteyan çawa wateya metnê dewlemend kiriye û nivîskêr çawa şareziya xwe ya zimanî bi kar anîye. Helbet ev gotar dê nîkaribe bi temamî metnê *Mem û Zînê* binirxîne û li ser şewaza Ehmedê Xanî nêrinên tûj derbibire. Belkî ji bo vê xebatên wekî tez an jî rêzegotar hewce ne. Hêvî ew e ku ev gotar ji bo xebatên nû bibe pêlikek biçûk.

### EXTENDED ABSTRACT

This paper investigates the complex relationship between sentence patterns and their semantic meaning in the framework of *Mem û Zîn*, the masterwork by Ahmad-i Hanî. This foundational work of Kurdish literature is a rich source of narrative and linguistic features, which makes it a perfect subject for sentence structure research and its roles in communication.

Setting the scene, the first section clarifies the basic function of sentences as language's building blocks. Sentences are the fundamental building block of communication because of their innate ability to transmit ideas, provide context, and give meaning. Deciphering the subtleties of sentence structures is therefore essential to understanding the intricacies of language expression and story development. In light of this, the study describes its goals, which include illuminating the semantic importance of various sentence patterns within *Mem û Zîn* by analyzing their structures and functions.

A comprehensive assessment of the literature places the topic in the larger context of literary scholarship and linguistic analysis. A survey of prior studies on Kurdish literature, sentence structures, and linguistic frameworks highlights the necessity for a more in-depth analysis of sentence patterns in terms of meaning and points out any gaps in the field. The study establishes the foundation for its theoretical framework and analytical technique by integrating insights from several scholarly pursuits.

The analytical strategy used for the study is outlined in the methodology section. Using well-established language theories and procedures, the scholars analyze a few chosen passages from *Mem û Zîn* qualitatively. The study carefully analyzes these passages in order to identify and classify different types of sentences according to their structural and semantic characteristics. The researchers also carefully examine the narrative context in order to clarify the implications and communicative roles of each sentence form.

The study's thorough examination of the many sentence forms found in *Mem û Zîn* forms its central thesis. The researchers discover a complex tapestry of linguistic and narrative aspects woven into the text by thoroughly scrutinizing particular parts. We examine the following phrase types: declarative, interrogative, imperative, exclamatory, conditional, and desire. Each of these adds unique semantic nuances to the story and enhances its overall communicative impact. The study reveals the complex relationship between sentence forms and meaning in the *Mem û Zîn* narrative framework through painstaking examination and interpretation.

The analysis's conclusions provide insightful information on the variety of literary and linguistic devices used by Ahmad-i Hanî in *Mem û Zîn*. The author's stylistic decisions and narrative techniques become apparent through patterns and trends in the usage of various sentence forms. The study clarifies how a wide variety of sentence forms enhances the narrative texture and promotes an engaging and dynamic reading experience. The results also highlight the importance of comprehending sentence forms in terms of meaning, providing fresh insights into the complexities of Kurdish language and literature.

The study concludes by summarizing its main conclusions and contributions to literary studies and linguistics. It emphasizes how crucial sentence structure analysis is to understanding the semantic aspects of language use in literary writings such as *Mem û Zîn*. The study also emphasizes how applicable its conclusions are to more general investigations into language, communication, and cultural expression. Lastly, it makes recommendations for future research directions, highlighting the necessity of carrying out further study of Kurdish language and literature within the parameters of linguistic analysis.

### Çavkanî

- Açar, Z. (2015), Devoka Devera Filistanê (Teza Lîsansa Bilind) Zanîngeha Bîngolê. <https://tez.yok.gov.tr/>
- Açar, Z. (2021). Şêwaza Zimanî di Mem û Zînê de. A. Timurtaş, M. Z. Ertekin û A. Tek (ed.). *Xanînasî*. Wan: Peywend.
- Aslanoğlu, O. (2019). Di Mem û Zînê de Çend Hunerên Wateyî . *Mukaddime* , 10 (1) , 141-159 . DOI: 10.19059/mukaddime.493209
- Bedirxan, C. A. û Lescot, R. (1990), *Kürtçe Grameri (Kurmanci Lehçesi)*, Paris: Institut Kurde De Paris.
- Bell, M. (d.t.). A Note on Conditional Sentences in English. Department of Philosophy University of York.
- Brown, K., û Miller, J. (2013). *The Cambridge dictionary of linguistics*. Cambridge University Press.
- Burstein, R. (2013). "Interrogative Sentences", in: *Encyclopedia of Hebrew Language and Linguistics*, Edited by: Geoffrey Khan. DOI: [http://dx.doi.org/10.1163/2212-4241\\_ehll\\_EHLL\\_SIM\\_000547](http://dx.doi.org/10.1163/2212-4241_ehll_EHLL_SIM_000547).
- Bülbül, M. (2017). Peyvrêzî Di Frazên Navdêrî De (Devoka Mêrdînê). *The Journal of Mesopotamian Studies*, 2(1), 89-101.
- Ciwan, M. (1992), *Türkçe Açıklamalı Kürtçe Dilbilgisi Kurmanci Lehçesi*, Sweden, Jîna Nû
- Downing, A., û Philip, L. (2006). *English grammar: A university course* (Second Edition). London: Routledge.
- Givon, T. (2001). *Syntax: An introduction Volume I*. John Benjamins Publishing Co.
- Güzel, Ş. (2018). Lêkolîneke sentaksî li ser berhema Camî'eya Rîsaleyan û Hikayetan, (Teza Lîsansa Bilind), <https://tez.yok.gov.tr/>, 491269.
- Huddleston, R., Pullum, G. K., & Reynolds, B. (2022). *A Student's Introduction to English Grammar*. (Second Edition). United Kingdom: Cambridge University Press.
- Kızıl, H. (2019). Kurmanci'de Tekîd [di]'sı . *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi* , 5 (10) , 47-74 .
- Kurdo, Q. (1981). *Zimanê Kurdî Rêziman*. Frankfurt: Weşanên KOMKAR
- Öcek, N. (2020). *Waneyên Rêzimana Kurmanci*. Weşanên sîtav. İstanbul
- Thomson, A. J. & Martinet, A. V. (1986). *A Practical English Grammar*. (Fourth Edition). Hong Kong: Oxford University Press.
- Tan, S. (2015). *Rêzimana Kurmanci*. İstanbul: Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.
- Xanî, E. (2010). *Mem û Zîn (Şirove û Kurdiya Îro: Jan Dost)*. İstanbul: Weşanên Avesta.
- Xanî, E. (2022). *Mem û Zîn*. (Amadekar: Huseyn Şemrexî). (Çapa Şeşem). İstanbul: Nûbihar.

## Mersiyeyên Kurmancî Yên Ku Helbestvanan Li Ser Zarokên Xwe Hûnandine

### Şairlerin Kendi Çocukları İçin Yazdıkları Kurmanci Mersiyeler Kurmanji Elegies Written by Poets for Their Own Children

Cihan TURAN

<b>Cihan TURAN</b>	Cihan TURAN   <a href="https://orcid.org/0000-0002-9613-3056">https://orcid.org/0000-0002-9613-3056</a>   <a href="mailto:cihanturan7272@gmail.com">cihanturan7272@gmail.com</a> Dr., Independent Researcher, Türkiye
<b>Jêgir</b> Citation Atf	Turan, C. (2024). Mersiyeyên Kurmancî yê ku Helbestvanan li ser Zarokên Xwe Hûnandine. <i>The Journal of Mesopotamian Studies</i> (16), 80-100 DOI: <a href="https://doi.org/10.35859/jms.2024.14444690">https://doi.org/10.35859/jms.2024.14444690</a> .
<b>Dîroka Şandinê</b> Submission Date Geliş tarihi	28.02.2024
<b>Dîroka Qebûlê</b> Acceptance Date Kabul Tarihi	28.04.2024
<b>Dîroka Weşandinê</b> Publication Date Yayın tarihi	30.03.2024
<b>Cureyê Gotarê</b> Article Type Makale Türü	<b>Gotara vekolînê</b> Research article Araştırma makalesi
<b>Hakemî</b> Peer-Review Hakemlik	<b>Cot Nenas – Du ji derve</b> Double anonymized - Two External Çift Taraflı Kör Hakemlik – İki hakem
<b>Beyana Etîk</b> Ethical Statement Etik Beyanı	<b>Hatîye beyankirin ku di pêkanîn û nivîsina vê xebatê de hemû rêzikên zanistî û etîk hatine şopandin û hemû çavkanî bi awayekî têkûz hatine referanskirin</b> <i>It is declared that scientific and ethical principles have been followed while carrying out and writing this study and that all the sources used have been properly cited.</i> Bu çalışma yapılırken ve yazılırken bilimsel ve etik ilkelere uyulduğu ve kullanılan tüm kaynaklara uygun şekilde atıfta bulunulduğu beyan edilir.
<b>Kontrola İntihalê</b> Plagiarism Checks Benzerlik Kontrolü	<b>Belê – iThenticate</b> Yes – iThenticate Evet – iThenticate
<b>Nakokiyên Berjewendiyar</b> Conflicts of Interest Çıkar Çatışması	<b>Di gotarê de di navbera nivîskar û ti aliyên din nakokîya berjewendiyê tune ye.</b> <i>There is no conflict of interest between the author and any parties in the article.</i> Yazar ile makalede yer alan taraflar arasında herhangi bir çıkar çatışması bulunmamaktadır.
<b>Alîkarîya Darayî</b> Grant Support Maddi Destek	<b>Nivîskar beyan dike ku wan wî ji bo vê vekolînê ti fonên derveyî wernegirtine.</b> <i>The author(s) acknowledge that they received no external funding in support of this research.</i> Yazar(lar), bu araştırmayı desteklemek için herhangi bir dış fon almadıklarını kabul etmektedirler.
<b>Mafê Telifê &amp; Destûr</b> Copyright & License Telif Hakkı & Lisanslama	<b>Nivîskar li jer lisansa CC BY-NC 4.0 mafê xwe yê li ser xebata xwe diparêzin.</b> <i>Authors publishing in the journal retain the copyright to their work licensed under the CC BY-NC 4.0.</i> Dergide yayın yapan yazarlar, CC BY-NC 4.0 kapsamında lisanslanan çalışmalarının telif haklarını saklı tutarlar.

## KURTE

Mersiyeyên ku ji bo mirina însanan tên nivîsîn yek ji wan cureyên nezmê yê edebiyata me ya klasîk in û xwedî cihêkî taybet in. Ew mersiyeyên ji bo mirina kesekî ku jê tê hezkirin hatine hûnandin; wê êş û elema ku ji ber mirinê tê kişandin, agahiyên derheqê kesê mirî de û hinek agahiyên şexsî yê şa'ir di nav xwe de dihewinin. Ji ber vê yekê mirov dikare bibêje mersîye; serpêhatî, tecrube û hestên şa'iran li ber çavên xwîneran radixin. Armanca vê xebatê ew e ku bê derxistin holê ka di edebiyata kurdî ya klasîk de ji teref kîjan mersiyenûsê kurd ve çend mersîye bi zaravayê kurmancî li ser zarokan hatine nivîsîn. Di vê bergehê de pêşî bi kurtasî pênaseya mersiyeyê hat kirin û dûre ew mersiyeyên ku bi kurdîya kurmancî li ser zarokan hatine nivîsîn, hat vekolîn. Piştî ku hat tesbîtkirin kîjan şa'irî li ser qîz an jî lawê xwe çend mersîye nivîsîne, hat vekolîn ka mersiyenûsan ji ber mirina zarokên xwe êş û elemeke çawa kişandine. Di encama lêkolînê de ku bi rê û rêbaza lêkolîna dîrokî hat kirin ew mersiyeyên di kitêbên çapkirî û destxetan de bi rê û rêbaza analîzê hatin vekolîn. Di encama xebatê de hat tesbîtkirin bi kurdîya kurmancî mersiyeya ewil a li ser zarokan, di sedsala XVIIIan de hatiye nivîsîn û ji wê qernê heta roja me ya îro ji ber mirina zarokan bi tevahî 104 mersîye hatine nivîsîn. Nixandînen di vê xebata de di çarçoveya van 104 mersiyeyan de hatin kirin.

**Peyvên Sereke:** Edebiyata klasîk, kurdî, kurmancî, mersîye, zarok.

## ÖZ

Ölüm için yazılan mersiyeler klasik edebiyatımızın nazım türlerinden biridir ve edebiyatımızda önemli bir yere sahiptir. Sevilen bir yakınının üzerine yazılan bu mersiyeler; ölümden dolayı çekilen ıstırap ve acıyı, ölen hakkındaki kimi bilgileri ve şairin bazı şahsi bilgilerini barındırmaktadırlar. Bu bilgiler bağlamında mersiyeler şairlerin kimi tecrübe, yaşanmış kıssalarını ve birçok duygularını okurların gözleri önüne sermektedir. Bu çalışmanın amacı hangi Kürt mersiyeci tarafından Kurmancî lehçesiyle kendi çocuğu üzerine kaç mersîye yazıldığını ortaya çıkarmaktır. Bu bağlamda kısaca mersiyenin tanımı yapıldıktan sonra Kürt mersiyecilerin Kurmancî lehçesiyle kendi çocuklarının üzerine yazdıkları mersiyeler incelenmiştir. Araştırmada hangi şairin kızı veya oğluna kaç mersîye yazdığı tespit edildikten sonra bu mersiyelerde şairlerin ölen çocuklarından dolayı nasıl bir acıya büründükleri incelenmiştir. Tarihi araştırma metoduyla yapılan araştırma neticesinde matbu ve el yazması eserlerdeki mersiyeler tespit edilip analiz edilmiştir. Araştırma neticesinde Kürtçe'nin Kurmancî lehçesi ile ilk mersiyenin 18. yüzyılda yazıldığı ve o zamandan günümüze kadar çocukların ölümleri üzerine toplam 104 mersîye yazıldığı tespit edilmiştir. Araştırmadaki değerlendirme ve incelemeler tespit edilen bu 104 mersîye çerçevesinde yapılmıştır.

**Anahtar Kelimeler:** Klasik Edebiyat, Kürtçe, Kurmancî, Mersîye, Çocuk.

## ABSTRACT

Elegies, a poetic genre within classical literature, hold a significant position in our literary tradition, capturing the essence of loss and grief for departed loved ones. They encapsulate the anguish of death, offer insights into the lives of the deceased, and provide glimpses into the personal experiences of the poets themselves. This study aims to explore the corpus of Kurdish elegies written in the Kurmanji dialect specifically dedicated to the poets' own children. In this context, after a brief definition of the elegy, the elegies written by Kurdish elegiac poets in the Kurmanji dialect about their own children were examined. Through meticulous examination, the study identifies the number of elegies authored by each poet for their daughters or sons, and analyzes the poets' expressions of mourning for their deceased children within these elegies. Employing historical research methods, the study identifies and analyzes elegies from both printed and manuscript sources. The findings reveal that the earliest Kurmanji elegy dates back to the 18th century, with a total of 104 elegies dedicated to children's

deaths identified thus far. The analysis and evaluation in this thesis are centered on these 104 identified elegies.

**Keywords:** Classical Literature, Kurdish, Kurmanji, Elegies, Children.

### Destpêk

Di jiyana rojane ya însên de hinek tişt hene ku însan bivênevê rastî wan tê û bi wan re rûbirû dimîne. ‘Eşq, fîraq û mirin ji van çend tişt in ku ew hestên gerdûnî ne û ji bo şa’iran hertim bûne mijara şî’rên wan. Di nav mijarên navborî de mijarek heye ku şa’iran ji bo wê di şî’rên xwe de cihekî taybet veqetandine û hest û ramanên xwe û tiştên di qelbên xwe de bi şiklekî samîmî û jidil anîne zimên. Di edebiyatê de navê mersiyyê li van şî’iran wiha hatiye danîn. Ji bo ev mersiye karibin bîn nivîsîn divê miheqeq pêwendîya nivîskar û kesê mirî bi hev re hebe (Çavuş, 2008:132). Sedemeke hebûna vê pêwendiyê heye. Lewra eger ev pêwendî hebe dê mersiyyên karibe eş û elemê di bedena xwe de hîs bike û bi terza mersiyyê bînê zimên û derdora xwe pê bide hisandin. Ji ber vê sedemê em dikarin bibêjin ku mersiye ji aliyekî ve helîna derd, kul, eş û eleman û her wisa neynika dilê şa’ir e ku tê de tecrubeyên şexsî yên şa’ir tînan nîşandan. Şa’ir dema ku mersiyya xwe li ser kesê mirî dinivîse bi şiklekî hûrgilî eş û elema ku dikişîne ji her alî ve tîne zimên û derheqê nasname, taybetî û wesfên mirî de agahîyan bi me re parve dike. Şa’ir ji bilî van herwiha di mersiyya ku nivîsiye de sedema mirina wî kesî û hinek agahiyên mîna van jî bi me re parve dike. Mersiye, li gor kesên ku li ser wan hatine nivîsîn hatine dabêşkirin. Hinek lêkolîneran mersiye kirine heft beş ku ji yê padîşah, şehzade, wezîr, mezinên dewletê, şêx, dost û heval û endamên malbatê pêk tên (İsen, 1994: 3). Lê hinek lêkolîneran jî mersiye wekî mersiyyên ku li ser şexsan hatine nivîsîn û mersiyyên ku li ser welat, bajar, dîn û mirinê hatine nivîsîn kirine du beş û di bin her beşekê de li gor kesê ku mersiye li ser hatiye nivîsîn binbeş vekirine (Turan, 2023: 187).

Di encama lêkolînê de hat dîtin heta îro li ser mersiyyên klasîk ên kurdîya kurmancî bes pênc xebat hatine kirin. Ji van xebatan du xebat ji teref Ahmet Seyarî ve (Seyarî, 2019: 32-36), (Seyarî, 2019: 45-47), xebatek ji teref Sinan Hakan ve (Hakan, 2007: 45-47), xebatek ji teref Mesûd Serfiraz ve (Serfiraz, 2012:30-33) û xebateke jî ji teref Cihan Turan (Turan: 2023: 1-386) ve hatiye kirin. Di van xebatan de Ahmet Seyarî li ser mersiyyên du edîbên kurd, Sinan Hakan li ser çend edîbên ku ji Miksê derketine û li ser çend mersiyyên wan, Mesûd Serfiraz jî bi şiklekî giştî li ser mersiyyênûsiya di kurdî de û Cihan Turan jî destpêkê heta damezrandina Komara Tirkiyê li ser wan mersiyyênûsên kurd nixandî û lêkolîn kiriye ku bi kurmancî nivîsîne. Divê bê diyarkirin di xebata ku me berî niha amadekiribû de (Turan: 2023: 1-386) ji ber sînor û çarçoveya xebatê, me bes 13 mersiyyên li ser mirina qîz û kuran tesbît kiribû û navê wan dabû. Lêbelê di vê xebatê de hat behskirin ku 104 mersiyyên tesbît kirî, li ser qîz û kuran hatine nivîsîn û lêkolîn li ser wan hat kirin. Ji ber vê yekê ev xebata me ji xebata navborî ciyawaztir e.

Em ê di vê xebata xwe de giranîya xwe bidin ser wan mersiyyên ku li ser zarokan hatine nivîsîn û em ê hewl bidin ku tesbît bikin bê ka bi kurdîya kurmancî bi tevahî çend mersiye li ser kur û qîzan hatine nivîsîn. Dîsa em ê di vê xebata xwe de vekolînîna ka bavek piştî ku qîz an jî kurê wî rehmî dîke eş û elemeke çawa dikişîne, dema ku ew xebera mirina qîz an jî kurê xwe distîne helwesteke çawa nîşan dide û ew ji bo zarokên xwe yê ku rehmî kirine çî tiştan dibêje û ji bo axretê derheqê wan de çî tiştan xeyal û hêvî dike. Di encama lêkolînê de hat tesbît kirin 104 mersiye li ser mirina zarokan hatine nivîsîn. Xebata me li ser van 104 mersiyyan hat saz kirin. Ev 104 mersiye ji teref Axayokê Bêdarî, Mela Elîyê Baqûstanî, Mela Qasim, Mela Ehmedê Xelatî, Cegerxwîn, Mela Ehmedê Nalbend, Fehmî Begê Pêçarî û Mela Ebdullahê Babnîrî ve li ser zarokan hatine nivîsîn.



## 1. Mersiye

Mersiyeya (مرثیة pirjimara wê مرثیاتی) ku koka wê رثی ye di Erebi de tê maneya girî û şingirtina li ser kesê mirî (Toprak, 1990: 2). Di ferhengan de derheqê mersiyeyê de pênaseyên wiha tên kirin: Matema manzûmî (Kanar, 2011:788); manzûmeya ku li ser kesekî mirî hatiye nivîsîn (Devellioğlu, 2017: 722); lawij, xweşniyaz, xweşxwaz, dûrika mirîyan (Îzolî, 2013:885); ew helbesta ku ji bo pesnê kesê mirî bê dayîn û xemgînî û kovana ji ber mirinê bê nîşandan, hatiye nivîsîn (Pala, 2014:306); nezma ku bi mebesta diyarkirina wêşên baş ên zilamekî mirî an jî ji bo anîna zimên a ji wê eş û kerba ji ber mirina wî zilamî hatine nivîsîn (Sami, 1978:1321); strana matemî ya ku ji bo pesnê kesê mirî hatiye nivîsîn, helbestên ku nexasim di wan merasîman de tên xwendin ku ji ber salvegera Hesên û Huseyîne lawên 'Elî tên tertîpkirin. (Redhouse, 1987:1805); *û bi girî hejmartina* (???) başî û qenciyên kesekî ku mirîye (Naci, 1990: 602). Mersiye wekî terîm jî, ew helbest in ku piştî mirina kesekî ji bo nîşandayîna xemgînîyê tên gotin (İsen, 2012:4).

Kevneşopîya mersiyeyê di nav edebiyata kurdîya kurmancî ya klasîk de xwedî cihekî taybet e. Wekî şa'irên Faris (Mu'temen, 1954: 54-55), ji teref şa'irên kurd ve jî ji ber mirinê li ser gelek çînen civakê gelek mersiye hatine nivîsîn ku yek ji wan jî zarok bi xwe ne. Şa'irên kurd, ji bo kur û qîzên xwe yê ku rehmet kirine eş û elemên xwe di van mersiyeyan de anîne zimên û xwestine barê giran a li ser milên xwe û eş û elema di dilên xwe de sivik bikin. Di encama lêkolîna li ser wan mersiyeyên ku şa'irên kurd li ser zarokên xwe nivîsîne de hat tesbîtkirin ku di vê kategorîyê de ji teref 8 mersiyenûsan ve bi tevahî 104 mersiye li ser lawik û qîzan hatine nivîsîn. Ji van 104 mersiyeyan, 102 mersiye li ser kuran û 2 mersiye jî li ser qîzan hatine nivîsîn. Nûnerên vê kategorîyê Axayokê Bêdarî (m. piştî 1728an), Mela Qasim (m.17..?), Mela Ehmedê Nalbend (m.1964), Cegerxwîn (m.1984), Mela Ehmedê Xelatî (1934-...) , Mela 'Elîyê Baqûstanî (m.2002), Mela Ebdullahê Babnirî (1939-...) û Fehmî Begê Pêçarî (m.1969) ne.

Lazim e bê diyarkirin ji van 104 mersiyeyên ku qala wan hat kirin, bi tevahî 13 mersiye jixwe ji ber ku me derbarê mersiyeyan de xebateke giştî kiribû li ber destê me amade bûn. Digel van mersiyeyên heyî me ew dîwan û dîwançeyên çapkirî û destxetên neçapkirî û hinek kitêbên ji bo çapkirinê dihatin amadekirin vekolan. Di encama vê lêkolînê de me tesbîtkir ku di vî warî de 91 mersiyeyên din jî hatine nivîsîn. Piştî karê berhevkirinê mersiye wekî mersiyeyên li ser kuran û yê li ser qîzan hatin dabeşkirin û xebat û lêkolîn li ser van daneyan hat kirin.

### 1.1. Mersiyeyên ku li ser Kuran Hatine Nivîsîn

Di encama lêkolînê de hat tesbîtkirin di vî warî de ji teref 6 mersiyenûsan ve bi tevahî 102 mersiye li ser kuran hatine nivîsîn. Nûnerên vê qonaxê Axayokê Bêdarî, Mela Qasim, Mela Ehmedê Nalbend, Cegerxwîn, Mela Ehmedê Xelatî û Mela 'Elîyê Baqûstanî ye. Ji van 6 mersiyenûsan ê ku di vê kategorîyê de pêşeng e Mela Ehmedê Xelatî ye ku bi tevahî 90 mersiye li ser lawê xwe nivîsiye (Xelatî, ? : 1-401). Piştî wî, yê ku di vî warî de herî zêde mersiye nivîsiye bi 8 mersiyeyan Mela Ehmedê Nalbend e (Nalbend, ? : 2, 9, 11, 13, 17, 19, 24, 37). Piştî van her du mersiyenûsan Axayokê Bêdarî (Doskî, 2020: 42), Mela Qasim (Doskî, 2022: 164), Cegerxwîn (Cegerxwîn, 2018: 414) û Mela 'Elîyê Baqûstanî (Baqûstanî, 2017: 60) tên ku her yek ji wan di bes mersiyeyek nivîsîne.

Eger em bikevin pey wê mersiyeya ku di vî warî de ya yekem e, bi gotineke din di vî warî de kîjan mersiye cara yekem hatiye nivîsîn, em dikarin bibêjin mersiyeya yekemîn a Axayokê Bêdarî ye (Turan, 2023:250). Bêdarî, ev mersiyeya xwe li ser du lawên xwe nivîsiye ku di sala 1728an de rehmet kirine (Doskî, 2020: 43). Dema ku em li dîroka wêfata wan mersiyenûsên mîna Mela 'Elîyê Baqûstanî, Mela Qasim, Mela Ehmedê Xelatî, Mela Ehmedê Nalbend û Cegerxwîn mîze dikin em dibînin ev şa'ir piştî Bêdarî jiyane ku ev yek yekemînûna mersiyeya Bêdarî xurttir dike. Mersiyeya Bêdarî ya ku li ser mirina du lawên xwe hatiye nivîsîn ji hêla teşeya nezmê ve bi teşeya muxemmesê

hatiye nivîsîn û ji 8 bendan/pêncîneyan pêk tê. Behra mersiyeyê remel û qaliba wê jî fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun fa'îlun e.

Destpêka mersiyeya Bêdarî bî vî awayî ye:

**Fa'îlatun Fa'îlatun Fa'îlatun Fa'îlun**

*Remel* - + - - / - + - - / - + - - / - + -

Sed mixabin vê cewabê ez ji dil nalan kirim

Taqet û qûwet nema min belkî ez bêcan kirim

Leşkerê derdan geha min ji 'eqî talan kirim

Min nema qet xew bi carek bêser û saman kirim

Min du şahî çûne vêkra mubtelayê wan kirim (Doskî, 2020:42)

## 1.2. Mersiyeyên ku li ser Qîzan Hatine Nivîsîn

Di encamê de em rastî bes 2 mersiyeyan hatin ku ew bi kurmancî hatine nivîsandin. Yek ji van mersiyeyan a Fehmî Begê Pêçarî ye ku wî li ser qîza xwe ya bi navê Fikrîya (m.1963) nivîsiye (Pêçarî, 2019: 216) û ya din jî mersiyeya Mela Ebdullahê Babnirî ye ku wî jî li ser qîza xwe Fatima (m.2006) û nevîya xwe Feyza (m.2006) nivîsiye (Babnirî, 2012: 94). Di bergeha tesbîtkirina mersiyeya yekemîn a di vî warî de em dikarin bibêjin, eger dîroka wefata kesên ku li ser wan mersiyeyên hatine nivîsandin esas bê girtin em dikarin bibêjin mersiyeya yekemîn a di vî warî de ya Fehmî Begê Pêçarî ye ku qîza wî di sala 1963yan de rehmî kiriye (Demir, 2019: 30). Mersiyeya duyemîn jî ya Babnirî ye ku qîza wî jî di 11ê gulana 2006an de rehmî kiriye (Babnirî, 2012: 94).

Mersiyeya ku Fehmî Begê Pêçarî nivîsiye û teşeya wê ya nezmê qesîde ye ji 11 malikan pêk tê û behra wê remel û qaliba wê jî fe'îlatun fe'îlatun fe'îlatun fe'îlun e. Mersiya ku Mela Ebdullahê Babnirî jî nivîsiye teşeya wê ya nezmê murabbe' e. Ev murebbe'a ku ji 6 bendan pêk tê behra wê hezec û qaliba wê jî mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun fe'îlun e.

**Ji mersiyeyên ku li ser qîzan hatine nivîsîn çend beyt û bendên mînak:**

**Ji Fehmî Begê Pêçarî:**

**Fe'îlatun Fe'îlatun Fe'îlatun Fe'îlun**

*Remel* + + - - / + + - - / + + - - / + + -

Kewekî min di rewaqa cigerê de bû firî

Me du çav mane li seyra ufuqan ka zivirî (Demir, 2019: 216)

**Ji Mela Ebdullahê Babnirî:**

**Mefa'îlun Mefa'îlun Mefa'îlun Fe'îlun**

*Hezec* + - - - / + - - - / + - - - / + - -

Keça we ye Fatime li Meraşê qeza kir

Tevlî keça xwe Feyza ji mala bavê weda' kir

Derba li ser kezebê damarê bav zûwa kir

Du heb perçe canê min bi kêra ko heba kir (Babnîrî, 2012: 94)

**Navên mersiyenûs û kesên ku mersiye li ser wan hatiye nivîsîn û her wiha hejmara mersiyeyên wan wiha ye:**

Navê Helbestvan	Li Ser Kî Nivîsiye	Hejmara Mersiyeyên Wî
Axayokê Bêdarî	Li ser du lawên xwe	1
Mela Qasim	Lawê xwe Abdullah	1
Mele Ehmedê Nalbend	Lawê xwe Muhemmed	8
Mela Ehmedê Xelafî	Lawê xwe Mûnîr	90
Cegerxwîn	Lawê xwe Xurşîd	1
Mele 'Elîyê Baqûstanî	Lawê xwe Wehîd	1
Fehmî Begê Pêçarî	Li ser qîza xwe Fikrîya	1
Mela Ebdullahê Babnîrî	Li ser qîza xwe Fatima	1

## 2. Bav û Zarok di Mersiyeyan de

Ji ber ku mersiyeya ku hatiye nivîsîn li ser zarokan e di van mersiyeyan de em hest û ramanên mersiyenûs ango bav bi şiklekî zelaltir dibînin. Lewra bavê ku mersiyenûs e û kuran jî qîza wî rehmet kiriye li ser kur an jî qîza xwe bi xwe mersiye nivîsiye û di vê mersiyeyê de deriyê dilê xwe ji xwînerên xwe heta dawiyê vekirîye. Ji ber vê yekê şa'ir hem halê xwe yê ku ew ji ber mirina law an jî qîza xwe ketiye nav hem jî wê êş û elema ku ew dikişîne û herwiha qedr û qîmeta zarokê xwe yê ku rehmet kiriye bi teferûat tîne zimên. Şa'ir dema vê yekê dike gelek caran serî li hunerên edebî yê mîna teşbîh, telmîh, îstîfere û hwd. dide û wê êş û elema ku ew dikişîne bi me dide hesandin. Em ê di binbeşa jêr de li ser van mijaran hûr bibin ka şa'ir ji bo qîz an jî kurê xwe yê ku rehmet kiriye çi texeyul kiriye, ji ber mirina wî/wê pê re êşeke çawa peyda bûye.

### 2.1. Tesîra Mirinê li ser Bavê ku Mersiyenûs e

Mirin zexteke giran li ser bavê mersiyenûs dike û dinya li ber çavê însan reş dike. Lewra *êşa ku di nava bedena însên de cî girtiye, tîkîliya wî hem ji dinyayê û hem ji jî însan bi xwe qut dike* (Breton, 2019:19). Ji ber vê yekê bavê ku mersiyenûs e ji bo wê êş û elema xwe nişan bide di hinek beytên xwe de serî li hunerên edebî dide û xwe dişibîne Yaqûbê ku bi salan ji lawê xwe Êsif dût ketiye an jî Eyûbê ku kurman avêtibûn bedena wî.

Xelatîyê ku lawê wî Mûnîr rehmet kiriye, ji ber zexta mirinê li ser kurê xwe 90 mersiye nivîsiye. Êş û elema mirina lawê wî lê ew qas zêde dike ku ew di çarîna jêrîn de xwe dişibîne Yaqûbê ku bi salan ji Êsifê xwe dût ket, lê tu car îsyar nekir heta ku Xweda kurê wî lê vegehand. Xelatî bi vê yekê bi xwîneran dide famkirin ku di warê kişandina êş û elemê de ew mislê Yaqûb e.

**Mînak:**

**Ji Mela Ehmedê Xelatî:**

**Mustef'îlun Mustef'îlun**

*Recez* -- + - / - - + -

Hewar bê Hezretî Ya'qûb

Ji nefsê ra nebim mexlûb

'Iwec raha dike uslûb

Ji bo insanê vê 'esrê (Xelatî, ?: 307)

Babnirîyê ku qîza wî rehma kiriye jî piştî ku derd û kulên xwe di mersiyeyê de tîne zimên destnîşan dike ku ew jî mîna Eyûbê ku kurman laşê wî xwar ehlê sebrê ye û daîm serê xwe li ber fermana Rebbê aleman ditewîne.

**Mînak:**

**Ji Mela Ebdullahê Babnirî:**

**Mefa'îlun Mefa'îlun Mefa'îlun Fe'ûlun**

*Hezec* + - - - / + - - - / + - - - / + - -

Ya Reb ez te nas dikim wekî Eyûb sabir im

Ez ne yah im ne bah im ji nezanê kafir im

Bo fermana te her dem kemerbest im şakir im

Destê xwe li ber rehma te heta sibê vedigirim (Babnirî, 2012: 95).

Yek ji wan hêmanên din ên ku mersiyenûsên bav bi kar tînin bilbil e ku di nav teyran de ya ku herî çilekêş û xwedî êş û elem e. Di nezera mersiyenûsan de kurên wan mîna gulekî ne ku nû dibîşkinin û ew jî mîna wê bilbilê ne ku gula xwe winda kirine û dikin feryad û fixan û her tim rondikan dirijînin. Li gorî wan heta ku bilbil feryad û fixana xwe bi dawî neke ew ê êş û elema wan jî neqede û ew ê hertim binalin.

**Mînak:**

**Ji Cegerxwîn:**

**Mef'ûlu mefa'îlun fe'ûlun**

*Hezec* -- + / + - - - / + - -

Kengî li gulê nebarî şebnem

Kanî biçikin ziwa bibin çem

Bilbil negirî li rengê hemdem

Bavê te nema dinalî Xurşîd (Cegerxwîn, 2018: 464)

Di hinek mersiyeyan de mersiyenûs dev ji bax, bexçe, bilbil û gulan berdide û mala xwe dişibîne wê mala ku kes lê nemaye û kund lê dixwînin. Ev yek bi xwe jî derûnîya şa'ir û tesîra mirinê ya li ser wî nîşanî me dide.

**Mînak:**

**Ji Mela Ebdullahê Babnirî:**

**Mefa'îlun Mefa'îlun Mefa'îlun Fe'ûlun**

*Hezec* + - - - / + - - - / + - - - / + - -

Belê li ser Babnîrê bû teyrok û dûman e

Mala wî warê kunda ne deşt e ne zozan e

Di deh û yekê gulanê sosin di bax nemane

Nema ava yek warek warê wê tev wêran e (Babnirî, 2012: 94)

Di wan mersiyeyên li ser zarokan hatine nivîsîn de bavên mersiyenûs carinan ji ber windakirina qîz an jî lawê xwe bihara wan dibe payîz, havîna wan dibe zivistan. Ew ji ber mirina ku pêk hatiye êş û elemeke wisa dikişînin ku li ser mala wan dibe teyrok û dûman, fesla zivistanê bi ser wan de tê û dar û ber hişk dibin û kanî ziwa dibin. Em vê yekê di mersiyeya ku Babnirî li ser qîza xwe, Nalbend û Cegerxwîn li ser kurên xwe nivîsîne de dibînin.

**Mînak:**

**Ji Mela Ebdullahê Babnirî:**

**Mefa'îlun Mefa'îlun Mefa'îlun Fe'ûlun**

*Hezec* + - - - / + - - - / + - - - / + - -

Belê li ser Babnîrê bû teyrok û dûman e

Mala wî warê kunda ne deşt e ne zozan e

Di deh û yekê gulanê sosin di bax nemane

Nema ava yek warek warê wê tev wêran e (Babnirî, 2012: 94)

**Ji Mela Ehmedê Nalbend:**

**Mefa'îlun Mefa'îlun Mefa'îlun Mefa'îlun**

*Hezec* + - - - / + - - - / + - - - / + - - -

Me hat fesla zivistanê xema di dil da helavêtin

Ketîn qeydê û zîndanê ku celladê bi xêr têtin (Nalbend, ?: 25)

**Ji Cegerxwîn:**

**Mef'ûlu mefa'îlun fe'ûlun**

**Hezec** -- + /+ --- /+ --

Hişk bûne li ser serê me ev dar

Havîn e ziwa ne co û cobar

Qawanê dilem şikestî yekcar

Lê bavê te her dinalî Xurşîd (Cegerxwîn, 2018: 414)

## 2.2. Cihê Zarokan di Nezera Bavê Mersiyenûs de

Di nezera bavên ku mersiyenûs in û mersiye li ser qîz an jî kurên xwe nivîsîne de qîz an jî kurên wan ewqas bi qedr û qîmet in ku bi mirina wan pir diêşin. Ew, ji bo ku vê qedr û qîmeta wan a di nezera xwe de nişan bidin di mersiyeyan de zarokên xwe dişibînin Ûsîfê ku ji bavê xwe dût ketiye, tava ku xûsuf bûye, heyva ku pir xweşik e; bilbil, qumrî û kewa ku bi xweşikbûna xwe balê dikişînin ser xwe, gul, çiçek û kulîlkên bedew in û dur û gewherên ku bi qedr û qîmet in. Ev wesfandin tev tîn kirin da ku bê zanîn ka zarokê rehmet kiriye di nezera mersiyenûsê bav de xwedî qedr û qîmeteke çawa ye û ew çiqas ji zarokê hez dike.

Di mersiyeyên ku ji teref Mela Ehmedê Xelatî ve hatine nivîsîn de tî dîtin asta êşkişandinê ewqas lê zêde dike ku ew lawê xwe Mûnîr dişibîne Ûsîfê ku bi salan ji bavê xwe dût ketiye û di talîyê de lê vegeyriyaye. Ew, bi vî awayî bang li Mûnîrê ku di nezera wî de mîna Ûsîf xweşik e û ji bavê xwe dût ketiye dike da ku lê vegere.

**Mînak:**

**Ji Mela Ehmedê Xelatî:**

**Mustef'îlun Mustef'îlun**

**Recez** -- + - /- - + -

Me êş sîroz e sîroz e

Me ne 'îd e ne Newroz e

Munîr daim cîger sîz e

Hewar bê Yûsufê Misrê (Xelatî, ? : 307)

Heman Xelatî kur û wê bûka xwe ya ku digel hev di qezayekê de rehmet kirine û bûne sedema êşkişandinê dişibîninê *Mem û Zînê*.

**Mînak:**

**Ji Mela Ehmedê Xelatî:**

**Mefa'îlun Mefa'îlun Mefa'îlun Mefa'îlun**

**Hezec** + - - - /+ - - - /+ - - - /+ - - -

Di cîger da qecer tîr in dibarin şubhê baranê

Di qebrê da *Mem û Zîn* in me çav bû ebrê nîsanê (Xelatî, ? : 113)

Di wan mersiyeyên ku hatin lêkolînkirin de hat dîtîn ku di nezera mersiyenûsan de kesên ku nûra çav û dilan in, zarokên wan bi xwe ne ku ew di vî warî de wan dişibînin tav û heyva ku çavkaniyeke ronîkirinê ye. Di van mersiyeyan de zarok an mîna heyva çardehşeviyekî an jî mîna tavekê ne ku ew bi şewqa xwe dinyaya wan ronî dikin. Li gorî wan mirina kur an jî qîza ku heyv an jî şems e dibe sedem ku alem tev di tarîtiyê de bimîne. Ev tarîti carinan bi çûyîna ava ya rojê an jî bi xusûfa şemsê pêk tê. Lê ev tarîti di mersiyeyan de xwe wekî êş, elem û giriye nîşan dide.

Pêçarî di beyta mersiyeya xwe ya jêrîn de qîza xwe ya ku rehmet kiriye û bûye sedema kişandina êş û eleman dişibîne “*meh-tel’etê*” (Hilhatina heyvê) û bi çûyîna wê bi wî re ne sebr û ne jî qerar dimîne.

**Mînak:**

**Ji Fehmî Begê Pêçarî:**

**Fe’ilatun Fe’ilatun Fe’ilatun Fe’ilun**

*Remel* + + - - / + + - - / + + - - / + + -

Ji wê meh-tel’etê dûr im me nema sebr û qerar

Bi xiyal her me li bal in dev û lêvên şekirî (Demir, 2019: 216)

Di beyta mersiyeya jêrîn de jî Xelatî lawê xwe yê bi navê Mûnîrê ku miriye dişibîne tava ku çûye *xusûfê*<sup>1</sup> an ku tarî bûye. Ew bi vê yekê diyar dike ew tava ku pêşiya wî ronî dike ango ew kurê ku ji bo wî ronîya çav û dilan bû jê dûr ketiye ku ev yek jî bûye sedema helandina can û cegerê.

**Mînak:**

**Ji Mela Ehmedê Xelatî:**

**Mefa’îlun Mefa’îlun Mefa’îlun Mefa’îlun**

*Hezec* + - - - / + - - - / + - - - / + - - -

Şemsê taban çû xusûfê me heland can û cîger

Key xurem ez nan û avê cenneta min bû seqer (Xelatî, ? : 388)

Ji ber ku mersiye ji bo zarokan hatine nivîsîn; mexlûqên ji hev şîrîn û xweşîktir ên mîna kew, xezal, berxik û bilbilê digel gelek taybetmendiyên xwe di mersiyeyan de cih girtine. Li gor şa’ir zarokên wan jî mîna wan xweşik û şîrîn in. Carinan zarok di nezera bavê xwe de dibin mîna kew û bilbilekî ku ji hêlîna xwe yan jî ji bexçeya bavê xwe dûr ketine.

**Mînak:**

**Ji Fehmî Begê Pêçarî:**

**Fe’ilatun Fe’ilatun Fe’ilatun Fe’ilun**

*Remel* + + - - / + + - - / + + - - / + + -

Kewekî min di rewaqa cigerê de bû firî

---

1 Ji ber ku heyv dikeve navbera dinya û tavê tîrêjên tavê nagihîjin dinyayê. Ji ber vê yekê sî dikeve li ser dinyayê û bûyera girtina rojê pêk tê ku şairên klasîk vê bûyera ku di erebî de jê re xusûfa şemsê tê gotin bi rêya hûnerên edebî di şî’îrên xwe de bi kar anîne.

Me du çav mane li seyra ufuqan ka zivirî? (Demir, 2019: 216)

**Ji Mela Ehmedê Nalbend:**

***Fa'ilatun Fa'ilatun Fa'ilun***

***Remel*** - + - - / - + - - / - + -

Baxê min gul tê neman bilbil firî

Çû me talanê kurî ma bê bedel (Nalbend, ? : 11)

Carinan jî bavê ku qîz an jî lawê wî rehmet kiriye zarokên xwe dişibînin xezal an jî berxikekî şîrîn ku terka mala bavê xwe kirine û ji wî dûr ketine. Di van beyt û bendên jêrîn de tê dîtin ku Pêçarî çavên qîza xwe û Cegerxwîn jî çavên lawê xwe dişibîne yên xezalan.

**Mînak:**

**Ji Fehmî Begê Pêçarî**

***Fe'ilatun Fe'ilatun Fe'ilatun Fe'ilun***

***Remel*** + + - - / + + - - / + + - - / + + -

Bêheşî dûriya wan çavên xezalî û reş in

Di heş û bîra me cî girtine wan dêmên zerî (Demir, 2019: 216)

**Ji Cegerxwîn:**

***Mef'ûlu mefa'ilun fe'ûlun***

***Hezec*** - - + / + - - - / + - -

Ew qamet û qed û bejn û bala

Ew çavên di reş wekî xezala

Ew birhê zirav ji rengê dala

Her dem tu li xeyal î Xurşîd (Cegerxwîn, 2018: 414)

Di mersiyeyên kurdî yên ku li ser zarokan hatine nivîsîn de yek ji wan nebatên ku zarok herî zêde lê tîn şibandin gul e. Şa'irên mîna Xelatî û Bêdarî di mersiyeyên xwe de kurên xwe yên ku rehmet kirine şibandine sorgulan. Li gor Xelatî bi nemana sorgulan ya di nav bexçeyê de ew bûye wekî bilbil û qumrîya ku ji gula xwe bûye û nema dengê wî derdikeve. Bêdarî jî bi firqeta sorgulan ku bi vê yekê qesda mirina pêkve ya her du kurên xwe dike ew dest bi giriyê dijwar dike.

**Mînak:**

**Ji Mela Ehmedê Xelatî:**

***Mustef'ilun Mustef'ilun***

***Recez*** - - + - / - - + -

Me kir girîn me kir fixan



Sorgul di baxê me neman  
Lew dengê qumrî bulbulan  
Nayê guhan mîna berê (Xelatî, ? : 309)

**Ji Axayokê Bêdarî:**

***Fa'ilatun Fa'ilatun Fa'ilatun Fa'ilun***

***Remel - + - - / - + - - / - + - - / - + -***

Wê dema mesmû'î min bû hicreta cohtê kuran  
Xem li ser pişta me hazir bûne barê oştiran  
Sitirî nabim ez tu car êdî ji vî barê giran  
Rîş û rih her du me şil bûne ji ava hêstiran  
Furqeta wan sorgulan ez bê'eded girîyan kirim (Doskî, 2020: 43)

Di nezera dê û bavê zarokê de, ew gelek zêde bi qedr û qîmet in. Di mersiyeyan de hat dît in ku şa'ir kurê xwe yê ku rehmet kiriye dişibîne cewher û durran. Weke ku di pêncîneya jêrîn de tê dît in Baqûstanî lawê xwe yê bi navê Wehîd şibandîye “*cewherek 'alî 'enasir*”a (Baqûstanî, 2017: 61) ku bi qedr û qîmet e û ji nirxa wê tiştek kêma nabe.

**Mînak:**

**Ji Mela 'Elîyê Baqûstanî:**

***Fa'ilatun Fa'ilatun Fa'ilatun Fa'ilatun***

***Remel - + - - / - + - - / - + - - / - + - -***

Cewherek 'alî 'enasir ez dibêjim ew Wehîd  
Timmî şakir hem jî sabir ew ji rebbê xwey hemîd  
Qet ji rebbê xwe yê şafi nebû carek bê omîd  
Ah ji sewta wî hezîn û ku di şî'rê da mezîd  
Bike îhsan tu ji lutfê nî'me ecrul-muhsînîn (Baqûstanî, 2017: 61)

Yek ji wan hêmanên ku şa'ir zarokên xwe dişibîninê, ronahî yan jî nûr e. Şa'ir di mersiyeyên xwe de zarokên xwe yê ku rehmet kirine wekî ronahiya çavan û nûra li ser qelbê xwe nîşan didin. Bi rehmetkirina wan êdî çavên wan bêronahî û qelbên wan jî bènûr dimîne. Şa'ir bi vê yekê diyar dîkin bi wefata wan çavên wan kor dibin ku ew ji ber vê yekê pêşîya xwe nema dibînin û qelbê wan ji ber bènûriyê di nav tarîtiyê de dimîne.

**Mînak:**

**Ji Mela Qasim:**

***Fa'ilatun Fa'ilatun***

*Remel* - + - - / - + - -

Quwet û taqet cuda bû rahet û sebr nemabû

Ruhnîya min ‘Ebdila bû wey dilê min wey dilo (Doskî, 2022: 166)

**Ji Mela Ehmedê Nalbend:**

**Fa’ilatun Fa’ilatun Fa’ilatun Fa’ilun**

*Remel* - + - - / - + - - / - + - - / - + -

Ev rihê spî bê didanî taqet û çavêd qusûr

Ev hemî ‘eyb in li ser min qelb ma bê şewq û nûr

Hîvîya min her ew e kur malekî birbîte jor

Qet li dinyayê nema min tuxmî meqsûd û murad (Nalbend, ?: 2)

Dema ev mersîyeyên ku li ser zarokan hatine nivîsîn ji hêla qîz û kuran ve bê nirxandin mirov dikare bibêje; mersiyenûsên ku bav in di warê qîmetdayînê û diyarkirina êş û elemê de tu ferq nexistine navbera qîz û kuran. Teşbîh an jî hunerên edebî yê ku ji bo kurekî di mersîyekekê de hatiye bikaranîn, tê dîtin ku ji teref mersiyenûsekî din ve jî vê carê ji bo qîza rehmetkirî hatiye bikaranîn.

### 2.3. Asta Êş û Elemê û Helwesta ku ji ber Mirinê tê Nîşandan

Şa’irê klasîk dema ku bixwaze wê helwesta xwe ya ji ber mirina zarokên xwe nîşan bide serî li gelek hunerên edebî dide û dixwaze ehlê gundê xwe yan jî temamê dost û hezkiriyên xwe bike şîrikê vê êş û elema ku ew dikişîne. Di çarîna Babnîrî ya li jêrîn de tê dîtin Babnîrî destnîşan dike ku qîza wî bi wefata xwe bes ne li ser serê wî bi heman awayî li ser serê temamê ehlê Babnîrê dibe teyrok û dûman. Ew bi vî şiklê ehlê gund jî dike şîrikê êşa xwe. Dîsa di çarîneya jêrîn a Baqûstanî de tê dîtin ku ew bang li temamê dost û hezkiriyên xwe dike da ku ew Wehîdê wî ji bîr nekin û bibin şîrikê êşa wî û tim û tim jê re diayan bikin.

**Mînak:**

**Ji Mela Ebdullahê Babnîrî:**

**Mefa’îlun Mefa’îlun Mefa’îlun Fe’ûlun**

*Hezec* + - - - / + - - - / + - - - / + - -

Belê li ser Babnîrê bû teyrok û dûman e

Mala wî warê kunda ne deşt e ne zozan e

Di deh û yekê gulanê sosin di bax nemane

Nema ava yek warek warê wê tev wêran e (Babnîrî, 2012: 94)

**Ji Mela ‘Elîyê Baqûstanî:**

**Fa’ilatun Fa’ilatun Fa’ilatun Fa’ilatun**

*Remel* - + - - / - + - - / - + - - / - + - -

Gelî dost û ji muhibba vî Wehîdî ji bîr mekin  
Hem di rewza wî de daîm dilê wî jî xweş bikin  
Hûn ji xeyr û ji duayan pur ji wî re tim bikin  
Hem Xwedayê wî yê rehîm hûn ji wî razî bikin  
Fatîha jî tim dewamî hûn bi hev ra tim bixwîn (Baqûstanî, 2017: 62)

Dema ku di nav civakê de tiştekî nebaş an jî kovandar û elemnak pêk tê însan felekê wekî berpirs û mesûldarê wî tiştê dibînin, gazinan jê dikin û wî wekî dijminê xwe dibînin. Ev yek wekî adetekê di nava civakê de cihê xwe girtiye. Di wan mersiyeyên ku bi kurdîya kurmancî li ser zarokên mirî hatine nivîsîn de jî ev adet cihê xwe girtiye. Şa' irên kurd di gelek malik û bendên mersiyeyên xwe de ji felekê re bertekên dijwar nîşan didin û wê wekî dijminê xwe dibînin. Lewra li gor şa' iran mesûl û sedema vê mirinê felek bi xwe ye.

**Mînak:**

**Ji Fehmî Begê Pêçarî:**

**Fe'ilatun Fe'ilatun Fe'ilatun Fe'ilun**

*Remel* + + - - / + + - - / + + - - / + + -

Kelemê cewra felek şax û gulî dane di dil

Kûr e û agir û pêt e di kezêb pê xewirî (Demir, 2019: 216)

**Ji Mela Ehmedê Nalbend:**

**Mustef'ilun Mustef'ilun Mustef'ilun Mustef'ilun**

*Recez* - - + - / - - + - / - - + - / - - + -

Rebbê Xenî bir ew benî dil bû tenî nahêt kenî

Sotin gelek ez bûm xelek dujmin felek lew ez meham (Nalbend, ?: 14)

Di edebiyatê de, mibaxele tiştekî weke ku nabe an jî ji wesfê wê zêdetir an jî kêmtir nîşandan e û tesîra gotinê zêde dike (Pala, 2014: 338). Bi gotineke din ji alîyê rewanbêjîyê ve jî gava mirov hestekê vebêje, dikare ji xelesa rastiyê derkeve û wê mezintirîn nîşan bide an jî rewşa wê ya heyî dikare biçûktir û kemtir jî diyar bike (Saydun, 2018: 107). Di encama vî tiştê ku tê kirin de hunera edebî ya mibalexeyê derdikeve holê. Ev cureya hunerê ji teref mersiyenûsên kurd ên ku li ser zarokên xwe mersiye nivîsîne ve jî hatiye bikaranîn. Lewra êş û elema mirinê ji mersiyenûs re pir giran tê. Mersiyenûsên kurd ji bo ku karibin xwînerên xwe têxin bin tesîra xwe û wê êş û elema di dilê xwe de bi xwînerên xwe bidin hisandin serî li vê hunera edebî dane.

Nalbend di beyta mersiyeya xwe ya jêrîn de ji bo xwînerên xwe bixe bin tesîra xwe serî li hunera mibaxaleyê daye û diyar kiriye ku ji ber mirina lawê wî piştî demekê çavên wî bûne mîna çoya ku xwîn jê diherike. Dîsa Xelatî jî ji bo tesîra gotina xwe zêde bike heman huner bi kar anîye û diyar kiriye ji ber girî hêstirên wî wekî Çemê Nîlê herikîne.

**Mînak:**

**Ji Mela Ehmedê Nalbend:**

**Mustef'îlun Mustef'îlun Mustef'îlun Mustef'îlun**

*Recez* - - + - / - - + - / - - + - / - - + -

Hindî xiyal min tête bal berxê delal nehête mal

Lew her du çav xun co û av jê çûn belav bê sebir mam (Nalbend, ?: 13)

**Ji Mela Ehmedê Xelatî:**

**Mefa'îlun Mefa'îlun Mefa'îlun Mefa'îlun**

*Hezec* + - - - / + - - - / + - - - / + - - -

Me hêstir bûne behra Nîl giran derd e giran derd e

Ji bîr nake Munîr gustîl lema çavê me girt perde (Xelatî, ?: 113)

Şa'ir dema ku xemgîniyên xwe yên ji ber mirina zarokên xwe tînin ziman serî li gelek hêmanan didin. Di taliyê de ji ber êş û elema ku ew dikişînin, bi gotineke din piştî mirina zarokên xwe tu qedr û qîmeta dinyaya fanî li ber çavên wan namîne. Nalbend û Qasim jî di çarîn û beytên mersiyeyên jêrîn de destnîşan dikin ku piştî mirina lawên xwe tu qedr û qîmeta vê dinyayê di nezera wan de nemaye.

**Mînak:**

**Ji Mela Ehmedê Nalbend:**

**Fa'îlatun Fa'îlatun Fa'îlun**

*Remel* - + - - / - + - - / - + -

Min hebû li milkê dinê ew kur tinê

Min viyabû bo kelim û xwendinê

Dê çi lê kin paş wî malê dinê

Şibhê serradê me mêlak bûye kun (Nalbend, ?: 17)

**Ji Mela Qasim:**

**Fa'îlatun Fa'îlatun**

*Remel* - + - - / - + - -

Hêstirêd min tîn di gavê mislê cobarê di avê

Bê kuran dunya min navê wey dilê min wey dilo (Doskî, 2022: 166)

Lênerîna mirinê ya şa'irên kurd ên klasîk li gor bawerîya Îslamê ye. Lewra ew dizanin însan, çawa ku ji dayik dibe û mezin dibe bi heman awayî dema ku wextê wî yê tayînkirî tê, bi rastiya “*Dê her nefis mirinê tehm bike*” di Qur’ana Kerîm de (Beqere:185) behskirî rû bi rû dimîne û mirinê tehm dike. Ji ber vê yekê êş û elema ku ew dikişînin û tiştê ku bi serê wan de hatiye çiqas mezin û giran be jî; wan

îman aniye ku li vê dinyayê her çi bê serê wan bi teqdîr û fermana Xwedê ye. Ji ber vê yekê ew li hember qedere serê xwe ditewînin û razîbûna xwe nîşan didin.

Di çarîne û pencîneyên jêrîn de tê dîtin ku Babnirî û Bêdarî dizanin û îman anîne ku her çi bê serê wan bi teqdîr û qedera Xwedê ye. Ji ber vê yekê ew ji bo emr û teqdîra Xwedê hertim amade ne û razî ne.

**Mînak:**

**Ji Mela Ebdullahê Babnirî:**

**Mefa'îlun Mefa'îlun Mefa'îlun Fe'ûlun**

*Hezec* + - - - / + - - - / + - - - / + - -

Ya Reb ez te nas dikim wekî Eyûb sabir im

Ez ne yah im ne bah im ji nezanê kafir im

Bo fermana te her dem kemerbest im şakir im

Destê xwe li ber rehma te heta sibê vedigirim (Babnirî, 2012: 95)

**Ji Axayokê Bêdarî:**

**Fa'îlatun Fa'îlatun Fa'îlatun Fa'îlun**

*Remel* - + - - / - + - - / - + - - / - + -

Xeyn elîf beske ji nal û zarî waha derûn

Ew qezaya barî ye ma kes li wê çû kit bi rûn

Sa'etek texîrî nabîtin wela yesteqdimun

Herçî heq kit ew heq e îinna lillahî raci'un

Lê ji derd û hesretan ez bê 'eded giryan kirim (Doskî, 2020: 44)

Dema ku şa'ir bi emr û fermana Xwedê re rûbirû dimînin û xebera mirina zarokên wan ji wan re tê ew wekî ku me berê jî got bi teqdîra Xwedê razî dibin. Ew ji bo karibin vê razîbûna xwe bidomînin dîsa ji Xwedê sebrê teleb dikin da ku ew karibin vî barê giran rakin. Xelatî di mersiyeya ku li ser lawê xwe, Mûnîr nivîsiye de ji Xwedê teleba sebrê dike û dibêje “..bide sebrê” da ku ew rûreş neçe heşrê.

**Mînak:**

**Ji Mela Ehmedê Xelatî:**

**Mefa'îlun Mefa'îlun Mefa'îlun Mefa'îlun**

*Hezec* + - - - / + - - - / + - - - / + - - -

Bi heqqê Sakin el-Qinwat Xuda carek bide sebrê

Cenazê kur ji Alman hat bi vî derdî diçim qebrê (Xelatî, ?: 111)

#### 2.4. Tiştên ku Piştî Mirina Zarokan ji bo Wan Tê Hêvîkirin

Dema ku zarokên mersiyenûsan dimirin ew di mersiyeyên xwe de ji bo wan hinek tiştan daxwaz, hêvî û xeyal dikin. Lewra mirin di nezera wan de ji bo cîhana ebedî gava ewil e. Ew dinyaya axiretê ya ku bi mirina însan dest pê dike di nav xwe de heyata qebrê, qiyamet, haşir û mehşer, belavkirina kitêban, hesab, mîzan, sirat, şefaaf, cennet û cehennemê dihewîne (Harman, 2002: 120). Ji ber vê yekê bavê ku mersiyenûs e ji bo qîz an jî kurê xwe di vê pêvajoyê de hinek tiştan hêvî û daxwaz dike.

Babnirîyê ku li ser qîza xwe mersiye nivîsîye ji Xwedê daxwaz dike ku qîza wî Feyza digel Fatime di nav şehîdan de şa bibe. Babnirî bi vê yekê ji Xwedê daxwaz dike ew ji şehîdan bê hesibandin û bi wan re be.

**Mînak:**

**Ji Mela Ebdullahê Babnirî:**

**Mefa'îlun Mefa'îlun Mefa'îlun Fe'ûlun**

*Hezec* + - - - / + - - - / + - - - / + - -

Bi bal Ehmed me kar ke bi hevdi re şiyar ke

Di nav ehlê 'ebayê me li duldulê suwar ke

Feyza digel Fatime di nav şehîda cuda ke

Piştî evan fixanan qelbê min jarî şa ke (Babnirî, 2012: 95)

Şa'ir teleb û daxwaz dikin ku qebra miriyên wan tije nûr be û ne tarî be. Dîsa hêvî dikin ku ew, di qebrê de karibin hisabeke sivik bidin melekên bi navên Munkir û Nekîr. Di mersiyeyên ku Xelatî nivîsîye de tê dîtîn ku ew daxwaz dike Pêxember bibe şefaafkarê lawê wî û hesabê wî yê li qebrê ne zehmet be.

**Mînak:**

**Ji Mela Ehmedê Xelatî:**

**Mefa'îlun Mefa'îlun Mefa'îlun Mefa'îlun**

*Hezec* + - - - / + - - - / + - - - / + - - -

Di qebra kûr Nekîr Munker sûala wan cewabê zor

Şefî'e zatê pêxember ne tîrsa tu ji qebr û gor (Xelatî, ?: 112)

**Fa'îlatun Fa'îlatun Fa'îlatun Fa'îlun**

*Remel* - + - - / - + - - / - + - - / - + -

Min heşir ke Reb bi wan ra em bi hevra bin neşir

Min umîd lutfa Xuda ye bax û bostan be qebir (Xelatî, ?: 4)

Şa'ir ji bo qîz û kurên xwe ji Xwedê daxwaz dikin da ku qebrê zarokên wan tije nûr be û hesabê wan sivik be. Herwiha şa'ir ji Xwedê lava dikin zarokên wan têkevin cinetê û ji ava kewserê vexwin. Xelatî di beyt û çarîneyên jêrîn de pêşî daxwaz dike ku cihê kurê wî cinet be û dûre ew biçe ber serê Hewza Kewserê avê jê vexwe.

**Mînak:**

**Ji Mela Ehmedê Xelatî:**

**Mefa'îlun Mefa'îlun Mefa'îlun Mefa'îlun**

*Hezec* + - - - / + - - - / + - - - / + - - -

Munîrê min xuya nake me ne dost eqreba yar e

Buğuşt cay be bi wî şa be dinalim subh û êvar e (Xelatî, ?: 387)

**Mustef'îlun Mustef'îlun**

*Recez* - - + - / - - + -

Her wext dibêm hey wax Munîr

Derdek li min kirye zehîr

Hêvî dikim ji Rebê qedîr

Vexû tu ava kewserê (Xelatî, ?: 309)

Lêbelê divê bê diyarkirin hinek şa'ir ku yek ji wan Baqûstanî ye, ji xeynî xwestina têtetina cinetê ya kurên xwe ji Xweda dixwazin ku “hûr û wildan” di cinetê de tu carî li ser serê wan kême nebe.

**Mînak:**

**Ji Mela 'Elîyê Baqûstanî:**

**Fa'îlatun Fa'îlatun Fa'îlatun Fa'îlatun**

*Remel* - + - - / - + - - / - + - - / - + - -

Tu yî xeffarê zunûban timm û daîm jêr bike

Ji qusûrên 'aliyata jêr nesîb û cî bike

Hûr û wildanan li ser wî timm û daîm kom bike

Hem ji emn û ji selamet tu ji wî re xas bike

Hêvî û qesda me ye tim jî tu yî Rebbil'alemin (Baqûstanî, 2017: 62)

Ji bilî cihekî ku tê de Babnirî ji bo qîza xwe daxwaz kiriye ku ew bikeve nav şehîdan û cinetê tişteki din hêvî û daxwaz nekiriye. Dema li seranserê mersiyeyên ku ji bo qîzan hatine nivîsîn bê mêzekirin -ku bes du heb in- dê bê dîtî mersiyenûsan di mersiyeyên xwe de ji serî heta binî şîna qîzên xwe girtine û wesfên wan anîne zimên. Lêbelê şa'irên ku ji bo kurên xwe mersiye nivîsîne daxwaz, temenî û hêvîyên xwe di warê qebr, axret, mehşer, hesab û cinetê de bi şikleki hûrgilî anîne zimên.

### Encam

Eger mersiyeya Axayokê Bêdarî ya ku di sedsala XVIIIan de hatiye nivîsîn a ewil bê qebûlkirin mirov dikare bibêje ku di warê mersiyeyên ku li ser zarokan hatin nivîsîn de digel Bêdarî ji teref 8 mersiyenûsan ve bi tevahî 104 mersiye li ser qîz û kuran hatine nivîsîn. Nûnerên vî warî Axayokê Bêdarî, Mela Qasim, Mela Ehmedê Nalbend, Cegerxwîn, Mela Ehmedê Xelatî, Fehmî Begê Pêçarî, Mela Ebdullahê Babnirî û Mela 'Eliyê Baqûstanî ne.

Ji 104 mersiyeyan 2 mersiye li ser qîzan û 102 mersiye li ser kuran hatine nivîsîn. Ji van 104 mersiyeyan ya ku pêşî hatiye nivîsîn ya Axayokê Bêdarî ye ku ew vê mersiyeya xwe li ser her du zarokên xwe nivîsiye ku di sala 1728an de rehmet kirine.

Nûnerên beşa mersiyeyên ku li ser qîzan hatine nivîsîn Fehmî Begê Pêçarî, Mela Ebdullahê Babnirî ne. Her yek ji wan mersiyeyek li ser mirina qîza xwe nivîsiye. Axayokê Bêdarî, Mela Qasim, Mela Ehmedê Nalbend, Cegerxwîn, Mela Ehmedê Xelatî û Mela 'Eliyê Baqûstanî jî ew mersiyenûs in ku li ser mirina kurên xwe mersiye nivîsîne. Ji van mersiyenûsan ê ku herî zêde li ser kurê xwe mersiye nivîsiye, bi 90 mersiyeyan Mela Ehmedê Xelatî ye. Piştî wî yê ku di vî warî de herî zêde mersiye nivîsiye bi 8 mersiyeyan Mela Ehmedê Nalbend e.

Di encama lêkolîna li ser van mersiyeyên kur û qîzan hat kirin de hat dîtîn, mersiyeyên zarokan yek ji wan mersiyeyan in ku tê de dengê bav bilindtir û dilzîztir tê bihîstin. Di van mersiyeyên ku bi zaraveya kurmancî hatine nivîsîn de şa'iran li dijî xebera mirina zarokên xwe helwesteke bi şîn û girî nîşan dane û ji bo kesên mirî gelek hêmanên şibandinê bi kar anîne û bi vê yekê qedr û qîmeta qîz an jî kurê xwe yê rehmetkirî nîşan dane. Dîsa di van mersiyeyan de hat dîtîn ku şairên kurd ên klasîk tabîrên mîna emra îlahî, qeza, qeder, sabir, tewekul, cinet û hwd. zêde bi kar anîne û ji bo jiyana dinyaya din a zarokên xwe hinek hêvî û daxwaz kirine. Yek ji wan xalên din ên balkêş ew e ku dengê bavê ku mersiyenûs e di asteke zêde de tê bihîstin. Bavan, di mersiyeyan de jî wezîfeya parastin û fedakariyê ji bo zarokên xwe anîne zimên.

Di mersiyeyên ku li ser zarokan hatine nivîsîn de exleb beşên mîna mirin, şîn-girî, pesindayîn, sîtema ji felekê, dinya û axret, sebir û dia hene ku bi şiklekî xurt û baş hatine şixulandin. Hat tesbîtkirin ku di mersiyeyên kurdî de herî zêde temayên mîna şîn, kişandina êş û elemê, reşgirêdan û rondikrijandin derdikevin pêş.

Herî dawîn dikare bê gotin ew kevneşopiya mersiyeyên ku li ser zarokan herçiqas di destpêkê de lawaz be jî di sedsala dawîn de bi mersiyenûsiya Mela Ehmedê Xelatî û Mela Ehmedê Nalbend pêş ve çûye ku ev her du şairan bi tevahî li ser zarokên xwe 98 mersiye nivîsîne.



### EXTENDED ABSTRACT

Just as death and the profound sorrow it brings have been a recurring theme in the literature of many cultures, so too has it found its expression in classical Kurdish literature. Throughout history, Kurdish writers have penned elegies to mourn the loss of loved ones, relatives, spouses, and friends. In these elegies, they candidly share the depths of their grief with readers, offering a poignant glimpse into their personal experiences of loss and longing.

This study delves into the elegies penned by classical poets in the Kurmanji dialect for their own children within Classical Kurdish Literature. The aim is to trace the origins of these elegies, identifying the first instance of such writing in Kurdish Literature and examining how many poets have contributed to this genre over the centuries. Furthermore, the study explores the portrayal of paternal pain within these elegies, analyzing how poets express their deep anguish and convey the significance of their children in their verses.

In the realm of classical Kurdish literature, there has been a notable dearth of academic exploration into elegies dedicated to deceased individuals, with only a handful of studies existing on the subject. Through research efforts, only three works specifically focusing on elegies have been identified. One of these works provides a broad definition of elegies alongside a few illustrative examples. The remaining two studies delve into the analysis of elegies composed by Mele Zahire Tendureki and Mele Eliye Baqustani. However, within this domain, there has been a notable absence of examination concerning elegies penned by poets in remembrance of their children.

In this study, our aim was to gather works that have been published as books or preserved as manuscripts. Additionally, we drew upon studies that were prepared as master's theses to supplement our research.

During the preparation of this article, we identified 104 elegies written by 8 poets about children. Our research focused within these parameters, and the article was subsequently prepared based on our findings.

The collected elegies were divided into two sections as elegies written on boys and girls and the number of elegies written by each poet on his/her own child was indicated.


After categorizing the elegies into those written for sons and daughters, we analyzed the fathers' grief over the loss of their children, their emotional states, their hopes for their children, and the significance of their children to them. Throughout this process, we provided relevant examples from the elegy texts under each topic for analysis.

A total of 104 elegies on children were discovered in the Kurmanji dialect of Kurdish language. However, this doesn't imply that there are no additional elegies written in this category. Undoubtedly, there are many other elegies yet to be uncovered, lying dormant somewhere, awaiting someone to bring them to light.

As a result of the study, it was discovered that the poet who wrote the most elegies in Kurmanji dialect in Classical Kurdish Literature was Mela Ehmedê Xelatî with 90 elegies.

### Çavkanî

- Babnîrî, M. E. (2012). *Dîwana Babnîrî*. İstanbul: Nûbihar.
- Baqûstanî, M. 'E. (2017). *Dîwana Baqûstanî*, Metn û Lêkolîn: M. Zahir Ertekîn. Bingöl: Zankoya Soran.
- Breton, D. L. (2019). *Acının Antropolojisi*, İsmail Yerguz (Çev.). İstanbul: Sel.
- Cegerxwîn. (2018). *Ronahî Li Pey Tarî Ye*. C.I. Ankara: Lîs.
- Çavuş, M. Z. (2008). *Türk Edebiyatında Mersiyeler*. Atatürk Üniversitesi Türkiyat Araştırmaları Dergisi Sayı: 38 Erzurum: s.131-138.
- Demir, Y. (2019). *Dîwana Namî (Fehmî Begê Pêçarî): "Meğmuru'd Dewawîn*. Teza Masterê. Mêrdîn: Mardin Artuklu Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü.
- Develloğlu, F. (2017). *Osmanlıca Türkçe Andisklopedik Lugat*. Ankara: Aydın Kitap Evi.
- Doskî, T. Î. (2020). *Baxê Îrem, Geşteki li Nav Şi'ra Kurmancîya Klasik*, (Amd. M. Zahir Ertekin) İstanbul: Dara.
- \_\_\_\_\_ . (2022). *Sê Klasikên Me Yên Nenas: Mela Hesên û Qasim û Mela Şems*. Kurdîname, r.161-174.
- Hakan, S. (2007: 45-47). *Ji Wida hetta Mele Muhammed Gulnarê Miksî û Pêwendîya Helbestvan û Mîrên Miksê*. Nûbihar: r. 45-47.
- Harman, Ö. F. (2002). *Akaid, İlmihal* (C:I, s. 68-140). İstanbul: Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları.
- İsen, M. (1994). *Acıyı Bal Eylemek Türk Edebiyatında Mersiye*. Ankara: Akçağ Yayınları.
- İzölî, D. (2013). *Ferheng(Kurdî-Tirkî, Tirkî-Kurdî)*. İstanbul: Deng.
- Kanar, M. (2011). *Osmanlı Türkçesi Sözlüğü*. İstanbul: Say.
- Mu'temen, Z. . (1954). *Şi'r û Edebê Fairisî*. Tehran: Kitêbxaneyê İbnî Sîna.
- Naci, M. (1990). *Lugat-ı Nacî*. İstanbul: Asr,
- <https://archive.org/details/lgatnaci0001na/page/n607/mode/2up>, Dîrok: 28.02.2024, Seat: 18.57.
- Nalbend, M. E. (?). *Baxê Kurda, Dîwana Mela Ehmedê Muxlis Kurê Emînê Nalbedê Bamernî*. Berhevkar: Tehsîn İbrahim Doskî. (Berhema Hêj Neçapkirî).
- Pala. (2014). *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*. İstanbul: Kapı.
- Qurana Kerîm û Meala Wê ya Kurdî*, Sûreya Beqere ayeta 185an. Werger: Fikrî Amedî, 2014 Ankara: Ensar.
- Redhouse, S. J.(1987). *Turkish And English Lexicon*. Pirtûkxaneyê Libnanê, Beyrûd, <https://turuz.com/book/title/A+Turkish+And+English+Lexicon-Shewing+In+English-The+Significations+Of+The+Turkish+Terms-James+William+Redhouse-1987-2246s>, (Dîroka Jêgirtinê:20.02.2024).
- Sami, Ş. (1978). *Kamûs-i Türk*. İstanbul, Türkiye: <https://www.pdfdrive2.com/kamus-i-t%C3%BCrki-d156729280.html> Jêgirtin: 16.01.2024 Seat: 15.09.
- Saydun, E. (2018). *Teşe û Ciwankariyên Wêjeyî Di Dîwana Feqiyê Teyran De*. Teza Masterê. Wan: Van Yüzüncü Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü.
- Serfîraz, M. (2012). *Mersiye û Di Edebiyata Kurdî de Mersiye*. Nûbihar: r. 30-33.
- Seyarî, E. (2019). *Mersiyyên Mela Zahîrê Tendûrekî ji Alîyê Tema, Ziman û Hunerên Edebî ve*. Nûbihar: r. 32-36.
- \_\_\_\_\_ (2019). *Mersiyyên Mela 'Elîyê Baqûstanî Ji Alîyê Tema, Ziman, Teşe û Hunerên Edebî ve*. Nûbihar: r.45-47.
- Toprak, M. F. (1990). *Endülüs Şiirinde Mersiye*. Doktora Tezi. Ankara: Ankara Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü
- Turan, C. (2023). *Mersiye Di Edebiyata Kurdîya Kurmancî ya Klasik de*. Teza Doktorayê. Bingöl: Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü.
- Xelatî, M. E. (?). *Dîwana Bîra Kul û Derda*. (Dîwana Çapkirî-Cih û Dîroka Çapê Nehatiye Diyarkirin).



## Perîşanname (Mela Perîşanê Dînewerî)

Shahab Vali - Erol Şaybak, Avesta 2023,

207 rûpel, ISBN: 9786258383492

Cumhur ÖLMEZ

<b>Cumhur ÖLMEZ</b>	Cumhur ÖLMEZ   <a href="https://orcid.org/0000-0003-2489-7855">https://orcid.org/0000-0003-2489-7855</a>   cumhurnemir@gmail.com Ph. D Candidate, Dicle University, Department of Kurdish Language and Culture, Diyarbakır, Türkiye
<b>Jêgir</b> Citation Atıf	Ölmez, C. (2024). Perîşanname (Mela Perîşanê Dînewerî), Shahab Vali - Erol Şaybak, Avesta 2023, 207 rûpel, ISBN: 9786258383492. <i>The Journal of Mesopotamian Studies</i> 16, 101-103
<b>Dîroka Şandinê</b> Submission Date Geliş tarihi	17.03.2024
<b>Dîroka Qebûlê</b> Acceptance Date Kabul Tarihi	26.03.2024
<b>Dîroka Weşandinê</b> Publication Date Yayın tarihi	30.03.2024
<b>Cureyê Gotarê</b> Article Type Makale Türü	<b>Danasînên Pirtûkna</b> Book Review Kitap Tanıtımı
<b>Hakemî</b> Peer-Review Hakemlik	<b>Cot Nenas – Du ji derve</b> Double anonymized - Two External Çift Taraflı Kör Hakemlik – İki hakem
<b>Beyana Etîk</b> Ethical Statement Etik Beyanı	<b>Hafîye beyankirin ku di pêkanîn û nivîsîna vê xebatê de hemû rêzîkên zanistî û etîk hatine şopandin û hemû çavkanî bi awayekî têkûz hatine referanskirin</b> <i>It is declared that scientific and ethical principles have been followed while carrying out and writing this study and that all the sources used have been properly cited.</i> Bu çalışma yapılırken ve yazılırken bilimsel ve etik ilkelere uyulduğu ve kullanılan tüm kaynaklara uygun şekilde atıfta bulunduğu beyan edilir.
<b>Kontrola İntihalê</b> Plagiarism Checks Benzerlik Kontrolü	<b>Belê – iThenticate</b> <i>Yes – iThenticate</i> Evet – iThenticate
<b>Nakokiyên Berjewendiyên</b> Conflicts of Interest Çıkar Çatışması	<b>Di gotarê de di navbera nivîskar û ti aliyên din nakokîya berjewendiyê tune ye.</b> <i>There is no conflict of interest between the author and any parties in the article.</i> Yazar ile makalede yer alan taraflar arasında herhangi bir çıkar çatışması bulunmamaktadır.
<b>Alîkarîya Darayî</b> Grant Support Maddî Destek	<b>Nivîskar beyan dîke ku wan wî ji bo vê vekolînê ti fonên derveyî wernegirtine.</b> <i>The author(s) acknowledge that they received no external funding in support of this research.</i> Yazar(lar), bu araştırmayı desteklemek için herhangi bir dış fon almadıklarını kabul etmektedirler.
<b>Mafê Telifê &amp; Destûr</b> Copyright & License Telif Hakkı & Lisanslama	<b>Nivîskar li jer lîsansa CC BY-NC 4.0 mafê xwe yê li ser xebata xwe diparêzin.</b> <i>Authors publishing in the journal retain the copyright to their work licensed under the CC BY-NC 4.0.</i> Dergide yayın yapan yazarlar, CC BY-NC 4.0 kapsamında lisanslanan çalışmalarının telif haklarını saklı tutarlar.

Kurd bi tarîxeke qedîm û bi sehayeke berfireh a xakî wekî miletekî jiyane, cih û warên wan bi egerên cuda bûne meydana hikumraniya dewlet û milletên cuda. Vê meydana berfireh a wekî derwazeyekê, car caran bi şer û talanan, car caran jî bi silahet û peymanan mazûvaniya gelek çand, bawerî, dîn, ziman û zaraveyên cuda kiriye û hêj jî dike.

Bi her zaraveyeke kurdî kuliyateke berfireh bi demê re derketiye meydana û metnên derbarê dîsiplîn û mijarên cuda de ji terefê nivîskarên ve di serdem û cihên cuda de hatine nivîsîn. Lê tespît û tesnîfa van metnan ji ber gelek sedemên mezin û biarîşe bi derengî ketine û kurdan bi xwe di heyamekî gelekî dereng de dest bi vekolandinê van metnan kirine. Hinek ji van metnan bûne temsîla dîn, ayîn an jî cîhana edebî-fîkrî, hinek ji wan jî di konteksta destpêka metnên ewil ên kurdî de hatine nîqaşkirin û cih û girîngiya wan zêdetir hêjayî vekolînan bûne. Yek ji van metnan jî *Perîşannameya Mela Perîşanê Dînewerî* ye ku bi kurdîya goranî, di sedsala 14an de hatiye nivîsîn û menzûmeya de dînî ya di qalibê mesnewiyê de ye (ev pênaseya nivîskarên berhemê ye ku bi egerên berfireh rave kirine). Di vê nivîsa xwe de em ê li ser xebata Shahab Valî û Erol Şaybak a bi navê *Perîşanname, Mela Perîşanê Dînewerî* bisekinin ku sala 2023an ji terefê Weşanxaneya Avestayê ve hat çapkirin.

Ligel ku di gelek xebat û lêkolînan de navê berhem û nivîskarê wê Mela Perîşan derbas dibe jî, bi sihetî xebateke berfireh û analîtîk nehatiye kirin. Ev xebata navborî beriya her tiştî jî bo her cure pirsên li derdora berhemê, naverok û nivîskarê wê bersivên xwe hene û ji gelek layenan mijarê ronî û zelal dike. Xebata ku wekî kitêb ji terefê her du nivîskarên, Shahab Valî û Erol Şaybak ve hatî amadekirin, berê wekî teza masterê ya Erol Şaybak, sala 2021ê li Zanîngeha Mardîn Artukluyê, bi serpereştiya Shahab Valî hat pêşkêşkirin. Paşê bi berfirehkirin û lêzêdekirinan wekî kitêbeke hevpar a her du nivîskarên hat amadekirin. Kitêb ji sê beşan, encam û ferhengeke goranî-kurmancî pêk tê ku ji bo xebatkarên qada goranî bikêrhatî ye.

Di beşa yekem a bi navê “Paşxaneya Dîrokî” de, serdem û jiyana Mela Perîşanê Dînewerî, têkiliya wî ya ligel Şêx Recebê Bursî, îdiaya hûrûfîbûna wî û ‘ilmê hûrûfîtiyê (‘ilmê sirra herfan), şopên şî’îtiyê yên di Perîşannameyê de, Mezheba Cafer, bi berfirehî têne vekolandin. Dîsa sernavên wekî “Şahê Welayetê ‘Elî, Çardeh Me’sûm û Hz. Mehdî”, “Xedîr-i Xumm (cih û bûyera ku ji terefê pêxemberê îslamê ve welayeta ‘Elî têtê tesdîqkirin), Seqîfe-i Benî Sa’îde” (cihê ku xelîfetiya Ebû Bekir hatiye qebûlkirin û welayeta ‘Elî hatiye berterefkirin) û Wesîyeta Pêxember”, “Meseleya Baxçeyê Fedek” (meseleya destnanîna bexçeyekî xurmeyan ji terefê xelîfeyan ve ku ew bexçe ji terefê pêxemberî ve ji Fatimayê re wekî mîras hatibû hiştin) di çarçoveya analîza berhemê de cih digirin. Di vê beşê de taybet çeperên fîkrî, mezhebî yên berhemê hatine vekolandin û wekî encam ji aîdbûna wî ya hûrûfîtiyê zêdetir Mela Perîşan wekî bikarhênerê kêşê şareza yê vî ‘ilmî têtê destnîşankirin ku ji bo fikrên xwe yên şî’îtiyê û ji bo ravekirina hinek hêmanên dînî wî ev ‘ilm bi bandora Şêx Recebê Bursî bi kar aniyê. Dîsa ew wekî ‘alimekî şî’a yê danzdeh îmamî hatiye pênasekirin û sedemên vê angaşê jî bi delîlan hatiye piştraskirin.

Di beşa duyem ya bi navê “Li Ser Perîşannameyê” de, nusxeyên berdest yên Perîşannameyê, taybetiyên zimanî-lehceyî, kêş û serwa, teşe û cureya metnê hatine behskirin. Herwiha, girêdayî analîza naverokî û tesnîfa berhemê, muqeddime, heft babên/beşên berhemê û xatime hatine destnîşankirin. Nivîskarên berhemê sêsebebên terciha xwe ya nusxeya Martin Hartman wisa destnîşan dikin ku ev nusxe, ji aliyê naverokê ve bi awayekî baş, beş bi beş hatiye tesnîfkirin û nisbet bi nusxeyên din kamiltirîn nusxe ye. Li gorî beyanatên Valî û Şaybak, ligel ku di metnê de termên ayînî, mezmûn, qalibên zimanî, ayet û telmîhên Qur’anê yên bi ferhenga ‘erebî yan peyvên bi farisî zêdebin jî berhem jî serî heta binî taybetiyên gramatik û zimanî yên zimanê kurdî di nava xwe de dihewîne û lehceya berhemê goranî ye. Li gorî nivîskarên kêşê berhemê pênc û pênc, deh kîte ye û bi terza helbesta goranî hatiye nivîsîn û wekî cure jî ev berhem menzûmeya de dînî ya di qalibê mesnewiyê de ye. Ligel muqeddime û xatimeyê heft babên/beşên berhemê bi îzahetên berfireh hatine ravekirin ku ev

in; “Muqeddime: Pendnameyek Li Ser Afirandina Gerdûnê û Meqamê İnsan”, “Bab-i Evvel: Meqtel-i Huseyn û Zêmarek ji bo Kerbelayê”, “Bab-i Dovvom: Saqîname”, “Bab-i Sevvom: Şerî’et, Terîqet, Heqîqet û Me’rîfet”, “Bab-i Çeharom: Nav û Sifetên Xwedê Te’ala”, “Bab-i Pencom: Itirafnameyek ji bo Gunehên Giran”, “Bab-i Şeşom: Şefa’etxwazî ji Xwedê, Pêxember û Şahê Welayetê”, “Bab-i Heftom: Rexneyeka Tund li Ebû Bekîr Siddîq û ‘Umer bin Xettab” û “Xatime”.

Di beşa sêyem ya “Transkrîpsiyona Berhemê” de nivîskar derbarê rê û rêbazên transkrîpsiyona nusxeya berbehs de hin agahiyan didin û paşê jî ligel qismên di ser û binê berhemê yên bi farisî, temamiya metnê bi tîpên kurdî-latînî pêşkêş dikin ku 1017 beyt in. Herwekî di berhemê de hatî îzehkirin, di warê tîpguhêziya metnê de muhtemel e ku hin kêmasî hebin, lê ji ber xisûsiyetên zimanê metnê ku ‘erebî, farisî û kurdî, li hin cihan jî tirkî, bi awayekî tevlihev têne bikaranîn, û ev tîpguhêziyeke kamilen tendurist bi zehmet dixe. Nivîskaran hima bêje di her rûpelî de bi jêrenotan her peyveka nenas, mezmûn û telmîh, ayet û hedîs, kes û meselên di nava beytan de ji bo xwîneran rave kirine. Têgihîştina metnekî wiha klasîk û bi zimanekî giran yê ayînî bêyî van îzahetan dê bi zehmet bûya û hem bi jêrenotan hem jî bi ferhengoka di dawiya berhemê de ji bo berterefkirina vê zehmetiyê hewleke di cih de ya nivîskaran heye.

Wekî encam; ligel hemû zehmetiyên xebata li ser berhemeke bi vî rengî klasîk, xwedî zimanekî giran ê ayînî, têrterkîb û mezmûn û bi goranî –ku ji bo lêkolîn û lêkolerên bakur sehayeke gelekî nû ye– û di cîhana edebiyata kurdî de navê wê ji layê gelek lêkoleran ve bi “yekembûnê” tê bilêvkirin, nivîskarên vê berhemê gelek çeperên nezelal ên Perîşannameyê, naverok û zimanê wê û muelifê wê Mela Perîşanê Dînewerî vekolandine, zelal kirine û ji bo xebatên berfirehtir li ser vê sehayê derwazeyekî muhim vekirine.